




Kovara Sênehane

Hejmar: 16

Bihar 2014

Xwedî û Berpirsiyarê Nivîsaran

Ercan YILDIRIM

Edîtor

M. Zahir ERTEKÎN

Lijneya Weşanê

Seyfeddin AYKAÇ

Zafer AÇAR

Ebdulhadi TİMURTAŞ

Ebdulcebbar KAVAK

Tîprêzî û Berg

Seyfeddin AYKAÇ

Web & e- mail

www.nupelda.net

kovaranupelda@gmail.com

Tîf/Fax

Tel: 0432 215 80 60

Navnîşan

Hastane Cad. Donat İş Merkezi

Giriş Kat No:6 Beşyol VAN

Çapxane

Vameda Ofset San.Tic. Ltd. Şti.

Tel: 0432 215 80 60 VAN

www.vameda.com.tr

Biha : 5 TL

Nimroya Hesabê Banqê

Seyfettîn AYKAÇ

IBANTR45 0001 2009 3390 0001 0192 06

- Nivîsên tîn şandin nayên vegerandin.
- Her nivîskar berpirsiyarê nivîsa xwe ye.
- Lijneya weşanê, di nivîsan de dikare serrastkirin û guherînê çêbike.

NAVEROK

Gilî Dikim (Aqîl MIHACIR)-----	3
Were Ey...(Ahmet Said PAKYÜREK)-----	5
Bêjeya “Ten”ê (Ahmet DEMİR)-----	6
Desmala Bavê Min (Zafer BERDESTÎ)-----	9
Ez ê Li Benda Te Bim (Seyfeddin AYKAÇ)-----	10
Di Dîwana Hezîn de Hêmanên Edb. Kurdî ya K. (Yakup AYKAÇ)-----	11
Şîrmêjî û Xwînêjî (Ömer DELİKAYA)-----	16
Di Şekilgirtina Sûdanê De Rola Kurdan... (Ahmet DEMİR)-----	17
Însan (Meryem ERAY)-----	23
Ez ê Bi Tena Serê Xwe Bimirim û... (Seyfettîn AYKAÇ)-----	24
Seyda (İbrahim MİRZA)-----	29
Pîvanên Jiyanê (Umer UMÎD)-----	30
Can Tefiya Êdî Nema (Melik TAHA)-----	33
Pira Xudaferînê (Ahmet DEMİR)-----	34
Astengên Li Ber Zûpêşketina Nivîsandina Kurdî (E. Samed)-----	39
Lorya Welat (Aqîl MIHACIR)-----	43
Du Çîrokên Bizirî (Sîdîq GORÎCAN)-----	44
Temrînên Şevê (M. Zahir ERTEKÎN)-----	45
Nirxandina Qismê Kurmancî ya Kitêba Dersa... (Zafer AÇAR)-----	48
‘Îşqa Şêx ‘Eleddîn (M. Emin HEYDERÎ)-----	52
Sedemên Paşdemayîna Me (Bediuzzeman /Wergêr: Abdurrahim YILDIZ)-----	53
Helbestên Ku Helbestvanên Wan Ne Diyar in -I (Emîn AGAHDAR)-----	55
Newrozname (Remezan BINETARÎ)-----	56
Berawirdkirina “Ey av û av”... (M. Emîn DEMİR)-----	58
Hecîkê Çûkan (Ramazan YAMAN)-----	62
Têkiliyên Nabeyna Zimanê Dayikê û Hizrê (Î. SEVEN MARÛNISÎ)-----	66
Meseleya Hz. Musa û Xidir (a.s) (Mücahit YILDIRIM)-----	68
Biratî (Nureddin Ertekin)-----	69
Derdê Tûtiyê (Mewlana Celaleddin Rûmî)-----	71
Ronahî (Fahri AYHAN)-----	72

Ji Edîtor

Xwendevanên Hêja!

Bi hêjmara 16'an dîsa em bi we re ne. Di vê hêjmarê de jî gelek mijarên nû û guldesteyek nivîsên xweş li ber destê we amade ye. Di serî de ez bêjim ku mixabin me nekarî ku cî bidin hemû nivîsên ku ji kovarê re hatibûn şandin. Em spasiyên xwe ji hemû nivîskarên ku 'eleqe nîşan dane û ji kovarê re nivîsên xwe şandine re pêşkêş dikin. Ji ber ku rûpelên kovarê bisînor in, hinek nivîs ji bo hêjmarên din ketin arşîva kovarê. Ez dixwazim li ser hinek nivîsên kovarê bisekinim.

Li gorî çavkaniyan, bêjeya "Ten"ê ji layê birêz Ahmet Demir ve hatiye lêkolandin. Nivîskar li ser etîmolojiya vê bêjeyê û di zimanên biyanî û zaravayên kurdî de formgirtina wê radiweste. Ez bawer im ku nivîsên wiha bingeheke qehîm çêdikin ji bo xebatkarên dahatû yên zimanê kurdî.

Di nivîsa "Di Dîwana Hezîn de Hêmanên Edebiyata Kurdî ya Klasîk" de Yakup Aykaç hewl daye ku Dîwana Hezîn di çarçoveya edebiyata klasîk de binîrxîne û nîşan bide ku ev dîwan ji aliyê form, şêwe, ziman û mijarên xwe ve tu kêmasî ji yên beriya xwe nîn e.

Li gor zanîna gelêrî Kurdîstan çar perçe ye. Kurdîstana Başûr, Bakur, Rojhilat û Rojava. Îja di xebata Ahmet Demir a "Di Şekilgirtina Sûdanê De Rola Kurdan û Kurdîstana Sûdanê" de em hîni Kurdîstaneke din jî dibin ku ev Kurdîstan a Sûdanê ye. Ji mêjê ve heta demê me rola kurdan di şiklîgirtina Sûdanê, di vê nivîsê de hatiye destnîşankirin û îhtîmal heye ku cara 'ewil weke gotareke 'ilmî ev mijar derdikeve qada nivîsîna kurmancî.

Seyfeddin Aykaç li pey şopa sehabîyan lêkolînên xwe didomîne. Di vê beşa rêzejênenîgariyê de cenabê Ebûzer kiriye mêvanê pênuşa xwe. Herwiha nîsbet bi hedîseke cenabê pêxember 'eleyhiselam di derbarê Hz. Ebûzer de kiriye sernivîs û dibêje "Ez ê Bi Tena Serê Xwe Bimirim û Bi Tena Serê Xwe Heşir bibim."

"Meram, divê bi zimanekî zelal û nerm û şîrîn û destyar û eşkere were vegotin. Bêjeyên ku tu yê di hevokê de bi kar bînî, bila rasterast bi merama dilê te re pêwendîdar bin, bila rasterast bibin wergêrên wan daxwazan. Gelek caran, bêjeyên zêde û bi mijarê re ne têkildar, muxataban aciz dikin û ji mijara girîng dûr dixin." Ev beşek ji pîvanên jiyanê ye. Mamoste Umîd rêzenivîsa xwe ya "Ji Pîvanên Jiyanê" berdewam dike. Cûr bi cûr mijar bûne mêvanê vê nivîsê jî.

Li ser mîmariya kurdan nivîseke balkeş jî di vê hêjmarê de cîyê xwe girtiye. Ahmet Demir bêtî ku bikeve nava niqaşên ku 'gelo mîmariya kurdan heye an na?"

bi pireke 15 çavî avahiyeke kurdan a li ser piyan, li ber çavan radixe û balê dikşîne ser avahiyên kurdan. "Pira Xudaferînê" ji girîngtirîn nivîsên vê hejmarê ye.

"... Digel van xebatên hêja ez giringiyê didim bikaranîna zimanî ya di jiyana rojane de. Mîheng ev e; gelo sal û sal nisbeta axaftina kurdî kêma dibe an zêde dibe? Nemaze di nêv zarokan de axaftina nisbeta vî zimanê nestêle çî ye? Kurdîaxêvên nû çêdibin yan na? Angaşt min ew e ku heta yekser zimanê perwerdeyê nebe kurdî zimanê jiyanê nabe kurdî. Vêca, ew zimanê di jiyanê de neyê bikaranîn û axaftin dê nêzikî mirinê bibe." A. Semed nivîsa xwe ya "Astengên Li Ber Zûpêşketina Nivîsandina Kurdî" de vê tespîta jiyanî dike û balê dikşîne ser axaftina kurdî.

Di hejmareke berê de Aqîl Mihacir helbesteke wenda ya Evdirrehîmê Hekkarî weşandibû. Di vê hêjmarê de helbesteke din a heman şairî ya wenda li ber destê we ye.

Zafer Açar di nivîsa xwe ya "Nîrxandina Qismê Kurmancî ya Kitêba Dersa Kurdî ya Hilbijartî ya Pola 5."an de rexneyên xwe yên erênî û yên neyînî pêşkêş dike. Ji bo çapên nû yên vê kitêbê hêvîdar im ku ev rexne bi baldarî werin nîrxandin.

Mamoste M. Emîn Demîr li ser edebiyata berawerdkirî radiweste û "Ey av û av" a Feqiyê Teyran û "Su Qesîdesî" ya Fuzûlî datîne ber hev. Weke ku baş tê zanîn ev herdu helbest girîngtirîn helbestên zimanê xwe ne. Ev cara duyem e ku edebiyata berawerdkirî dibe mijarên sereke yên Nûpeldayê.

"Ey Bexşendeyê dilovînê mîhrîban! Heke ev lorîn û herikîn, carna bi bêjeyan, car car bi dilînan, car carî bi fikirînan, car bi car bi kirînan, xwe wenda bike û wekî ava Dijleyê pêl bide jî, ji bo xatirê nêta pak û paqîj ya li ser vê secadê, bibexşîne û wekî ku qitmîrek e biborîne." Di nivîsa "Gilî Dikim!" de Aqîl Mihacir rêwitiyeke hundirîn derdixe der. Têkoşîneke derûnî li qada nivîsê dike mêvan. Berê xwe daye xwe û berê xwendevanan daye nivîsê. Îzzettîn Seven Marûnîsî têkiliyên nabeyna zimanê dayikê û hizrê lêkolayê û encamên girîng bi me re parve dike.

Xwendevanên Hêja!

Ji bilî van nivîsên balkêş gelek helbest, çîrok û xebatên din jî di nava rûpelên kovarê de cih girtine. Me tenê behsa hinekan ji wan kir. Heta hejmareke din bimînin di xêr û xweşiyê de.

M. Zahir Ertekin

Wefat-Sersaxî: Diya hevalê hêja, nivîskarê Nûpeldayê A. Semed Alkış wefat kiriye. Xwedê rehma xwe lêke. Em êşa mamoste A. Semed parve dikin û ji malbata wan re sersaxî, sebir û metanetê dixwazin.

Gilî Dikim!

Aqîl MIHACIR

Bêjeya “gilî”yê, di ferhengan de di wateyên wekî “gazin-d-c kirin”ê de, “şikar kirin”ê de, “rex-ne kirin”ê de, “dawa kirin”ê de, an jî “diyarkirina nerazîbûna xwe”yê de derbas dibe. Gilî, di zimanê mirovan de zêdetir di vê wateya dawiyê de û bi wê armancê tê kirin.

Li hember marûzmayîna zext û zorên zalimekî, gilîkirina bi mezinê wî, cûrekî gilîkirinê ye û pirr caran encameke erênî dide. Li hember duçarbûna neheqiyên karmendekî dewletê, gilîkirina bi amîrê wî, babetekî gilîkirinê ye din e û gelek caran dawîya gazincan tîne û hwd.

Ciyê gilîkirina dizan eşkere ye û bi gilîkirinê tu dikanî rê li ber wan bigrî. Ciyê gilîkirina zordar û zordestan dadgeh e û li ber çavan e; heke kêmasiyeka bedena te tune, tu kanî bişixulî; na heke ku tu yî xwedî uzr î, bi gilîkirinê tu kanî pêşiyê li wan stemkaran bigrî. Li pêşberî tengasiya debarê jî, tu kanî tevdiran bigrî, herî saziyên alîkirinê û yardimê lê bixwazî û pêdiviyên xwe bidest bixî.

Mîna ku her kes dike, ez jî li duçarbûna neheqîyan heman riyê dişopî û li berpirsan gilî dikim; lê ez ê îro, serî li evdan nedim; îro bes li pêşberî Te destê xwe vekim ey Xwediyê min; *ez dê giliyê xwe hew bi Te bikim ey Xwediyê min!*

Hin pirsgrêkên min hene ku ey Xwediyê mîhrê, ancax Tu kanî çareser bikî. Hin kul û birînên min hene... hin êş û nalînên min hene ku bes Tu karî derman bikî ey Şafî! Hin daxwazên min hene ku bes Tu dikarî bi cîh binî ey Sexî, Hin emelên min hene digihêjin sermediyetê, hew Tu kanî min têr bikî ey Vafî! Hew li Te dixwazim daxwazên xwe! Bes li Te gilî dikim ey Zîmamdarê me, vê nefsa xeddar û van pelîdan!

Ey Destgirê ku di lawaziyê de hêzê dide!

Çaxa ku ez dixwazim tişteki bi xêr bikim, ev nefsa alî min nake; bi fêr û fûtan dinyayê li pêş min xweş dike! Çaxa ku ez dixwazim xwe nêzî te bikim, vegerim ba Te; lê di rîya vegerîna min de wesîleyên

ku dinyayê baş nîşan didin derdixine pêş min, wê daxwaza nêzbûna Te, li dilê min sar û li ber çavên min reş dike! Ez ditirsim ji vê nefsê, ez bi tirs im...

Ey Rêrastkirê me rêwendayan!

Ez dixwazim pîşeyekê hîlbijêrim, yeka ku min zexm bi rîya te ve girêbide; hemû mercên xwe li gor vê armancê eyar dikim ez; lê nefsa min derdikeve pêş min. Li pêşberî çavên min xerab dike, lawaz dike, bê biha dike wê pîşeya ku dê min bigihîne te, bigihîne qayîlbûna te, bigihîne razîbûna te. Di her karî de dudiliyan dike dilê min ev nefsa; min dixê şek û şubheyan; min dike nava metirsî û qisawetan, li ser xaye û meqsedan, li ser hedef û armancan. Welhasil rê li ber min xiradike, ev nefsa!

Ey di dema tenêtiya min da Hevalê li tenîst min!

Ez dibêjim razîbûna Xwedê, ew dibêje hezkirîna nefsê... Ez dibêjin xewf û recaya ji Bexşende, ew dibêje ya sedeman... Ez dibêjim comerdî, ew dibêje timehî... Ez dibêjim xizmet, ew dibêje menfeet... Ez dibêjim omet, ew dibêje milliyet... Ez dibêjim em, ew dibêje ez... Ez dibêjim zîrekî, ew dibêje zexelî... Ez dibêjim xweşikiya hundirîn, ew dibêje ya rûbarî û derveyîn...

Ey di dema dûrîtiyê da Yê nêzî min!

Ez bêzar im! Dibêjim bes ji bo Xwedê tevbigirim, alî min nake nefsa! Ew dibêje tevgerîna ji bo kêfê... Ez bê taqet im! Dibêjim bila xawênfiroşî dûrî min be, destê xwe nade min ew! Dibêje bila xawênfiroşî bime re be... Ez betilîm! Dibêjim bila hêza me xwe pispêre rastî û jidiliyê, dil nake ew! Dibêje spartina mefa û berjewediye... Ez westiyam! Dibêjim tevgerîna digel xwedî xawênan, gurra min nake ew, dibêje tevgerîna digel hewa û hewesan...

Ey Rênîşanderê rêşaşan!

Ez dixwazim berê xwe bidim axretê, ew min vedigerîne dinyayê! Ez dixwazim berê xwe bidim westîna di rîya Te de, ew berê min dizivîrîne berjewendê! Ez dixwazim berê hemû kar û kirinên

xwe bidim rizaya Te, ew dixwaze mefaya şexsî qenctir nîşan bide! Ez dixwazim berê hemû helwestên xwe berva Te bikim, ew dixwaze berê hemû helwestên min berva ezîtiyê bike! Ez dixwazim berê xwe bidim kesên bes Tu jê razî, ew dixwaze berê min bide hewalên hew ahremend jê razî! Ez dixwazin tevî civînên ku li ser navên tê radiwestin, ew dixwaze ji bîra min bibe, ew dixwaze min tevî yên nefsi û cihanî bike! Ez dibêjim Tu, ew dibêje ez! Ez dibêjim peyama Rohnayiya Çavan (s), ew dibêje xweşikî min!

Ey di dema çewtkirinê de Rastkerê min!

Ez dixwazim çewtî û xeletiyên xwe li hember Te bînim zimên û tobe bikim, nefsi nahêle, min dixapîne, dibêje “Tu durist î!”... Ez dixwazim, di riya Te da ji hemû paye û şerefên ku min dixewînin, min dipelîxînin dûr bikevim, min nahêle ev nefsi, min dixelîtîne, dibêje “Tû liyaq î!”...

Ey Xelaskarê ji nefsa fênek û ji feleka bêwefî!

Ji vir û wa, ez ê destê xwe li pêşberî dergaha Te ya pîroz -ku ti daxwaz vala an jî bê bersiv venagerin- vekim û bi zimanekî pak û paqij, bi hemû hest û dilînan xwe yên ji dil, mîna herikîna ava kaniyeke avşên, digel pesn û spasên bona Te, poşmanî û nedametên xwe bê navber biherikînim.

Ey Bexşendeyê dilovîne mîhrîban!

Heke ev lorîn û herikîn, carna bi bêjeyan, car car bi dilînan, car carî bi fikirînan, car bi car bi kirinan, xwe wenda bike û wekî ava Dîjleyê pêl bide jî, ji bo xatirê nêta pak û paqij ya li ser vê secadê, bibexşîne û wekî ku qitmîrek e biborîne.

Bi destê me bigire ey Ferwerdar!

Hin hêviyên pak hene di dilan de; hin armancên paqij hene -ku ji bihayê vê cihanê gelek bi bihatir in -... Hin hedefên bêmînak hene ku her temen di riya wan da werin serfikirin seza ne! Hin kes hene ku

gotin û kirinên wan ji nûrê nin, hin kesayet hene ku bi helwaset û çalakiyên xwe ve tevhev biriqî nin; digel hemû endamên xwe ve, beden giş li ber lingên pêkhatina armancên wan ên pîroz bibin kevirên peyarê, an jî bibin şopgerên wan ên dîwane, bawer bikin ku rewşa ye!

Salnî hene ku ev gel bê xwedî ye; salnî hene ku qad û atmosferên ku endamên vî gelî li ser in û jê nefesê digrin û berdidin, jehrîkirî ne. Hemû rê û rêbazên ku di xuyanîyê de ji bo mefa wan, lê di rastiyê de bes ji bo bendebûna vîna wan in. Bihost bi bihost, gav bi gav li ser her parçeyên qada jiyanê, kemîn nixumandinî ne. Ev gel, li pêş çavên me, di riya mefa mêtinkaran da yek bi yek, nifş bi nifş tîn zeftkirin, tîn helandin, tîn pişaftin û li hember hevrêyên wan tîn emilandin...

Di serî de gelê me û mirovên me, hemû gelên bindest û bêxwedî, li hêviya xelas kirinê ne, rizgar



kirin û azad kirinê ne... Bihêle em koma mexdûr û mezlûman giş, di vê riyê de bibin lava, bibin dia û di vê riya Te de biherikin ey Xelaskar!

Heke Tu destûrê bidî em dê temenê xwe di vê riyê de xerc bikin; ku îzna Te hebe em dê azmûna xwe di vê xizmetê de derbas bikin; ger Tu musadê bidî ey Ferwerdar, em dê hemû hebûnên xwe di çêkirina riya xilaskirina xwe û van gelan da biserifînin!

Were Ey...

Ahmet Said PAKYÜREK

Salnî hene ku, bi her hêlê ve em kût û bê hal in,
Bê taqet û bê ziman in; em nexweş û bê derman in!...

Were ey dermanê derdan!
Were ey hevalê rast û durist!
Were ey rohnahiya neyarê tarîtiyan!
Were ey vejînkari!
Were ey candêrê me!

Were ey dermanê derdan!
Were bibe quweta nexweşan, îlaca kul û nesaxan!
Were bibe rohnayiya çavan, nefesa bê hilm û bê nefesan!
Were bibe melhema birînan, dewayê seretanan!
Were bibe candêrê dilan, hêviya aqilan!...
Were ey dermanê derdan!

Were ey hevalê rast û durist!...
Were bibe rêzanê me rêwendayan!...
Were bibe xwediyê me bê kes û bê xwediyên!...
Were bibe heyfگیرê me stûxwar û stemxuran!...
Were bibe heyvanê giyanê xwezaniyê!...
Were ey hevalê rast û durist!...

Were ey rohnahiya neyarê tarîtiyan!...
Were ey xwediyê tovên xawên û serbilindiyê!...
Were ey serkeftî, were ey xwedî dil, were ey xwerû!...
Were ey xwedî xawên, were ey helwest fadil!...
Were ey çîlekêş, were ey zehmetkêş!...
Were ey rohnahiya neyarê tarîtiyan!...

Were ey vejînkari!
Were û bibe hêl ku tu li pî u lepên me belav bibî!...
Bibe cebirkari ku tu hemû şikestiyên me bi hev ve bicebirînî!...
Bibe huner ku tu xwe li movik û tiliyên me wergerînî!...
Bibe jêhatin ku tu xwe li zendên me bipêçînî!...
Were ey vejînkari!

Were ey candêrê me!
Bibe can têkeve canê me; bibe derman têkeve birînên me!...
Bibe bêje têkeve zimanê me; bibe xwîn têkeve dil û tamarên me!...
Bibe giyan têkeve laşên me; bibe rohnî têkeve asîmanê me!...
Bibe hêl û têkeve lingên me; bibe jîrî têkeve mêjiyên me!...
Were ey candêrê me!

Bêjeya “Ten”ê

Ahmet DEMİR

Bêjeya “ten”ê, di Kurdî de bi wateya laşê mirovan tê emilandin; di roja îro da ev bêje, zêdetir rûyê bedenê û bedena mirovan îfade dike. Li hin deveran jî xwediyê nêzî wateya çerm e ev bêje.

Bêjeya “ten”ê, di Avestayê de bi şiklê *tanû*, di Sanskritî de jî bi forma *tanu* derbaz dibû. Ev bêje di Farisî û Farisiya Navîn de dihat wateya laşê / bedena mirovan.

Di zimanê Îngilîzî de bêjeya “tîn”ê tê wateya “kutiya teneke”yê de. Di wateya “Beşên lîfên goşt yên ku bi hestiyên va tên girêdan” de, di wî zimanî de bêjeya “tendon”ê tê bikaranîn. Balkêş e ku forma vê bêjeyê di Yewnaniya Kevn de “tênôn”, di Latîniya Navîn de jî “tendo, tendonem” dihat bikaranîn. Di Almanî de bêjeya “dicht”ê, di wateya “teng”ê de ye.

Bêjeya “tenik”ê ku tê wateya pehnûna lawaz û ne qalindbûnê, di zimanê Farisî de di forma *tang* / *tanukê* de, di zimanên Hindî û Sanskrîtî de jî di şiklê *tanukê* de derbaz dibe. *Teneîn* (bi Yewnani?): Fireh kirin. Velezandin.

Bêjeya “teng”ê, ku li gor vê vekolînê jî “ten”ê hatiye çêkirin, jî malbata zimên ji ya Proto-Hîndûewropî ye û li wir bi forma “tenk” dihat bikaranîn. Heman bêje di Proto-Aryayî de bi forma “tenç”ê; di Latînî de bi forma “tîght”ê; di Sanskrîtî de jî, bi forma “tenektî”yê bû (“tenc-”, di wateya tengkirinê de bû). di Persî de bi forma “tenîşin” cî digirt. Di Farisî de di wateya “teng”ê de forma “teng”, di wateya “teng kirin”ê de “tencîden” heye. (Hişyarî: Di nav zaravên Kurdî û Erebi de, veguherîna “g” û “c”yê bînin bîra xwe.)

Bêjeya “teng”ê di hemû zaravên Kurdî de cî digrin: Belûcî dibêjin “tenk”; Kurmanc, Soran, Hewreman û Dimil jî dibêjin “teng”.

Ev bêje, di bikaranîna xwe de navdêr e û li gorî zayendê jî nêr e.

Alaten: Yê bi cuzam. Ev bêje di Turkî de tê bikaranîn. Ev di wateya “tenê bi rengên ji hev cihê”; “tenê ku xalên sipî li ser hene” de ye. Bêjeya “alaten”ê, jî bêjeya “ala” û ji ya “ten”ê hatiye çêkirin.

Avteng: Ciyê ku di herikînê de av teng dibe (Bnr.: Tengav). Bêje rengdêr e û mê ye. Bêjeya “avteng”ê, jî bêjeya “av”ê û ji ya “teng”ê hatiye çêkirin.

Berteng: Ne berfireh, teng. Rewşa pêşî teng bûyînê. Bêje, rengdêr e û mê ye. Bêjeya “berteng”ê, jî bêjeya “ber”ê û ji ya “teng”ê hatiye çêkirin.

Bîhteng: Her çiqas di ferhengan de di wateya “bêtebat û bêsebr”ê de hatiye şirove kirin jî, di nava gel de wateya wê ya sereke “yê/a ku zû hêrs dibe, hêrsok” e. Bêjeya “bîhteng”ê, jî bêjeya “bîhn”ê û ji ya “teng”ê hatiye çêkirin.

Etene(?): 1. Bêjeyeke bijîşkî ye, plazanta. Pizan/pizdan. Çermekî zirav yê ku zaro ji bandorên dervêyî diparêze. Hevalzaro. 2. Beşa êmîşan a ku xwe bi dendikê ve zeliqandiye, a ku tê xwarin. Nerme. Eten.

Mîntan/Nîvten: Ev bêje di Farisî de bi “nîmtene”yê tê bikaranîn. Di Kurmancî de jî bo binavkirina qutikê bê yaxe, tê emilandin. Bêjeya “mîntan / nîvten”ê, jî bêjeya “mîn/nîm/nîv”ê û ji bêjeya “tan/ten”ê hatiye çêkirin.

Nazikten: Yê/a ku tenê wî/wê nazik e. Ev bêje zêdetir di peywira rengdêriyê de tê bikaranîn. Bêjeya “nazikten”ê jî bêjeya “nazik”ê û ji bêjeya “ten”ê çêbûye.

Nermten: Yê/a ku termê/laşê wî/ê nerm e. Bêjeya “nermten”ê jî bêjeya “nerm”ê û ji bêjeya “ten”ê hatiye çêkirin.

Nûrten: Tena ji nûrê. Tena bi nûr. Ev bêje, piranî ji bo navê jinan tê bikaranîn. Bêjeya “nûrten”ê, ji bêjeya “nûr”ê û ji bêjeya “ten”ê hatiye çêkirin.

Ten: 1. Rûyê derve yê bedêna mirovan; çerm, cild. 2. Gewde, wucûd, beden. Bêje, bi serê xwe ye û ti qertaf nestandiye. Ev bêje, di hevokê de navdêr e û li gorî zayendê nêr e. (Mînak: Tenê min.)

Tenahî: Hew bi serê xwe bûyîn. Yek heb bûyîn. Tenêti. Bêjeya “tenahî”yê ji bejêya “ten”ê û ji qertafa nîsbet û şibihînê “-ahî”yê hatiye çêkirin. (Li aliyekî di, guman heye ku bêjeya “tenahî”yê, ji bêjeya “tene / tane / dane”yê jî hatibe.)

Tenbel: Yê/a cangiran; yê/a zexel. Bêje ji bêjeya “ten”ê (beden) û ji bêjeya “bel”ê (dîk, ya ku xwar nabe) çêbûye. Bêjeyek wek vêya çavbel e. Ev bêje, bi şiklê “Tembel” derbasî Turkî bûye.

Tenbelî: Yê/a ku bi tenbelan dimîne, dişibihe wan, ji wan e. Yên ku îzafeyî tenbelan dibin. Bêjeya “tenbelî”yê, ji bejeya “tenbel”ê û ji qertafa îzafeyê “-î”yê hatiye çêkirin.

Tenbû: Candarekî ku bi tenê heywanên wekî mîh û bizinan ve dizelliqe û xwîna wan dimije. Cûrekî heşeratan e. Bêjeya “tenbû”yê ji bêjeya “ten”ê û ji “-bû”yê hatiye çêkirin. (Wateya “bû”yê bi tevahî nehat tespîtîkirin)

Tende: 1. Çadir, çader, 2. Yê ji cawê qalind. 3. Cawê ku meriv davêje ser milên xwe. 4. Sîwan. Bêjeya “tende”yê ji bêjeya “ten”ê û ji qertafa şibihîn û pêmayînê “-de”yê hatiye çêkirin.

Tendurist: Yê/a ku di canê wî/ê da ti nerîhetî, ti uzr û ti kêmasî nîn in. Sax, saxlem. Bêje ji “ten”ê û ji “durist”ê pêkhatiye. Bêjeya duristê, di ferhengan de tê van wateyan: Rast, temam, kamil, saz, sax, baş, bêkêmasî û hwd.

Tenê: Hew bi serê xwe. Yek heb. Ti kes yan jî ti tişt ne pê ra; ti kes yan jî ti tişt ne ligel. Tek, tena, tenha, tenya, bitenê, yek, bêkes, bêxwedî. (Li aliyekî di, guman heye ku bêjeya “tenê”yê, ji bêjeya “tene / tane / dane”yê jî hatibe.)

Tenêti: Bi serê xwe bûyîn; pê ra ti kes an jî ti tişt nebûn. Tenatî, tektî, bitenêti, bêxwedîti. Bêjeya “tenêti”yê ji bêjeya “tenê” û ji qertafa “-ti”yê hatiye çêkirin. (Li aliyekî di, guman heye ku bêjeya “tenêti”yê, ji bêjeya “tene / tane / dane”yê jî hatibe.)

Teneke: Ji bêjeya tenikê veguheriye, qertafa pêmayîn / şibihînê “-e” standiye. Hesin yan jî lajwerdên ku tenik hatine birrîn. Bêjeya “teneke”yê, ji bêjeya “tenek / tenik”ê û ji qertafa pêmayîn / şibihînê “-e” hatiye çêkirin.

Teneşîr: Ciyê ku li ser mirovên mirî tîn şuştin. Maseya ku li ser laşê mirovên mirî tîn şuştin. Bêjeya “teneşîr”ê bi gumaneke mezin ji bêjeya “ten”ê û lêkera “şuştin”ê hatiye çêkirin. Watîniya tîpa “r”eyê nehat tespîtî kirin.

Teng: 1. Dera / devera nefireh an jî zirav; tiştê nefireh an jî zirav. 2. Benekî palikên heywanan. Bêjeya “teng”ê ji bêjeya “ten”ê û ji xurdepaşa şibihandin û pêmayînê “-ing”ê çêbûye; lê tîpên “i” û “n”eyê ji bêjeye ketine. 3. Tang, tal, hîza.

Tengasî: Wateya vê bêjeyê “rewşa zehmet yan nexweş” e. Ev bêje, bêjeyeke navdêr e û mê ye. Bêje ji bêjeya “teng” û ji başbedika “-asî”yê pêkhatiye.

Tengav: Wateya vê bêjeyê “Cihê teng yê avê; cihê ku av lê teng dibe; ciyê teng yê ku av tê re derbas dibe” ye. Ev bêje, bêjeyeke navdêr e û mê ye. Bêjeya “tengav”ê, ji bêjeya “teng”ê û ji ya “av”ê pêkhatiye.

Tengavî: 1. Yê/a bi tengavê re têkildar; Yê/a ku îzafeyî an jî nîsbetî tengavê dibe. Di vê wateyê de bêje, ji bêjeya “tengav”ê û ji qertafa nîsbetê “-î”yê hatiye çêkirin.

Tengayî/tengahî: Bêje, hevwatera bêjeya “tengasî”yê ye. “Tengayî”, hevwatera forma “tengi”yê ye. Wateya wê “rewşa zehmet yan jî ya nexweş” e. Bêjeya “tengayî”yê, ji bêjeya “teng”ê û ji qertafa îzafeyê “-(ay)î / -(ah)î”yê pêkhatiye.

Tengbûn: Çend wateyên sereke yên vê bêjeyê ev in: 1. Ne fireh bûn. Di vê wateyê de “cihê / tiştê ku pir kes/tişt, nikanin tê ra herin, ji biçûkbûna wê tê da dimînin. 2. Zirav bûn. Ne stûr bûn, ne qalind bûn, lawaz, zeîf, nazik bûn. 3. Aciz bûn, acizî. Ev bêje ji du bêjeyan pêkhatiye: Ji rengdêra “teng”ê û ji lêkera alîkar “bûyîn”ê.

Tengezar: Tengijîn. 1. Yê/a bê hêz û bê taqet. Aciz. 2. Xizanî. Forma avabûna bêjeyê wuha ye: “teng + e + zar”; yanê zimanê teng. Bêjeya “tengezar”ê, rengdêr e, li gorî kesê/a-tiştê/a ku li dewesê hatiye bikaranîn zayendê diguherîne. Ji vê bêjeyê, lêkerên “tengezar kirin” û “tengezar bûyîn” û navdêrên “tengezarkirin” û “tengezarbûyîn”, di zimên de tîn bikar anîn.

Tengezarî: 1. Bêhalî, bêmecalî, acizî. 2. Tengasî, Tengayî. Bêjeya “tengezarî”yê ji bêjeya “tengezar”ê û ji qertafa nîsbetê “-î”yê hatiye çêkirin.

Tengi: Rewşa ku nîsbeta “teng”ê dibe. Wateya vê bêjeyê “rewşa zehmet an a nexweş” e. Ev bêje, bêjeyeke navdêr e û mê ye. Bêje ji bêjeya “teng” û ji başbedika nîsbetê “-î”yê pêkhatiye.

Tengijandin: Tengijî kirin. Kesek bîhteng kirin. Bêjeya “tengijandin”ê, ji bêjeya “tengij”ê û ji qertafa raderê “-andin”ê hatiye çêkirin.

Tengijîn: Tengijî bûyîn; tengijandî bûyîn; bîhteng bûn, besebr bûn, hêrs bûn. Ev bêje ji lêkera “tengij”ê û ji qertafa raveyê “-în”ê pêkhatiye. Li vir forma lêkera “tengij”ê balkêş e. Bi texmîna min ev bêje, bêjeyeke kevnare ye; jiber ku “tengij” an jî “tengiş” ji du endaman pêkhatine 1. “Teng”; 2. “-îj/îş”. Halevku di roja îro da qertafa “-îj/îş”ê di zaravayê Dimilî de di wezîfeya raveyê de ye, û di Kurmancî de pir nayê dîtîn. Wê çaxê em dikanin bibêjin ku zaravê Kurmancî ev bêje bi forma rader a Dimilî, ji zaravê Dimilî standiye û qertafa xwe ya raderê ya Kurmancî (-în) pê ve zeliqandiye.

Tengkirin: 1. Der / dever nefireh kirin an jî zirav kirin. 2. Jiber ku teng, navê benekî palikên heywanan e, ev bêje tê wateya benê heywan tengkirinê. Lêkera “tengkirin”ê ji bêjeya “teng”ê û ji lêkera alîkar “kirin”ê çêbûye.

Tenha: 1. Ciyê bê kes, xalî. 2. Kesê/a bi serê xwe. Ev bêje di eslê xwe de bi forma “tengha”yê ye. Her çî qas di Farisî de qertafa dawiyê ya “-ha”yê wateya piraniyê dide jî, di Kurmancî de wateyeke li dij vê qezenc kiriye.

Tenî: Boyaxa reş ya argûnan ku ji dûmana êgir çêdibe ye. Bêjeya “tenî”yê ji bêjeya “ten”ê û ji qertafa îzafeyê “-î”yê hatiye çêkirin (?). Ji vê bêjeyê lêkerên “tenî kirin” (Bi teniyê, boyax kirin) û “tenî bûyîn” (Bi teniyê, boyax bûyîn) hatine çêkirin.

Tenik: Rengdêr e. Pehnbûna lawaz. Ne qalind, ne stûr. Ev bêje, di Farisî de di şiklê *tang* / *tanuk*, di Hindî û Sanskrîtî de jî di şiklê *tanuk* de derbaz dibe. Bêjeya “tenik”ê ji bêjeya “ten”ê û ji qertafa biçûkkirin û xweşikkirinê “-ik”ê hatiye çêkirin. Ji vê bêjeyê, lêkerên “tenik kirin” û “tenik bûn”, navdêrên “tenikbûn” û “tenikkirin”, rengdêrên “tenikbûyî” û “tenikkirî” hatine çêkirin.

Tenik bûn: Kêmbûyîna ji tiştêkî qalind, çêbûyîna zirav û tenikê wî. Bi kêmbûyîna qatên / beşên li ser wî tiştê qalind, rewşa nû ya wî tiştî ya tenik. Kûr nebûna avê. Bêjeya “tenik bûn”ê lêker e. Ji rengdêra “tenik”ê û ji lêkera alîkar “bûn/bûyîn”ê hatiye çêkirin.

Tenikî: Ziravî, nekûrî û naziktî. Ev bêje, him di wateya dîtbar him jî di wateya nedîtbar de tê bikaranîn. Bêjeya “tenikî”yê, ji rengdêra “tenik”ê û ji qertafa îzafê û nîsbetê “-î”yê hatiye çêkirin.

Tenik kirin: Zirav kirin. Bi kêmkirina ji tiştêkî qalind; çêkirina zirav û tenikê wî. Bi kêmkirina qatên / beşên li ser wî tiştên qalind. Bêjeya “tenik kirin”ê lêker e. Ji navê “tenik” û ji lêkera alîkar “kirin”ê hatiye çêkirin.

Tenperest: Yê/a ku hima hima bi dereceya perestînê li tenê - rûyê - serçavê - çermê xwe hez dike. Bêjeya “tenperest”ê ji bêjeya “ten” û ji paşbendika “-perest”ê çêbûye. 1. Başbenda “perest”ê, ji “perestî”ê ye, formeka wê jî “perist” e. Perest, forma kirdar a lêkera “perestî”ê ye û tê wateya “kesê ku perestînê dike.”

Tenperwer: Yê/a ku ji rih û xusetê xwe zêdetir, li tenê - çermê - rûyê - serçavê xwe hez dike. Bêjeya “tenperwer”ê ji bêjeya “ten” û ji bêjeya “perwer”ê çêbûye. “Perwer”, forma kirdar a lêkera “Perwerî”yê ye.

Tentene: Bi her babet benî hûnîna -wekî toran lê- tenik û zirav, ya li dorên hin paçan (mînak: şarik, rûyê balgiyan) tîn hûnandin. Bêjeya “tentene”yê, ji dubare bûna bêjeya “ten”ê çêbûye. Qertafa dawiyê “-e”, qertafa şibhîn û pêmayînê ye.

Encam:

Belê, bêjeya “ten”ê, her çiqas di wateya kurtane de çermê mirovan îfade dike jî, mîna ku di vê vekolînê de hate dîtîn, ewqas dewlemend e ku meriv dikane bibêje, xwe ji “navdêr”tiyê, veguherandiye “têgeh”tiyê. Lewra tê radiweste bi ziravbûn û pehnûna xwe ve “tenik”tiyê îfade dike, tê disekine bi şibihîn û pêmayîna xwe ve “teng”tiyê vedibêje; li formekê-duduyan hilnayê ev ev bêjeya “ten”ê, xwe bi gelek kincan dixemilîne û wateyên cûr bi cûr ji me re tîne zimên.

Desmala Bavê Min

Zafer BERDESTÎ

Di bin siya dara akasyayê ya biniya doşka malê de, li ser cila raxistî hêca rûnişt û niha dest û serçavê xwe bi desmala xwe ziwa dike. Bi dudilî be jî paqij dike, lewre taqet nake ku desmaleke din an jî pêşgirekê bixwaze. Ji traktor, vagona li pey û konê li ser vagonê diyar e ku ev demeke ji malê dûr in, belkî heftek an jî deh roj. Sala ku zevî pir bûn wisa dikir. Bi xwe re xwarin û pêxwarin, cixare, çay, av û ardû, gîsin, amûrên berdest û pêdiviyên din dibir. Hin caran demeke dirêj li serhev cot dikir. Serê sibê cot dikir, esrê cot dikir, êvarê û bişev cot dikir, heke kesek li cem nebûya carna ji ah diket. Carna jî yek bi xwe re dibir. Û heke ji xwe re xwarin nebirana min an birayekî min me ji wan re xwarin dibir.

Destmala xwe qat kir, da ser hev û danî ber xwe, li hêviya xwarinê bêdeng ma...

Gava ku desmal bir serçavê xwe û pêre çavê xwe girt, çû, çû xortaniya xwe. Gava ku desmalek ji diya min re şandibû, çend heyranok avêtibû ber, lê dîsa jî desmal lê vegeyribû, bişîrî û dinya lê ronî bû.

Diya min ew roj nan dipat. Li nimêja sibê vir de ber tendûrê bû. Teştek mezin nan, şeşek kade, siniyek sengesîr, dîzek keledoş û sêlek qelînek çekiribû û nanên çûbûn tendûrê bûbûn 'kût'¹ ji bo qaz û mirîşkan hildabû.

Sifre raxist, keledoşa bigoşt danî ser sifrê, rûnê sorkirî yê biîsot berda ser û hinek kirkirka kutandî û qelandî lê werkir. Di legeniyekê de pîvaz, tivir, marol danî ber keledoşê, nanê loş bi tevî ava sar jî da ber. Û çû tendûrê bigire.

Gava dengê traktorê hatibûyê rûyê bavê min ê bitoz û gewr hatibû ber çavê wê, serê xwe xwarî tendûrê kiribû û çûbû keçaniya xwe, desmala bavê min hatibû bîrê, ne desmal lê heyranokên bavê min ecibandibûn, edebî bûn û biedeb bûn. Dema ji

tendûrê derket dibişîrî.

Bavê min ji bîrê av hilçand. Satila avê danî ser kevirê dora bîrê, destê xwe û ser çavê xwe bi wê ava sar şûst. Ji bêrîka piştê ya şapikê xwe desmala xwe derxist û ber bi siya darê ve çû.

Rojekê li mektebê, di darsa pêşîn de kontrola paqijiyê hebû. Mamoste neynûk û desmal kontrol dikirin. Heke neynûkên yekî/ê dirêj bûna lê dida ku desmala wî/ê jî tunebûya carek din jî lêdida. Ew roj min jî lêdan xwaribû. Ya rastî desmala min hebû lê min ew dabû keça li pêş xwe. Ji bo ku desmala wê tunebû ji tirsan giriyabû û dilê min pê şewitîbû.

Çend sal ser re borîbûn, ew xama bûbû û gustil tiliya wê de kiribûn. Wê jî bi xemgînî û binifir desmal li min vegeandibû.

Min ava di satilê de li destê bavê xwe kir. Bavê min dest û serçavê xwe şûst û ji bêrîka xwe desmala xwe derxist. Dema ku çavê min pêketin ez çûm demeke berê. Li ser şîrîta kincan desmala bavê min a sipî ye xetşîn dîrve dibiriqî. Bayê, ew ji min re dihejand. Hema min jî rahişt, ew avê bîrîka xwe û berê xwe da xwenderê.

Min satil û kapê wê da ser hev, dema bavê min bangî min kir bişîrîna ser lêva min belav bû.

- Kurê min ka were em bi hev re bixwin.
- Noşî canê te be bavo min xwariye, ez têrim.
- Te çi xwar?
- Min û diya xwe, me ber devê tendûrê sengesîr xwar.
- Baş e, ka were, vê desmala min bide diya xwe, bila bişo.
- Temam bavo, ez desmala te ya din bînim?
- Desmala min a din kîjan?
- A spî ya xetên şîn li dorê...

¹ Li Serhedê tendûr bi piranî di 'erdê de ne. Ji bona wî, dema nan li tendûrê dixin carna nanê hêj ku hevîr e xwe nagire û dikeve 'erdê tendûrê û dişewite. Ji wî nanê ku dikeve erdê tendûrê re dibêjin; kût.

Ez ê Li Benda Te Bim

Seyfeddîn AYKAÇ

Ez ê li benda te bim li deşta Bekkê
Li her derî
Mizgîniya bûyîna te wê were bihîstin
Li her warî
Herkesê xweşiyek hîs bike di rihê xwe de
Mîna berxekî hêvî şivan
Ez ê benda te bim li deşta Bekke yê

Ez ê benda te bim mîna Waraqa
Çend sal derbas bibe
Li van deştên germ û tenê
Bi tenê êz ê bi yek di'ayê
Li vê devera tunebûnê de
Bi umîdeke bêhempa
Mîna Waraqa ez ê li benda te bim

Ez ê benda te bim li çiyayê ebû Qubeys
Dema te got "bi min bawer bin gelî mirovan"
Ez ê pêşa Ebabekirê te bigrim û
Bibim bawermendê te yê pêşîn
Dema te tiliya bimbarek dirêj kir
Hîva çarderojî xiste du keran
Ez ê li benda te bim li çiyayê ebû Qubeys

Ez ê benda te bim li baxê Taîfê
Wan kevir û kuçik davêtin
Ser û berê te di nava xwîne de dihiştin
Lê te destê xwe radikir û digot
Ew nizanin ya Reb!
Ez ji te 'efûyê dixwazim
Ew nizanin
'Eddas dihat bi îkrama xwe ve
Te jî abûheyat pêşkeşî wî dikir
Ez ê benda te bim li baxê Taîfê

Ez ê benda te bim li mizgefta Qudsê
A ku Sibhan bi şev te li rê bir
Hemî hevrêyên te wê bicivin li derdora te
Bi çend mizginiyan tê vegerî
Ez ê jî benda te bim li mescîda Heram
Dema kesî baweriya xwe bi te neanî
Ez ê 'eqîda xwe xurttir bikim
Mîna Siddîqê te
Ji bo ku ez ê bêjim
Heke Wî gotibe rast e
Ez ê benda te bim li nimêjgeha Heram

Ez ê benda te bim li Yesrîbê
Çavê min bi roj û şevan

Wê li riya te be
Digel wan qîzên Medîne
Ez ê jî "tele'el bedrû" bixwînim
Digel Ensarên mêhvandar
Ji bo tu keremî mala min bikî
Ez ê benda te bim li Yesrîbê

Ez ê benda te bim li Bedrê
Dema te destê xwe rakir û di'a kir
Ji ber zare zara te rîda kete 'erdê
Wê bi hezaran melek werin alîkariya me
Cebraîl, Mikail û Îsrafil wê bibin leşkerên te
Hz. 'Elî û Hemze wê bibin şêrên Xwedê
Ez ê benda te bim li Bedrê

Ez ê benda te bim li Uhudê
Laş û canê xwe sîper bikim li ber te
Dê tîrên mûşrîkan biçikin di canê min de
Derbên şûran wê li pişt û milê min bikevin
Xwîne biherike ji her derê min
Ez ê benda te bim li Uhudê

Ez ê benda te bim li binê dara Semûreyê
Ez ê destê te bigrim û te dubare bikim
Bi bî'ata razîbûyîne
Dil û baweriya xwe bixemilînim
Ji bo ku Rebbê alemê ji min razî be
Ez ê benda te bim di binê dara Semûreyê de.

Ez ê benda te bim li ser girê 'Erefê
Mînayê û ricma Şeytên
Dema te Xutba Xatirxwestinê îrad kir
Digel sehabeyên te
Hêstir wê ji çavê min jî birijin
Em hemî bi hev re
Em ê bibin şahidê te
Ez ê benda te bim li ser gire 'Erefê

Ez ê benda te bim li wan deran
Mîna çoraxekî bê av
Şîbhê kesê bê xweyî
Bi tena serê xwe
Gêjbûyî
Westiyayî
Nexweş
Ez ê li benda te bim li wan deran
Dibe ku tu werî
Şên bikî ruhê min ê wêran
Ez ê li benda te bim li wan deran

Di *Dîwana Hezîn* de Hêmanên Edebiyata Kurdî ya Klasîk

Yakup AYKAÇ

Edebiyata Kurdî ya klasîk, herçiqas li hêla şiklî ve bi sînora be jî, li aliyê naverokê ve xwe bi gelek çavkaniyên têvel û dewlemend xwedî dike. Di edebiyata Kurdî ya klasîk de Qurana Pîroz, Hedîsên şerîf, mû'cizatên pêxemberan, qisseyên weliyan, çîrokên mîtolojîk, dîrok, erdnîgarî, kozmolojî, sirûşt, keleş û hwd. dirijîn ser veznê û helbestên bêhempa derdikevin hole.

Dîwana Hezîn yek ji dîwanên edebiyata Kurdî ya klasîk a vê heyamê ye ku ji her aliyan ve gelek xurt hatiye honandin. Ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk yek ji mînakên serkeftî ye. Ji ber vê yekê di vê nivîsê de li dor Dîwana Hezîn, em ê çavkaniyên edebiyata Kurdî ya klasîk bibînin, jê sûd wergerin û bi mînanan ve wan mijaran rave bikin.

1. Ayetên ji Qurana Pîroz û Hedîsên Şerîf

Piraniya şa'irên Edebiyata Kurdî ya klasîk

ehlê medresê ne, 'alim in, dîsa gelekî ji wan mute-sewif in. Di medreseyan de kitêbên dînî xwendine, hînî zimanê 'Erebî û Farisî bûne, di 'ilmên dînî de wek Quran, hedîs, kelam, şerîat, fîqh û wd. kûr bûne. Ji ber vê yekê, ji bo şa'irên klasîk ayetên Quranê û hedîsên Pêxember 'eleyhîselam gencînek bêhempa ne. Şa'irên klasîk tiştên wiha di helbestên xwe de gelek caran bi lêv kirine. Hin caran bi hunera telmîhê, hin caran bi wateya wê malikê, hin caran jî rasterast iqtibas ji ayet û hedîsan hatiye kirin. Di Dîwana Hezîn de em mînakên wiha li gelek ciyan dibînin. Bo nimûne;

"We kûnû me'es sadiqîn" emrê îlahî sermedî

Pêk bîne herfiyan bi cih perhîziyê bikey kiras¹

Ciyekî din jî hedîsa meşhûr "İlm li Çînê be jî, biçin û hîn bibin." bi awayekî pisporî vê malikê xemilandiye;



¹ Hezîn, Mela Husnî, Dîwana Hezîn, Cih û tarîxa çapê nehatiye nivîsandin, r. 125

Bixazîn 'ilmê gerçî biçe Çînê

Weha ye emrê peyxember biray min²

2. 'İlmên Dînî

Di çarçoveya Quran û hedîsan de, di Îslamiyetê de zanistên din jî hene ku ew edebiyata Kurdî ya klasîk re bûne çavkanî. Bi taybetî di ne't, mehdiye (pesna pêxember), munaca'at, şemaîlan (helbestên behsa dirûvê pêxember dikin) de mirov gelek caran rastî wan zanistan tê. Ji xencî wan tefsîr (şîroveya Qurana pîroz), eqaîd (behsa riknên dînê Îslamê), kelam (behsa yekitiya Xwedê, zat û sîfatê Xwedê, dîsa bi awayekî mentiqî li ser riknên dînê Îslamê disekine), fiqh (rê û rêbaza dînê Îslamê wekî destmêj, nimêj, rojî hwd. çawa tê kirin) ji edebiyata Kurdî ya klasîk re bûne çavkanî. Di Dîwana Hezîn de mînakên bi vî awayî pir in. Wek mînak, li gorî dînê Îslamê nixumandina jinan ferz e. Di vê malikê de ev mijar bi awayekî şa'irane hatiye honandin;

Pîqrût û serqotê jinan serbest digerrin li deran

Ji wan ra kes nabêj çiman, heywax li min dîn çû ji dest³

3. Dîroka Îslamê û Qisseyên Pêxemberan

Dîroka Îslamê bi Adem pêxember dest pê dike û hetanî dewra 'esra se'adetê didome. Di vê dîrokê de mirov û bûyerên girîng her tim bala helbestvanên klasîk kişandiye ser xwe. Çi şer û bûyer be, çi fikr û ramanên cuda be, çi lehengên muhîm be di malikên helbestan de ciyê xwe girtine. Dîsa di wan helbestên klasîk de Hz. Pêxember 'eleyhîselam û çar xelîfeyên Wî, şehabiyên Wî, 'alimên mezin ên Îslamê wek pêşeng û mînak tê nîşandayîn.

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de berhemên 'ewil piştî Îslamiyetê hatine nivîsandin. Wek tê zanîn Baba Tahîrê Hemedanî û Baba Serhengê Dewdanî helbestên pêşîn ên edebiyata Kurdî ya piştî Îslamê nivîsîne. Piştî qebûlkirina Îslamiyetê, di vê tîkiliyê de wêjeya 'Erebî û Farisî hertim bandora xwe li ser edebiyata Kurdî ya klasîk diyar kirîye. Lewra helbestvanên Kurd ên klasîk hemî jî di perwerdehiya medreseyan de derbas bûne, bi ilmên Îslamê re hemhal bûne, di jîyan û berhemên xwe de ew tetbîq kirine. Li vir jî du mînakên xweş van dirastînin;

Musulmaniyê ra Resûl rehber e

Kitaba wê Qurana ku wek wê nîn e

2 Hezîn, j.n.b, r. 234

3 Hezîn, j.n.b, r. 64

Dûra pişuwayê wî dînê delal

Ebû Bekr û Farûq ê wek 'Elî ne⁴

û li ciyekî din jî wiha derbas dibe;

Ji Ehmed ra divêt Cibrîl ji Mûsa ra divêt Xidrek

Ji Romî ra divêt Şems û ji Xanî⁵ Xalidek⁶ ya Reb⁷

4. Mu'cîze, Qisse û Keramet

Mu'cîzeyên Hz. Pêxember 'eleyhîselam û pêxemberên din û kerametên welîyan ji civaka Îslamî re herdem bûye mînak. Helbestvanên edebiyata Kurdî ya klasîk jî, carînan rasterast carînan bi rêya telmîhê helbestên xwe xemilandine. Wek mînak; şeqqûl qemer, ji tiliyên Hz. Pêxemberê de wekî kaniyê rêtina avê, bi heywanan axaftina wî ji çend mu'cîzeyên Hz. Pêxember 'eleyhîselam yên namdar in. Dîsa Hz. Îbrahîm ku avêtinê nêv êgir, gopalê Hz. Mûsa ku bûye mar, axaftina bi Xwedê re, zanîna zimanê çivîkan a Hz. Silêman, ji koletiyê hetanî wezîrtiya Hz. Yûsif, ji derdê girînê korbûna Hz. Ye'qûb û wd. (Selama Xwedê li ser hemîyan be) gelek caran di wan helbestan de hatine bikaranîn. Di vê malikê de behse mûcîzeyê Îsa pêxember dike:

Ma gelo helma 'Îsa ye van nexwaşan xweş diket

Yan kî ruh e hatiye şandin ji baxê emrê yar⁸

Dîsa mu'cîzeyên Hz. Mûsa ku li çiyayê Tûrê bi Xwedê re axiviye, gelek meşhûr e û ji şa'irên edebiyata klasîk re gelek caran bûye çavkanîyek. Wek tê zanîn, dema Hz. Mûsa li Tûrê teceliya nûra Xwedê Te'ala dibîne zehf ditirse, hingê dengêk dibihîze ku jê re dibêje "Ez Xwedayê 'ezîz im". Di vê malikê de jî em vî dibînin;

4 Hezîn, j.n.b, r. 266

5 **Xanî:** Necmeddînê Xanî. Xanî gundekî nêzî bajarê Helebê ye. Necmeddînê Xanî yek ji xelîfeyên Mewlana Xalîd bû. 'Alim û mutesewîfê mezîn ê zemanê xwe bû.

6 **Xalîd:** Mewlana Xalîdê Kurdî yê Şarezorî. Bi nasnavê Diyaudîn (Roniya dîn) û Qutb-ul 'Arîfîn (Mezinê zaneyan) jî tê nasîn. Şêx, mutesewîf, 'alim, şa'îrekî mezîn bû. Mewlana Xalîd di 1773 de li gundê Qeredaxa girêdayî bi Cafê ye hatiye dinyayê û di 1826 de li Şamê wefat kirîye.

7 Hezîn, j.n.b, r. 48

8 Hezîn, j.n.b, r. 103

*Bi nûra tûrê Mûsa nedidît rahek hêla heq da
Eger dengê “enallah ûl ‘ezîzû” nebûya ya Reb¹⁰*

Di vê malikê de jî şa’ir kerametê Şêxê Xezna anîye zimên;

*Di behran da gerrînker bû Mecellan
Li eflakan¹¹ digerre kalê Xezna¹²*

5. Tesewif

Dîroka tesewifê di sedsala duyem a hîcrî de bi tevgera “sûfîti”yê dest pê dike. Piştî di sedsala 9. de li Semerqend, Bûxara, Xorosan û wd. gelek sûfî û weliyên mezin gihîştin. Di sedsala 10. de felsefa Yewnaniyan bandorek li tesewifê kir. ‘Alimên wek Farabî, Îbnî Sîna û Ferxedînê Razî gihîştin.¹³ Bi Hellacê Mensûr û Îbnî ‘Erebî ramana “wehdetûl wucûd” kete nav tesewifê. Piştî jî şaxên terîqetan wek Neqşibendî, Qadîrîyî, Suhrewerdîyî, Mewlewîyî û wd. ava bûn.¹⁴

Di edebiyata Kurdî ya klasîk de tesewif cihekî gelek berfireh û girîng digire. Di dîroka Kurdistanê de tê dîtin ku tesewif hertim li civaka Kurdan hatiye jiyandin. Dîsa di vî warî de gelek ‘alim û mutesewifên mezin ji civaka Kurdan derketiye û li ser gelê xwe bandorek mezin kiriye wek Mewlana Xalidê Şehrezorî û Şehabedînê Suhrewerdî. Tesewif bi piranî medhiyeyên pêxember, şêx û pîrên terîqetê de xwe nîşan dide. Şa’irên tesewifî, di helbestên xwe de tiştên ku di dîn de heram e, wekî remz bi kar anîne. Di wan de yên herî zêde tê bikaranîn mey, şerab, cam (îskana şerabê), xerabat (meyxane), saqî (yê ku meyê belav dike), meclîsa ‘işret (cihê zewk û sefayê), dêr, kafir û wd. di dîwana Hezîn de jî gelek mînakên wê hene.

*Hezîn herdem dinoşit xelqê j’destê dostê mey nabê
Heyata vê dinê xweş hat welê zivîr e ji bo min ra¹⁵*

Di dîwana Hezîn de gelek caran navên Şêx Ehmedê Xeznewî, Şêx ‘Izzedînê Xeznewî, Şêxên mezin ên terîqeta Neqşibendiyê wek Şahê Neqşibend, Îmamê Rebbanî, Şêx Ebdûlxaliqê Xûjdewanî û wd. gelek şêxên din ên mezin derbas dibin. Ji xêncî wan remz/nîşanên ku jorê me qal kir, bêhna tesewifê gelekî xurt jê tê. Wek mînak:

*Murşidek himmet bilind e mîna wî îro nîn e
Helqa zêra neqşebend e ‘Izza Şahê Xeznewî¹⁶*

Mînakek din de jî wiha dibêje:

*Ji Xeznaê xuya bû dilberek hîv rojê qelban ra
Dilê jar pare bû ya Reb ji ‘işqa wê delalî ra¹⁷*

6. Kesayetiye Dîrokî û Lehengên Efsanewî

Di nav çavkaniyên edebiyata Kurdî ya klasîk de kesayetiye dîrokî û serlehengên efsanewî jî hene. Carînan taybetiyên wan kesan di helbestan de wek mînak tê nasandin. Bi wan legehengên efsanewî sînoren xeyalan hêj berfirehtir dibe, çêj û tameke cuda dixe nav helbestê. Wek mînak navê Behlûlê Dana, Karûn, Noşîrewan, Xatemê Taî, Arîsto, Eflatûn, Cimşît, Dehhaq, Selahedinê Kurd, Skender, Rustemê Zalê Kurd, Şêxê Sen’an, Manî û wd. gelek caran helbestên klasîk de cihê xwe digirin. Her wiha em wan lehengên dîrokî û efsanewî di Dîwana Hezîn de jî dibînin.

*Nedikir te’sîr di dil da gurzê Rustemê giran
Lêbelê têk tarûmar bû bi serê movika çerx¹⁸*

Ciyekî dinê jî bi evîna keçikeke Ermen ve namdar Şêxê Sen’an derdikeve pêş me;

*Şeyxê Sen’anê nedît cewr û cefa ya kî me dît
Roj bi roj zêde dibû derd û kul û êş û keder¹⁹*

7. Dawe û Regezên Gelêrî

Şa’irên edebiyata klasîk mirovên xwende û zana ne. Heremên cuda yên Kurdan dîtine, devoka wan nas kirine. Û dîsa ji bilî wan medreseyan de ji

9 Enallah ûl ‘ezîzû: Ez Xwedayê ‘ezîz im.

10 Hezîn, j.n.b, r. 47

11 Eflak: Pirjimariya “felek”ê ye. Felek, dolab, asîman

12 Hezîn, j.n.b, r. 34

13 Bircan, Hasan Hüseyin, İslam Felsefesine Giriş, Ensâr Neşriyat, İstanbul 2008

14 Kara, Mustafa, Tasavvuf ve Tarikatlar Tarihi, Dergâh Yayınları, İstanbul 2013

15 Hezîn, j.n.b, r. 11

16 Hezîn, j.n.b, r. 310

17 Hezîn, j.n.b, r. 24

18 Hezîn, j.n.b, r. 80

19 Hezîn, j.n.b, r. 94

xêncî ‘ilmên dînî, ‘ilmên mentiq, riyaziye, felsefe, erdnîgarî, tip, zimanê (bi taybetî Erebi û Farisî) didîtin. Ji ber vê yekê helbestvanên edebiyata Kurdî ya klasîk ‘ilmên zemanê xwe jî çî hînbûne çî bihîstine di helbestên xwe de bikar anîne. Di Dîwana Hezîn de em rastî çend nimûneyên ji ‘erdnîgariya dinyayê tî, wek çemên parzemîna Amerîkayê yê herî dirêj û fireh: Mîsîsîpî û Amazon, dîsa çiyayê herî bilind ê dinyayê: Hîmalaya derbas dibe.

Wekî Amazon fireh û wek Mîsîsîpî dirêj

Qisseyaya jana dil û wan herdu çavê xwûndirêj²⁰

Di gelek ciyan de têgehên zanistîya fennî wek; mîkrob, mîkroskob, pîl, cêyran, dozer, trimbêl derbas dibin.

Mikrob ji bo bête dîtin divê te mîkruskob bira

Nexweşî bo bê naskirin divê hekîmekî keleş²¹

Digel wan tiştan di dîwanê de em rastî agahiyên derbarê biyolojî û tipê jî tî. Wek mînak:

Hêkê xwe datîne wê da çilêkan tê derdixe

Lew dibîni havîne kurm rêxê da têtin xurûş

Pizikê xortî û xûryê her du yek şeklê ne lê

Yek nîşana ronîya çavan e ê dî çavfiroş²²

8. Çanda Kurdewarî

Helbestvanên Kurd, hêj feqîtî/bîçûktiyên xwe de di gelek deverên Kurdistanê de dest bi perwerdehiyekê baş dikirin. Da ku feqîtîyên xwe xilas bikirina li gelek medreseyan digeriyan û dixwendin. Ji ber vê yekê çanda gelê xwe, devoka li wê heremê, ‘edet û kevneşopiya netewê xwe hîn dibûn. Jiyana civakê, guherînên civakî, ‘edetên cejn û dewatan, jinxwestin, berdêlî, sinnetkirina zarokan, mewlûd û adetên wê, siwarbûna hespan, şîn, serxweşî û serdana nexweşan, mêtavdarî, kêf û şahiyên netewî çawa dibû, çawa pêk dihat hîn dibûn. Bi vî awayî ‘eksa wan tiştan teqez di helbestên şa’iran de xwe re cî dibînin.

20 Hezîn, j.n.b, r. 120

21 Hezîn, j.n.b, r. 128

22 Hezîn, j.n.b, r. 131



Di dîwana Hezîn de jî, wekî me qal kir, minakên wiha zehf zêde ne. Wek mînak, li ser “Beko” gelek biwêj û gotin hene ku êdî çanda Kurdan de ew tiştêkî asayî ye. Li jêrê jî em mînakek wiha dibînin:

Wek Bekoyan karê wî şeytanî ye

Yar ji yaran dûr dixîne şev û roj

Bi hezaran nazenîn û nazikan

Bal mirin ve dişîne şev û roj²³

Di civata Kurdan de çandîni û ajaldarî her-tim karê pêşîn bû. Ji ber vê têgehên di vî warî de zimana Kurdî de gelek berfireh e. Em dibînin ku bi vî şiklî têgehên çandîni di dîwana Hezîn de jî hatiye nîminandin:

Kaxuk²⁴ û kulbekê²⁵ li wî bikey zû

Binve rakey hissê heywanî ji qelbê²⁶

Dîsa em dizanin ku piraniya helbestvanên Kurdan di civakên xwe de mirovên serek in. Agahiya wan ji derdora xwe, cînar û ‘eşîran heye. Kîj ‘eşîr çiyê, li ku ne, ji ku hatine, dizanin. Di dîwana

23 Hezîn, j.n.b, r. 119

24 **Kaxuk**: Kax kirin, alax kirin, gihayê biyanî û zêde ji kok ve rakirin.

25 **Kulbe**: Amûrê kulb, tevîr, xepar. Destiyê wê dar e, serê wê jî bi hesin hatiye çêkirin. Kulbekirin jî navê wê şixulê ye.

26 Hezîn, j.n.b, r. 43



Hezîn de jî di vê malikê de navê ‘eşîra Heyderî derbas dibe ku bi jinên xwe yên rind û bedew ve meşhûr in. Kezî û biskê wan jinan ji şa’irî re bûye îlhamek û wekî remzek di vir de bi kar aniyê;

*Ne bi baxan û kulilkan ne bi ser xêliyê bûkan
Ne bi biskê Heyderî xweşt dibînit mestî ruh²⁷*

9. Ziman

Bingeha edebiyatê, ziman e. Şa’ir çendî ku zimanê xwe bi pisporî bikar tîne, ewqas serfiraz dibe. Dîsa zimanê xwe bi biwêj, gotinên pêşyan, metelok, mamik û gotinên xweş ve hindî ku bixemilîne, berhemê wî ewqas dikemile û helbestên bi çêj û tam derdikeve holê.

Dîwana Hezîn ji aliyê zimên ve gelek bihêz e. Di dîwanê de herçiqas digel Kurdî, peyv û hevokên ji zimanê ‘Erebî, Farisî û Tirkî hebe jî zimanê dîwanê bi rihetî tê fêmkirin. Ji xêncî wan, helbestvan di dîwana xwe de gelek caran malikên xwe bi biwêj û gotinên pêşyan ve xemilandiye. Ev jî ji hêla zimên ve asta dîwanê hêj zêdetir kiriye. Wek mînak;

*Xûlî li ser dibêjim ger şerhevalê gor bit
Xwûzî bi min dibêjim ger xêrheval be min ra²⁸*

Ciyekî din jî biwêjek ku di nav gel de gelek caran tê bikaranîn, bala me dikişîne:

²⁷ Hezîn, j.n.b, r. 79
²⁸ Hezîn, j.n.b, r. 20

*Hîşar be serbijorê pozbilindê nav nigê ‘ekrût²⁹
Heval çûn kariwan borî li cih mayî tenê xew da³⁰*

Encam

Mirov dikare bibêje dîwanên klasîk çand û jiyana zimanê Kurdî ne. Li kîj hêlê dibe bila bibe bi daneheva çandinî ya sedan salan di wan dîwanan de hatine cem hev û fênanî deryayên bêbinî di nav xwe de hûtên mezin xwedî dike. Dîwana Hezîn yek ji wan dîwanan e ku, bi helbestên xwe yên dewlemend ji hêmanên edebiyata Kurdî ya klasîk re gelek mînakên serkeftî pêşkêş dike û dîsa ji hêla naverokê ve di çanda Kurdewarî, ziman, lehengên efsûnî û dîrokî, tesewif, dîroka pêxemberan, ji îqibasên Qur’an û hedîsan, şîret û pendên olî û sincî, rexneyên li ser civakê û hwd. de gelek mînakên nav xwe de dihevwîne.

Wekî me di vê gotarê de jî rave kir, dîwana Hezîn hem ji hêla naverokê ve hem jî ji hêla zimên ve nîşanê me dike ku ji bo edebiyata Kurdî ya klasîk mînakek bêhempa ye.

Cavkanî:

1. Hezîn, Mela Husnî, Dîwana Hezîn, Cih û tarîxa çapê nehatiye nivîsandin
2. Aykaç, Yakup, “Kurtenêrînek Li Dor Dîwaneke Bêhempa: Dîwana Hezîn”, Kovara Nûpelda, Hejmar 15, Wan
3. Sagnîç, Feqî Huseyn, Dîroka Wêjeya Kurdî, Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, Stenbol, 2022
4. Bayezîdî, Mela Mehmûd, Adat û Rusûmatnameê Ekradiye, Lêkolîn Jan Dost, Nûbihar, Stenbol, 2010
5. Kara, Mustafa, Tasavvuf ve Tarikatlar Tarihi, Dergâh Yayınları, İstanbul 2013
6. Pala, İskender, Divan Edebiyatı, Kapı, İstanbul, 2012
7. Pala, İskender, Ansiklopedik Divân Şiiri Sözlüğü, Kapı, İstanbul, 2012
8. İpekten, Haluk, Eski Türk Edebiyatı Nazım Şekilleri ve Aruz, Dergâh, İstanbul, 2013

²⁹ ‘Ekrût: Rûpis, kesê pis û nebaş
³⁰ Hezîn, j.n.b, r. 16

Şîrmêjî û Xwînrejî

Ömer DELİKAYA

rojgar şîr e qaqîlbazo kelek maye birije
ji devê zarokê li ber pêşîrê
ji difnê evîndarên ne ji dil,
berbanga heşîrmîzanê dipê

baş binêre qaqîlbazo, başebaş guh lê bidêre
ji çend heyam ji me wê de, li wê tangê
li hêsiya Nînovaya kevnare dike ku agir bibare
li ser şîrmîjekî ji şîrmîjan
li ser bavê Smaîlî, ji vê xaka bavûkalan xemilî
lîstibû bi xîçên gilover ên rengrengî
vexwaribû ji avên Feratî wî zatî
tikîtenê kelimîbû rastiya ji dilê wî hatî!
li hember xwînriyek ji xwînrijê vî welatî.

baş binêre qaqîlbazo, başebaş bala xwe bidê
pîrhevok wê biçîrîne konê lê kirî
wê bitemire roya ji pişt Çiyayê Qafê zeyandî
wê bibin kirên nekirî
wê rabin robarên nebînayî
wê bişkê ev hêka dinyayê
belam cilq bûye, jê tiştek dernayê

belam li dinyayê axîrzeman e
çawa dîtî koran e
çawa bihîstî keran e
“hezîkirin” li dergahê heftan e
“jiyan” her roj li me dike talan e
“mirin” ne ku li hêviya kalan e
gur e, li pişt berxê siwar e
çerxa felekê digêrîne, har e.

Di Şekilgirtina Sûdanê De Rola Kurdan û Kurdîstana Sûdanê

Ahmet DEMİR

DESTPÊK

Gelo çî tîkiliya Kurdan bi Sûdanê re heye? Îcar Kurdîstan ji ku derket? Kurd, ji kînga ve li vî welatî ne? Hin vekolîn dibêjin ji heyama Medan û bi vî alî ve, hin dibêjin, ji heyama Selahaddînê Eyyûbî û pê ve û hin jî dibêjin ji heyama Mihemmed Eliyê Qawalayî û bi vî alî ve Kurd li wir bi cî bûne. Gelo di vê mijarê de rastî çî ye yan jî kîjan e? Dê di vê vekolînê de, bersivên van pirsan werin dayîn û rastiya mijarê dê bi we xwendevanan re were parve kirin.

Di destpêka nivîsê de dê danasîna erdnîgariya Sûdanê were kirin. Dû ra jî peywendiyên Kurdan bi Sûdanê re çawa dest pê kirin û çawa geş bûn, Kurd li wir çawa bi cî û war bûn, dê bi awayekî hûrgulî were şîrovekirin.

Komara Sûdanê, di warê firehtira qadê de dewleta sêyemîn a Efrîqayê ye. Paytextê wê Xurtûm e. Sûdan, li rojhilata Efrîqayê cî digre. Ev dewlet, bi aliyê bakur ve bi Misirê re, bi aliyê rojhilata bakur ve bi Deryaya Sor re, bi aliyê rojhilat ve bi Eftîyopya û Eritreyê re, bi aliyê başûr ve bi Sûdana Başûr re, bi aliyê rojava ve bi Komara Efrîqaya Navîn re û bi aliyê rojavaya bakur ve bi Lîbyayê re dorpêçkirî ye.

Çemê Nîlê, bi navên Sûdana Başûr û ya Bakur, Sûdan kiriye du beş. Çemê Spî û yê Şîn, li nêzî Herêma Rafediyeya Xurtûmê, tevlî hev dibin. Nêwala Nîlê di nava Sûdanê re derbas dibe ku ev di tîkiliyên bi derve re yên çandî û aborî yên vê dewletê de, roleke mezin dilîze.

Mirov, ji berî zayînê pênc hezar sal û bi vî alî ve li Sûdanê dijîn. Ev dewlet, bi mezinbûna rûpîvana xwe ve ku derdora 1886 mîlyon km² ye, 16. dewleta herî fireh a cîhanê ye. Sûdan, di sala 2011an de wekî du beşan; ji hev veqetîya û bi vê jî hev veqetîne ve payeya mezinbûna rûpîvana li Efrîqayê, ji destê wê derket (bû sêyemîn mezintir), derbasî Gezayîrê bû.

Sûdan, ji aliyê gelheyê ve jî, bi 30.9 mîlyonan va di cîhanê de di rêza 40. de ye.

Ziman: Li vê dewletê zimanê fermî û perwerdeyê Erebî ye. Digel ji aliyê gelek kesan ve zanîna Erebî, zimanê piraniya gel, ne Erebî ye. Zimanên wekî Nuyayî, Fûrî, Nûbanî, Ingessanayî û Kurdî jî tên axaftin.

Dînê Fermî: Li Sûdanê keşê fermî Îslam e; ji 90 % xelk Misilman e. Yên mayî Anîmîzm û Xiristiyanên Qiptî û yên Ortodoks in. Piraniya Misilmanan li wir Sunnî ne û Sunnî jî Şafî û Malîkî ne.¹

JI ALIYÊ KURDAN VE FETIHKIRIN û MISILMANKIRINA SÛDANÊ

Bila bê zanîn ku, di mêjû de dema qala Sûdanê tê kirin, armanc qadeke ji Sûdana îro pirr pirr firehtir e. Dema Misilman cara pêşî çûn Efrîqayê, ji qeraxa Deryaya Sor heya qeraxa Efrîqaya Rojavayê, ji wê qada fireh giş ra, gotin “Biladu’s Sûdan / Welatê Reşan”. Dû ra ev bêjeya “Bîlad”ê jî hat avêtin û bes “Sûdan” ma. Ango Sûdana îro ya fermî, Sûdana mezin a mêjûyî ne, hew Sûdana Rojhilat a mêjûyî îfade dike.

Wekî tê zanîn Misir, di sala 639î de ji aliyê Amr lawê As ve hat zeftkirin. Misilmanên ku li Misirê bi cî û war bûn, di destpêkê de, wekî bazirganan çûn Sûdanê û Misilmantî li wir dan naskirin. Ji xelkê wê herêmê beşekê, di wê heyamê de Misilmantî qebûl kir; lê pîrraniya wan ev keşê nuh nepejirandin û Xiristiyan man.

Her çiqas Misilmanan ji sedsala heftan û vir da hewl didan ku Misilmantiyê li Sûdanê belav bikin û vî welatî tîxin nav rêvebiriya Misilmanan jî, di vî warî de heya sedsala XII. bi ser neketin. Ev fetîh di sala 1172î de ji aliyê Eyyûbiyan va hate verast kirin.

Sultan Selahaddîn Yûsuf, di vê salê de birayê xwe

yî mezin Şemsuddewle Toran Şah, bi femandariya artêşekê dişîne ser Sûdanê. Di wê heyamê de, ji Sûdana Îro ra “Nûbe” dihat gotin û ev Nûbe li başûrê Misira Başûr (Seîd) bû. Li wir Keyaniyeke Xiristiyan hebû. Vê Keyaniyê, piştgirî dida dijberên Selahaddînê Eyyûbî yên li Seîdê. Keyê Nûbeyê jî car caran êrîşî vê herêma Eyyûbiyan dikir.²

Di vê peywendê de, komek ji Nûbeyiyan / Sûdaniyan di sala 1172an de ber bi welatê Eyyûbiyan va hat û êrîşî Seîdê kir. Di vê êrîşê de gelek gundên bi Eyyûbiyan ve girêdayî, bi destên Nûbeyiyan hatin talankirin.

Çaxa ku Selahaddînê Eyyûbî bi van êrîş û piştgirî dayîna dijberên Eyyûbiyan a Nûbeyiyan dihesê, derhal artêşekê amade dike û bi ser Nûbeyiyên/Sûdaniyên talanker de dişîne. Artêşa Eyyûbiyan dihere û dikeve nav axa Sûdanê. Artêşa Sûdanê jî tê li hember artêşa Eyyûbiyan disekine. Di navbera van her du artêşan de şerekî diwar diqewime. Ji herdu aliyan gelek leşker tîn kuştin. Ji ber ku artêşa Nûbeyiyan xurt û ji ya Eyyûbiyan qelebalixtir bû û ya Eyyûbiyan ji dûr hatibû û ti aligirên Eyyûbiyan li wê herêmê tunebûn, Sûdanî bi ser ketin, Eyyûbî bi xisareke mezin tîk çûn.

Dema ku Siltan Selahaddîn ji vê tîkçûnê û zayîatê haydar dibe, bê rawestîn, artêşeke saxlem amade dike; birayê xwe yî mezin Şemsuddewle Toran Şah dike femandarê wê û di Cemaziyelewwela 568î de (Kanûna 1172) bi ser Sûdanê ve dişîne.³ Ev artêş ewqas bi heybet û hêzdar bû ku, Sûdaniyan newêrîbûn derkevin pêşberî vê artêşa Eyyûbiyan; û bi neçarî reviyên. Li ser vê revîna artêşa Xiristiyanan, artêşa Misilmanan jî hema bi lez da dû wan. Leşkerên Eyyûbiyan, ku ji wê artêşê kî girtin, kuştin. Bi vî awayî gelek leşkerên Sûdaniyan bi destê leşkerên Eyyûbiyan va ji holê hatin rakirin.⁴ Mîrzadeyê Eyyûbiyan Şemsuddewle Toran Şah, bi vê serkeftinê ve, ji rojhilatê heya rojava, welatê Sûdanê seranser bi destxist.

Li welatê Sûdanê bi navê “Îbrîm”ê kelayek hebû ku Toran Şah, piştî tîkoşîneke giran, ev kela jî zefî kir, ji xwe re kir navend û demekê li wir ma. Mîrzadeyê Eyyûbiyan, welatên ku nuh bi destdixistin, li vî bajarî bi rê ve birin.

Piştî demekê hat dîtin û fehmkirin ku dahatên vî welatî kêr in, bacên ku tîn berevkin hindik in û ev welat bi xwe muhtacî alîkariyê ye. Mîrzadeyê Eyyûbiyan ji vê rewşê aciz bû. Ji girêdayiyên xwe Kurdekî bi navê Brahîm hildibijart û li dewsa



Wêne 1: Li Sûdanê Dîmenek Ji Warên Kurdan



Wêne 2: Bi Kincên Xwe Yên Neteweyî Ve Kurdekî Sûdanê

xwe li wir hişt. Ango Kela Îbrîmê radestî vî Brahîmî kir; bi xwe jî barî bajarê Kûsê yê Misirê kir. Piştî çûyîna Kûsê, Şemsuddewle Toran Şah li Misirê gelek Kurdan kom dike û ji bo piştgirî û alîkariyê dişîne Sûdanê cem Brahîm. Bi demê re him jimara Kurdên Sûdanê û him jî dewlemendiya wan pirr zêde dibe. Bi vê zêdebûn û dewlemendiyê, hêza Kurdan xurt dibe û dest bi êrîşa doralîyên Sûdanê dikin.⁵

Li dû demekê, baweriya Sûdaniyan pê hat ku Şemsuddewle Toran Şah bi rastî ji Sûdanê vekîşiyaye, hingê leşkerên xwe berev kirin, bi ser erdên xwe yên ku ketine destên Eyyûbiyan de meşîyan û beşeka mezin zêft kirin. Keyayê Sûdanê, piştî van serkeftinan jî Şemsuddewle Toran Şah ra ku wê çaxê hîn li Kûsê bû, qasidek şand û jê aşîti xwest. Şemsuddewle Toran Şah, li dû qebûl kirina qasidê keya, qasidekî xwe ku navê wî Mesûd bû, bi qasidê keyayê Sûdanê re, şand û bi navgîniya wî, ji keya ra bersiveke wiha da:

“Heke hûn bacê bidin, wê aşîti pêk were!”

Şandiyê Şemsuddewle Toran Şah, dema ku gihîşt paytextê Sûdanê yê wê demê ku navê wê “Dûnqûla” bû, dît û fehm kir ku ev der, welatekî zêdetir xizan e û xelkê wê, bêyî gêris, ti xwarinê nizane. Digel gêris, hinek jî xurmeyên wan hebûn. Hemû xwarinên wan, ji nanê gêris û xurmeyan hatibûn çêkirin.

Li paytextê Sûdaniyan Dûnqûlayê avahiyeke mezin bi tenê hebû; ew jî Seraya Keyayî bû. Îcar berevajî vê, xelkê wê derê giş, di xanîk û şikeftan de dijîyan.

Abu’l Farac, dîtineke Qasid Mesûd ya li Sûdanê, wiha radiguhêze:

“Min rojekê dît ku Keyayê Nûbeyê şîlf û tazî ji qesra xwe derket derva û li hespeke tazî siwar bû. Dû ra, keyê parçeyek etlez avêt ser piştî xwe û bi awayekî serqot / sernenixumandî dest bi gerê gir. Dema ku ez nêzê bûm û min silav lê da, keya kenîya û dû ra ferman da û li ser serê min textekî mîna xaçê sewitandin. Dû ra, bi qasî 50 lîiran tene dan min û destûr û fermana birêkirina min da.”⁶

Di sala 569 / 1173an de rewş guherî, dev ji bac standinê hat berdan û Şemsuddewle Toran Şah rasterast ji bo zêftkirina Sûdanê sefereke din li dar xist. Bi artêşeke xurt berê xwe da welatên başûr. Eyyûbiyan bi vê seferê hemû welatên başûr zêft kirin û li ser niştecihên wan welatan, serweriya xwe da pejirandin.⁷ Bi vî awayî cara dawî, Sûdan û

girêdayiyên wê, bi yek va û rasteqînane bi serweriya Eyyûbiyan va hatin girêdan.

Li gor bûyerên dîrokî yên ku li wir qewimîne, xuya dike ku ev desthilatdariya Eyyûbiyan li wir demeke dirêj dewam kiriye. Dem hat, piştî ku li Misirê Dewleta Eyyûbiyan têk çû, Dewleta Memlûkiyan ava bû. Di vê gengeşiyê de li Sûdanê jî hin pirsgrêk û tevlihevî çêbûn. Li ser wan aloziyan serwerê Memlûkiyan Baybars çû vî welatî û hemû pirsgrêk ji holê rakirin.

Heya desthilatdariya padîşahê Usmaniyan Selîmê Yawûz (1517), desthilatdariya wê derê, ji destekî diket destekî. Di heyama Usmaniyan de, li vî welatî jiyaneke ji rêzê tê jiyîn.

Îcar di sala 1821an de serwerê Misirê Mihemed Eliyê Qawalayî, ku bi eslê xwe ve ji Kurdên Îlîça Erzînganê ye, artêşekê dişîne ser Sûdanê ku di van demên borî da ketibû destê Dewleta Fûncê û hemû xakên wê zêft dike. Bi vê zêft kirinê ve, li dû demeke dirêj Sûdan cardin dikeve bin serweriya Kurdan. Lê mixabin, Mihemed Elî di rêvebiriya Sûdanê de siyaseteke xelet dimeşîne, bidestxistê Sûdanê Îsmail Paşê jî wezîfeyê distîninê, lawê xwe dike rêvebirê vî welatî. Ew jî bi hin hesabên siyasî bi Îngilîz û Frensîyan re dikeve têkiliyê; parêzkariya hin eyaletan radestî wan dike. Ev rewş, xelkê Misilman yê Sûdanê aciz dike. Li hember vê rewşê xelkê Sûdanê, di bin serokatiya Mihemmed Ehmedê Mehdî de serî hildide. Ji vê tevgara wan ra “Hereketa Ensar” tê gotin. Artêşên ku hatin ser wan, bi ser neketin; di vê pêvajoyê de girêdana Sûdanê bi Misirê re ewqas lawaz bûbû, mîna ku Sûdan ne di bin rêvebiriya Misirê da be. Mihemmed Ehmed di 22yê Çileyê 1885an de dimre û lawê wî Evdîllah dikeve dewsa wî. Di encamê de Evdîllah li Omdurmanê, li hember artêşa Misirê ya di bin femandariya Herbert Kitchner de, têk diçe.

Îngilîz demekê şûnda, bi navê duristkirina rêvebiriya Misirê ya li Sûdanê, di 1899an de rasterast ketin Sûdanê. Pêşî, efareyên Herketa Mehdî ji holê rakirin. Her çiqas serhildanên ku di salên 1920an de derketin, rêvebiriya Îngilîzan hejand jî, di dawiyê de ev hemû berxwedan ji aliyê van dagirkeran ve hatin tefandin. Sûdan, heya ku di sala 1956an de serbixwebûna xwe bi dest bixe, wek mêtîngehekê ma.

Di roja îro da, li Sûdanê pirsgrêka Darfûrê heye ku ev, bi serê xwe mijara vekolîneke serbixwe a din

e (ji bo vê yekê li vir em li ser nikanin bisekinin) û serê rêveberiya Sûdanê diêşîne.

KURDÎSTANA SÛDANÊ



Wêne 3 : Berî 2011an Li Ser Nexşeya Sûdanê Şûna Eyaletên Kurdufan/Kurdofanan

Li Sûdanê berê, Kurdîstanek bi tenê ne, bi navê “Kurdofan”ê, sê Kurdîstan hebûn. Heya sala 2011an, ev her sê eyaletên ku bi navê Kurdan hatibûn binavkirin, hebûna xwe domandibûn. Ev her sê eyalet vana ne:

1. Kurdofana Bakur, 2. Kurdofana Başûr, 3. Kurdofana Rojava.

Derheqê navê “Kurdofan”ê de li Sûdanê hin rîwayetên balkêş tên neqil kirin. Li gor vegotinekê Kurdek, ji Wanê tê û li vê herêmê bi cîwar dibe. Ji bo vê yekê xelkê herêmê jê re dibêjin “Kurdo Fanî”. Ev nava dû ra veguheriye “Kurdofan”ê. Li gor vegotineke din, bazirganekî Kurd yê zêran tê herêmê. Di çiyayekî da kaneka zêran dibîne û di vê kanê de gelek xebatkaran dide şixulandin. Dû ra ev xebatkar dixwazin ku ew jî bibin şêrikê zêran û di navbera wan da lec dertê. Di vê lecê de bazirgan, li kendalekê werdibe. Li ser vê xebatkar gazî dikin: “Kurdî fanî, Kurdî fanî!” (Kurd mir, Kurd mir!).

Îcar ji aliyekî din ve, li Sûdanê li herêma Kurdofanê, gundekî dirokî heye ku navê wî gundî “Kurdî” ye. Guman heye ku navê herêma Kurdofanê, ji navê wî gundî hatibe girtin.

Kurd, ji heyama Toran Şah heya roja îro, li Sûdanê hene; lê mixabin hinek ji van Kurdan, digel zimanê xwe, cil û bergên xwe yên netewî, urf û edetên xwe, çandên xwe yên xwarinê, merasimên xwe yên keşî jibîr kirine. Di nava van Kurdên ku kesayetiya xwe wendakirine de, berê Cejna Newrozê jî dihat pîroz kirin; lê îro wê jî nakin.

Nexşeya Sûdanê ya Berî Sala 2011an:

Li gor duristkirinên şeweya birêvebirina Sûdanê ya sala 2011an, dewlet ji 15 eyaletan (herêman) pêk tê. Her sê eyaletên li ser navên Kurdan yên berê, ji holê tên rakirin; li dewsa wan, du eyaletên nuh tên ava kirin. Ev her du eyalet, ev in:

1. Herêma Kurdofana Bakur:

Ev eyalet, ji panzdeh eyaletên Sûdanê yek e. Bi Erebi **شمال كردفان** tê gotin. Rûpîvana herêmê 185,302 km² ye. Li gor hejmartina sala 2006an serjimara wê 2,529,370 kes in. Navenda herêmê, bajarê Ubeyd e. Avhewayê herêmê avhewayê çolê ye. Serjimara bajêr, li gor hejmartina sala 2010an 105 hezar e. Bajarê Ubeydê, di tevgera Muhemmed Ehmedê Mehdî de roleka girîng lîstibû. Ji bo vê yekê gelek şerên ku di navbera her du aliyên de qewimîn, li vê derê hatibûn jiyîn.

2. Herêma Kurdofana Başûr:

Ev eyalet, ji panzdeh eyaletên Sûdanê yek e. Bi Erebi bi şeweya **جنوب كردفان** tê bilêvkirin. Rûpîvana herêmê 158,555 km² ye. Li gor sala 2006 serjimara wê 1,111,859 kes in. Navenda herêmê, bajarê Kadûqliyê ye. Ev bajar, li başûrê Sûdanê, bi qasî 240 km li başûrî bajarê Ubeydê cî digre.

Di roja îro da, li ev herdu Kurdofanan jimareke Kurdan yeke wisa berbiçav tune ye. Wisa xuya dike ku Kurdên van herdu eyaletan, di nava demê de pişifîne. Bes hinekên wan xwe binyad Kurd dizanin, lê çand û ziman û helwestên neteweyî û hwd. li ser wan nemane. Kurdayetî hew li ser paşnavên wan maye. Heke, Kurdên Rojhilata Navîn, bi van Kurdan ra têkiliyên xwe geş bikin, pêkane ku ev Kurdên pişafî, bi eslê xwe bihesin. Kurdên Sûdanê yên ku kesayetiya xwe dizanin, îro zêdetir li Rojavayî

paytext Xurtûmê dijîn. Hinekî wan jî, li rojhilat, li herêma qeraxa Deryaya Sor in.

ÎRO LI SÛDANÊ REWŞA KURDAN

Li gor hin îstatîstîkan li ser rûyê cîhanê nêzî 40 mîlyon Kurd dijîn. Welatên Kurdan li dû Şerê Cîhanê yê Yekem bi destên mêtîngerên Îngilîz û Frensîzan, li gor plan û projeyên mêtîgeriya wan, bû çar-pênc beş. Li ser Kurdên li van beşan heya nuha gelek vekolîn û xebat hatine kirin. Lê mixabin ti kesan heya nuha qala vî welatê Kurdan yê wenda nekiriye.

Li Sûdanê paşerojeka dewlemed a Kurdan heye. Li Sûdanê mêtûya Kurdan, bi destpêkirina desthilatdariya Eyyûbiyan ve, ango 800 salî berî nuha, dest pê kiriye. Mîna ku li jor bi hûrgulî hate şîrovekirin Kurd, di bin femandariya Toran Şahê birayê Selahaddînê Eyyûbî de hatin Sûdanê. Toran Şah, Îbrahîmê Kurdî kir serokê wir û welatê Sûdanê seranser teslîmî van Kurdan kir. Ji bo vî yekê meriv dikane bi awayekî rihet bibêje ku, ji xeynî Kurdîstana li Rojhilata Navîn, di sedsala XIIan de seranser li ser axa Efrîqayê li Sûdanê Kurdîstaneke nuh hatiye avakirin.

Ji sedsala XIIan heya sedsala XIXan kesayetiya Kurdan bi pirranî mixabin hate pişaftin. Kesên ku kanibûn Kurdayetiya xwe biparêzin kêmbûn û mixabin li ser koma Kurdan ya mezin (yên ku hatine pişaftin) çand û şarezaiya ayda Kurdan hate wendakirin; di roja îro da li ser navên Kurdan hew paşnava “el-Kurdî” maye. Jimara Kurdên wiha pir e; lê bêtir paşnavê “el-Kurdî” tiştêkî Kurdayetiyê li ser wan nemaye. Lê, mîna ku em dê li jêr jî qalê bikin, Kurdên ku xwe dizanin jî hene.

Di roja îro da heke tu li Sûdaniyekî bipirsî û bibêjî “Kurd kî ne?” Dê hemû bibêjin ku “*Kurd, eşîreke wisa ye ku hemû mirovên wan wêrek, jêhatî, dijminê neheqiyê, keşdar / dîndar û mîvanhez in.*”

Di Tevgera Mehdîtiyê ya li dijî mêtîngerîya Brîtanyayê de, fermanarê baskê rojhilat yê artêşa vî tevgerê Mîr Dîqne, kesekî Kurd bû. Mîr Dîqne, di

dîroka Sûdanê de, femandarekî wisa ye ku cara pêşî artêşa Brîtanyayê tîk buriye. Taktîkên ku wî li hember artêşa Brîtanyayê pêk dianîn, wekî ders û stratejiyeke şer, demeke dirêj li artêşa Brîtanyayê dihat xwendin. Bi dirêjbûna şer ve Diqneyê Kurd, dîl tê girtin û bi cezayê girtîtiya mûebbetê tê cezakirin. Li dû 17 salan di vî dîltiyê de ev femandarê Kurd yê navdar, diçe dîlovaniya Xwedê.

Tê gotin ku, li dadgehê leşkerekî bêtirs bû û ji Sûdaniyan cudabûna wî li ber çavan bû. Li hember pîrsa “Tu kî yî?” yê bersiva “*Ez Diyarbekrî me û Kurd im!*” daye. Îro li Sûdanê, di kitêba mêtû ya lîseyê de qala vî mîrxasî tê kirin û ew tê pesinandin.

Di roja îro da gelek payeyên girîng yê dewletê, di destên Kurdan de ne. Di vî mijarê de meriv dikane navê Dr. Elî Mihemed el-Kurdî, bilêv bike. Payeya femandariya leşkeriyê di destê Ferîq Rukne de ye ku ew paye, hima li dû payeya wezîrê karê hundir tê.

Her çiqas di destê me de reqemeke rasteqîn tune ye jî, **tê texmînkirin ku îro li Sûdanê derdora 80-100 hezarî Kurd dijîn.** Gelekên wan li rojhilata Sûdanê ne; yanê li herêmeke nêzî Derayaya Sor bi cîh bûne. Malbata herî mezin a Kurd, malbata Hec Elî el-Kurd e û li Qezarîfeyê dijîn. Wê malbatê li



Wêne 4: Îro Li Ser Nexşeya Sûdanê Şûna Kurdofana Başûr û Ya Bakur

vî bajarî, du kûlubên werzişê ava kirine û du heb jî salonên wan yên sînemayê hene.

Li Sûdanê, bi navê Dr. Ebdula Kurdî, di zanîngehê de mamosteyekî mêtûyê heye. Li bajarê Qerazîfeyê, ji aliyê xêrxwazan ve, bi navê “Hecî Elî el-Kurdî”, zanîngehek hatiye avakirin. Lê mixabin ev zanîngeh, a nuha ne faal e û şehitî ye.

Meriv dikane bibêje ku hemû Kurdên Sûdanê dewlemend in; li vî welatî ti Kurdên xizan tune ne. Pêşî firotina avagulan û nargileyan kirine. Navê destgeheka sabûnê “el-Sabûn el-Fabrîqe el-Kurdî” ye. Tê gotin ku yên ku cara ewil, li vir karên çandîniyê kirine jî Kurd in.

Li Sûdanê sê helbestvanên Kurd navdar in:

Yek jê Ebul Hesen el-Kurdî ye. Dîwaneke wî heye ku ji 800-900 rûpelan pêk tê û gelek helbestên li dijî Atetürk dihundirîne. Ev helbestvan, xwe bi Kurdayetîya xwe û bi nevîtiya Selahaddînê Eyyûbî dipesinîne. Navê keçîka xwe “Kurdiye” û navê lawê xwe yî bijîşk jî “Selahaddîn” lêkiriye.

Yek ji wan helbestvanan jî Salîh Ebd Seyyîd el-Kurdî ye.

Yê din jî Abdulqadir Mihemmed el-Kurdî ye; bi xwe sofî ye û zanyarekî ehlê terîqetê ye.

Kurdên Sûdanê hemû Misilman in. Ji Kurdan ne cihû, ne Xiristîyan, ne Êzdî û ne jî Zerdestî hene.⁸

Li gor çavkaniyeke din îro, Kurd li Sûdanê ne li çolan, bi pirranî li bajar û bajarokan dijîn. Bi taybetî ji li bajarê wekî Omdurman, Scala û hawêrdora van ku evan li rojavaya paytext Xurtûmê cî digrin, bicîh bûyî nin. Li van deran derdora 80-100 hezar Kurd dijîn. Ji 3yan 2yê van hem bi Kurdî diaxivin hem jî Aryaniya xwe diparêzin. Kurd, bi taybetî di qada hesinkarî, bazara endustrî de gihaşte û pêşdaçûyî ne. Îro li Sûdanê pêşewatiya endustriyê, di destê Kurdan da ye. Li Sûdanê navê gelek kafeterya, zanîngeh û bazaran bi bêjeya “Kurdî” hatine binavkirin.

Gelek Kurdên ku xwe dizanin, di 21ê Adarê de Newrozê pîroz dikin. Kurdên Sûdanê, di baweriya ji Kurdîstana Bakur û Rojhilat hatinê de ne. Lê diyar e ku di vî warî de belgê di destê kesî de tune ne.⁹

ENCAM

Bi awayekî zelal hate îspatkirin ku Kurd, li Sûdanê hene û xwedî bandoreke girîng in. Kurd, cara pêşî di heyama Eyyûbiyan da, cara duyem

jî di heyama Usmaniyan de (bi hatina Mihemed Eliyê Qawalayiyê Kurd û girêdayiyên wî ve) hatine Sûdanê.

Îro, Kurd di nava gelheyê Sûdanê de beşeka mezin teşkil dikin. Lê gelek ji Kurdên Sûdanê, pişifîne; yên ku kesayetîya xwe ya Kurdî parastine jî hene. Jimara ku Kurdayetîya xwe dizanin, ji 100 hezarî ne zêdetir in.

Li Sûdanê du eyaletan navên xwe ji Kurdan standine: Kurdozana Başûr, Kurdozana Bakur. Li wan herêman Kurd hene lê ji wan hew paşnavên hinekan bi Kurdîtiyê re têdildar maye.

Kurdên Sûdanê bi taybetî di qada hesinkarî, bazirganî û endustriyê de dixebitin.

Digel van tespîtan rasterat, hemû cî û warên Kurdên Sûdanê, hîn rast û durist nehatine tespît kirin. Hin çavkanî piraniya wan li rojhilata Sûdanê nîşan didin, hin çavkanî li rojava nîşan didin; hin çavkanî jimara wan 80 hezar, hin çavkanî 100 hezar nîşan didin. Hinek dibêjin ev Kurd newrozê pîroz dikin, hinek dibêjin pîrozkirina newrozê jibîr kirine.

Belê, wisa xuya dike ku, ji bo agahiyên rast û durist û tîr û tije yên li ser Kurdên Sûdanê pêdivî bi gelek vekolînan, bi taybetî jî vekolînên li ser qadê heye. Ev meqale bila di vî warî de bibe destpêk. Bi hêviya vekolînên nuh û tîr û tije...

Jêrenot:

1 [http://www.ekonomi.gov.tr/upload/a3117418-d8d3-8566-](http://www.ekonomi.gov.tr/upload/a3117418-d8d3-8566-4520985506bae36d/sudan.pdf)

4520985506bae36d/sudan.pdf; <http://tr.wikipedia.org/wiki/Sudan>.

2 Lawê Esîr, *el-Kamîl*, XI, 310-311.

3 Lawê Kesîr, *el-Bîdaye*, XII, 480; Lawê Esîr, *b.n.b.*, XI, 310-311.

4 Bar Hebraeus, *Gregory Abû'l Farac Tarihi*, II, 416.

5 Lawê Kesîr, *b.n.b.*, XII, 482.

6 Bar Hebraeus, *b.n.b.*, II, 416-417.


7 Bar Hebraeus, *b.n.b.*, II, 417.

8 [http://www.basnews.com/tr/News/Details/Sudan-daki-Kurdlerin-](http://www.basnews.com/tr/News/Details/Sudan-daki-Kurdlerin-800-yillik-hik-yesi/15584)

800-yillik-hik-yesi/15584
[http://www.basnews.com/en/News/Details/The-history-of-Kurds-in-](http://www.basnews.com/en/News/Details/The-history-of-Kurds-in-Sudan/15740)

Sudan/15740

9 [http://webcache.googleusercontent.com/search?q=cache:v7Gsbhce](http://webcache.googleusercontent.com/search?q=cache:v7Gsbhce pCkJ:http://shafaaq.com/en/component/content/article/72-sudanese-kurdsq-is-not-a-joke-.html%2Bsudanese+Kurds+is+not+a&safe=active&hl=tr&gbv=2&prmd=ivns&strip=1)
[pCkJ:http://shafaaq.com/en/component/content/article/72-sudanese-](http://shafaaq.com/en/component/content/article/72-sudanese-kurdsq-is-not-a-joke-.html%2Bsudanese+Kurds+is+not+a&safe=active&hl=tr&gbv=2&prmd=ivns&strip=1)
[kurdsq-is-not-a-joke-.html%2Bsudanese+Kurds+is+not+a&safe=activ](http://shafaaq.com/en/component/content/article/72-sudanese-kurdsq-is-not-a-joke-.html%2Bsudanese+Kurds+is+not+a&safe=active&hl=tr&gbv=2&prmd=ivns&strip=1)
[e&hl=tr&gbv=2&prmd=ivns&strip=1](http://shafaaq.com/en/component/content/article/72-sudanese-kurdsq-is-not-a-joke-.html%2Bsudanese+Kurds+is+not+a&safe=active&hl=tr&gbv=2&prmd=ivns&strip=1)



Însan

Meryem ERAY

Însan,
Di her xalê de hezar xal veşartî
Di her nuqutê de derya hinartî
Di her hêstirekê de çem nepenî ye...

Însan,
Ne tenê xwîn û hestî ye
Herwiha tofana 'ewrên hestan
Deriyê kaniya stranan e...

Însan,
Ne tenê **mu'emmayek e**
Herwiha
Mulemma, lem'a û şû'a
Sî, axîn û baweriya heyatê
Bizotê şevên bi şebçeraxan e

Însan,
Erê dilopek ji xwînê
Lê di hundirê xwe de
Gola masiyên gerok
Geremolên **tevlîhev ên** dinyayî
Û 'ewrên tijî baran û berf û zîpikên esmanî ye...

Însan,
Ne tenê li ser lingan e
Muhteremê **berê**
Muhteşemê niha
Muşexxesê jiyana sibehê
Muşterekê girêdayî bi du 'aleman e...
Herwiha...

Ez ê Bi Tena Serê Xwe Bimirim û Bi Tena Serê Xwe Heşir Bibim

Seyfettîn AYKAÇ

Rojekê mirovekî xelqê Mekkeyê hate cem min û ji min re wiha got:

- Mirovek di Mekkeyê de derketiye mîna te dibêje “Ellah pêştir tu Xweda nîne û dibêje, ez qasidê

Ellah im. Min gote wî mirovî;

- Ew ji çi kesan e?
- Ji Qureyşîyan e.¹

Navê min Cundub ê kurê Cenade ye. Kunya min jî **Ebûzer** e. Ji bo ku herkes bi kunya min gazî min kiriye navê min nayê zanîn. Leqeba min jî (Resûlullah ‘eleyhîselam li min kiriye) **Mesîhul Îslam** e. Ez mirovekî serbixwe, gir, rihê min geş û rengê min esmer e. Qebîla me di dewra cahiliyê de rêbir bûn û me rê dibirîn û karwan dişêlandin. Hema em tev eşqiya bûn. Di wê demê de ez pir wêrek û zexim bûm, kesê ku navê min bibihîsta zirav lê diqetiya.

Rojekê Xwedê, riya başbûnê nîşanî min da û min dev ji hemî nebaşîyan berda û min bawerî bi Wî anî, ez beşdarî dinê Henîfan bûm ku wan bi tenê ji Xwedê re ‘îbadet dikirin. Min êdî ji derdora xwe re digot ji pûtan re secde nebin, ew tiştên bê fêyde ne. Heta ez bûme misilman hema min li gorî xwe ji rebbê xwe re ‘îbadet kir, ev heta sê salan domand.

Dema ew mirovê ku ji Mekkê hatibû, wî ew xeber da min Xwedê hezkirina Îslamiyetê xiste qelbê min û min ji birê xwe Uneys re got:²

- Li heywana xwe siwar be û here wê newala hanê! Here û ew kesê ku dibêje “ji min

re ji ‘esîmanan nûçe tê” re xeber bide. Ka çi dibêje baş guhê xwe bidê. Ji bo min di derheqê wî de agahiyan hîn be û ka tu çi hîn bûyî were ji min re bêje.

Birê min Uneys heta Mekkeyê çû. Wî dît û vegeriya, hate cem min. Min jê pirs kir:

- Te çi kir? Ka çi agahî hene li cem te?

Ji min re wiha got:

- Di Mekkeyê de min, mirovek dît ku, digot: “Xwedê ez bi qasidî şandime”
- Gelê wî di derheqê wî de çi dibêjin?
- Şa’ir, Kahîn, Sihêrbaz dibêjin. Bi rastî min gotinê kahînan pir bihîstiye lê belê gotinê wî ne yê kahînan bû. Lê gotinên wî ne helbestin jî. Wellahî ew mirovekî rast e. Miheqeq ew kesên ku tekzîbiya wî dikin derewker in.

Uneys, mirovekî helbestkar bû, ji qesîde û şî’ran fam dikir. Xeberdana xwe wiha domand; “Wellahî kes nikare bêje wî, şa’ir e. Min hemî cûreyên şî’ran nêhêrî ev gotinê ku ewî digot nedişibihî tuyan jî. Wellahî, misoger ew ji rastkeran e.”³ Min ji birê xwe re got:

- Te ji min re nûçekî ku dilê min rihet bike û muşkiliya min bibe neanî. Ez ê bi xwe herim wî bibinîm.

Birê min got:

- Temam, here lê belê xwe ji xelqê Mekkeyê biparêze. Ji bo ku xelqê Mekkeyê pir tehdâ

¹ Îbnî Sa’d, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.223.

² Îbnul Hacer el-Esqelânî, El Îsabe fî Temyîzî Sahabe, b.1, r.252; Îbnî Sa’d, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.222; Tarixul Îslam, Îmam Zehebî, b.2, r.38; Îmam Buxarî, Sehihî Buxarî, b.4, r.158.

³ Îmam Buxarî, Sehihî Buxarî, b.4, r.241; Îmam Muslim, Sahihul Muslim, b.4, r.1924; Îbnî Sa’d, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.220-224; Îbnul Hacer el-Esqelânî, El Îsabe fî Temyîzî Sahabe, b.6, r.100; Ehmed b. Hembel, Musned, b.5, r.174; Tarixul Îslam, Îmam Zehebî, b.2, r.37.

lê dîkin û jê nefret dîkin.⁴

Hema min turîkê nanê xwe û tulimê ava xwe da piştî xwe û ez ketime riya Mekkeyê û çûm. Min Resûlullah ‘eleyhîselam nas nedikir û ez ditirsiyam ku ji yekî jî pîrs bikim. Hema ez çûme cem Mescîdê Herem û min ava zemzemê vexwar û ez di cihê xwe de rûniştim. Heta bû êvar hê roj nequlubîbû ‘Eliyê kurê Ebûtalîb hate cem min û got:

- Her hal tu xerîb î.

Min bersîva wî da:

- Belê ez xerîbim.

Ji min re got:

- De rabe em herin mala me.

Em bi hev re çûne mala wan. Ne ew î ji min tişteke pîrs kir ne jî min jê re tişteke got. Dema bû sibe zû ji bo ku ez pîrsa Resûlullah ‘eleyhîselam ji însanan bikim cardin çûme cem Mescîdê Herem. Lê belê min ji tu kesî tu nûçeyek hilneda. Ew roj cardin ‘Elî hate cem min:

- Hê dema hînbûna cihê wî mirovî nehat?

- Nexêr

- Madem wisa, were em herine mala me.

Dema em gihiştin mala wan ji min pîrskir:

- Tu çi karî dikî? Tu çima hatî vî bajarî?

- Heke tu wê karê min xef bikî û di derheqê karê min de bibî rêberê min ez ê ji te re bêjim.

Dema soz da min. Min jê re wiha got:

- Nûçeya ku gihiştiye min, li van deran zatekderketiye, dibêje ku ez pêxember im! Ji bo ku ez pê re xeber bidim ez hatime van deran.

Li ser vê gotinê ‘Elî ji min re got:

- Te baş kiriye ku tu hatî, ew kes pêxemberê Xwedê ye. Pêxemberê heq e.⁵ Dema bû

⁴ Îbnî Saʿd, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.224; Îmam Buxarî, Sehihî Buxarî, b.4, r.158; Tarixul Îslam, Îmam Zehebî, b.2, r.37

⁵ Îmam Buxarî, Sehihî Buxarî, b.4, r.241; Îmam Muslim, Sahihul Muslim, b.4, r.1924; Îbnul Esîr el-Cezerî, Ūsdul Xabe Fî meʿrifeti Sahabe,

sibê zû tu bide pey min. Dema ji bo te ez ji tişteke tirsîyam ez ê an mîna ku ez pêlavê xwe rast dikim ez ê berê xwe bidim dîwarekî an jî ez ê herwekî desmêja xwe bişkînim bikim. Tu neseke bidome û here.⁶ Dema ez dom bikim û herim tu jî li pey min were û cihê ku ez ketim hundir tu jî bikevê.⁷ Ew çû ez jî çûm. Dawiya dawî ez hatim pêşberî Resûlullah ‘eleyhîselam û min got:

- **Esselamu ‘eleyke ya Resûlallah.**

Piştî rojan ez hîn bûm ku cara ‘ewil min bi selama Îslamê selam daye Resûlullah ‘eleyhîselam. Ji min re got:

- Tu kî yî?

- Ez mirovekî ji zarên Xîfaran im. Ya Muhammed tu mirovan gazî bal çi ve dikî? Resûlullah ‘eleyhîselam:

- Ez gazî bal bawerkirina Wî Xwedayê yek û bêşîrîk, dev ji seneman berdan û bawerkirina bi pêxemberiya min dikim.⁸

- Ji min re behsa Îslamiyetê bike. Ji min re ka ez ê çawa bibim misilman hemî libo libo got. Hema ez li wê derê bûme misilman.⁹ Kêfa Resûlullah ‘eleyhîselam pîr hat. Resûlullah ‘eleyhîselam ji min re got:

- Ya Ebûzer, tu vî karê ji Mekkeyîyan xef bike, vegere here welatê xwe. Li ser wê gotina Resûlullah ‘eleyhîselam min got:

- Ya Resûlullah! Ez dixwazim dîne xwe eşkere bikim.¹⁰ Resûlullah ‘eleyhîselam ji min re:

- Ez ditirsim xelkê Mekkeyê te bikujin.

b.6, r.100.

⁶ Îbnî Saʿd, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.225; Îmam Buxarî, Sehihî Buxarî, b.4, r.159; Îmam Muslim, Sahihul Muslim, b.4, r.1924; Îbnul Esîr el-Cezerî, Ūsdul Xabe Fî meʿrifeti Sahabe, b.6, r.100; Tarixul Îslam, Îmam Zehebî, b.2, r.37.

⁷ Îmam Buxarî, Sehihî Buxarî, b.4, r.159; Îmam Muslim, Sahihul Muslim, b.4, r.1924; M. Asim Köksal, Îslam Tarihi, b.4, r.185-186.

⁸ Îmam Buxarî, Sehihî Buxarî, b.4, r.159; Tarixul Îslam, Îmam Zehebî, b.2, r.168; Îbnî Saʿd, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.225.

⁹ Îmam Buxarî, Sehihî Buxarî, b.4, r.159.

¹⁰ Îbnî Saʿd, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.223; Tarixul Îslam, Îmam Zehebî, b.2, r.170; Îmam Buxarî, Sehihî Buxarî, b.4, r.159.

- Ez sond dixwim bi wî Xwedayê ku te li ser dînê heq pêxember şandiyê ez heta neçim cem Mescîdê Heram di nava wan de Îslamiyeta xwe qîr nekim, lê naxim û naçim.

Dema min wisa got, Resûlullah ‘eleyhîselam dengê xwe nekir û min lêxist û ez çûme cem Mescîdê Heram, Qureyşî hemî devdora hev berhev bibûn û suhbet dikirin. Hema ez wê demê ghiştim Mescîdê Heram û bi dengê bilind:

- Ey Ceme’ata Qureyşîyan! Ez bawerdikim ku Ellah pêştir tu xweda nîne û ez bi bawerim ku Muhammed ‘ebd û pêxemberê Xwedê ye.

Dema min bi dengê zîz wisa qîr kir, muşrîkan:

- Ev mirov rê derketiye, dîn bûye. Rabin rikêfê wî sabiyî bikin. Gotin û rikêfî ser min kirin. Wisa li min xistin, wisa li min xistin tu bêje cihekî min ê bê kulm û bê pehîn nema, hema ez li wê ‘erdê xîz, tîk û dirêj ketim bê rih û can mabûm. Hê jî dilê wan rihet nebibû, wê deme ‘Ebbasê kurê Ebdulmutalîb gihêste min û xwe avête ser min û ji wan re wiha got:
- Kuro lavo hûn dîn bûne, hûn haj xwe nîn in, hûn ê yekî ji qebîla Xîfaran bikûjin. Ma hûn nizanin qefilên me, yên diçin Şamê ser riya Xîfaran re derbas dibin. Gelî cema’ata Qureyşîyan hûn tucar in, riya ticareta we jî ser riya wan e. Dibe ku hûn dixwazin riya xwe ya ticaretê bigrin. Dema wî wisa gote wan, hemî li ser serê min belavbûn û çûn.¹¹

Roja dîtir ez cardin sibê zû çûme bal Mescîdê Heram, ew tiştên duh min gotibûn min cardin dubare kir. Wan jî gotin “Rabin em herin ser wî sebiyî” gotin û rikêfê ser min kirin. Mîna do çi bêjî bi min kirin, hema tu bêje min kuştinê xirabtir kirin. Cardin ‘Ebbasê apê Resûlullah ‘eleyhîselam ghişte me û ji wan re gotinê duh got û ew li ser

11 Îmam Buxarî, Sehihi Buxarî, b.4, r.159-242; Îbnî Sa’d, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.225; Îmam Muslim, Sahihul Muslim, b.4, r.1924; Îbnul Esîr el-Cezerî, Üsdül Xabe Fî me’rifeti Sahabe, b.10, r.59; Îbnul Hacer el-Esqelanî, El İsabe fî Temyîzi Sahabe, c.4, r.63; Îbnî Abdilberr, İstîâb, b. 4, r. 1654.

min rakirin. Ez rabûm çûme cem Resûlullah ‘eleyhîselam. Dema Resûlullah ‘eleyhîselam wî halê min dît, ji min re wiha got:

- Min ji te re negotibû wisa neke?
- Ya Resûlellah! Ev xweziyek bû di dilê min de, min ew daxwaziya xwe pêk anî.

Ez qederekê li cem Resûlullah ‘eleyhîselam mam.¹² Min ji Resûlullah ‘eleyhîselam re got:

- Ya Resûlullah! Tu ji bo min çi ferman dikî, ez çi bikim? Resûlullah ‘eleyhîselam:
- Tu here cem qewmê xwe, heta ku agahi-yek ji min hate cem te tu teblîxa qewmê xwe bike, dema nûçeya derketina me hate cem te, tu were xwe bigihîne me.
- Ya Resûlullah! Ez ê herime cem malbata xwe heta kengê fermana herbê derket ez ê werim cem te.¹³

Ez çûme welatê xwe û min dest bi xebata teblîxê kir. Pêşiyê birê min Uneys piştî piraniya qebîla min bi destûra Rebbê ‘alemê bûne misilman. Dema nûça koçbûyîna Medîne ghişte min, min jî mala xwe da piştî xwe û barkir û ez çûme Medîneyê. Êdî ez jî ji mihaciran bûm. Êdî warê min bibû Medîne. Ez êdî her daîm bi Resûlullah ‘eleyhîselam re bûm. Herba Uhudê, Hendekê û herbên dinê, di hemiyan de... Di fetha Mekkeyê de jî alemdarê qebîla xwe bûm.

Min her daîm ji Resûlullah ‘eleyhîselam re xizmet dikir û dema xizmeta min diqediya ez diçûme mizgeftê. Hema mizgeft bibû mala min û yên wekî min. Hema min piştî xwe dida diwarekî û radizam. Şevê Resûlullah ‘eleyhîselam hate mescîdê, di nava mescîdê de min bi razayî dît û bi piyê xwe min şiyar kir û ji min re wiha got:

- Hey! ez dibînim ku tu razayî!
- Ez ê li kuderê razêm? Ma ji vir pêştir

12 Îmam Buxarî, Sehihi Buxarî, b.4, r.159-242; Îbnî Sa’d, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.225; Îmam Muslim, Sahihul Muslim, b.4, r.1924-1925; Îbnî Abdilberr, İstîâb, b. 4, r. 1654; Îbnul Esîr el-Cezerî, Üsdül Xabe Fî me’rifeti Sahabe, b.6, r.100.

13 Îbnî Sa’d, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.225; Îmam Buxarî, Sehihi Buxarî, b.4, r.159-241,242; Îmam Muslim, Sahihul Muslim, b.4, r.1924; Îbnul Esîr el-Cezerî, Üsdül Xabe Fî me’rifeti Sahabe, b.10, r. 39-b.6, r.100; Îbnî Sa’d, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.222.

malekî min he ye?

Dema min bersîva Resûlullah ‘eleyhîselam wiha da, cem min rûnişt û ji min re wiha got:

- Dema te ji mescîdê derxistin tê çawa bikî?
- Ez ê herime Şamê. Ji bo ku Şam cihê koçberiyê ye, cihê ku mehşerê were raxistin û welatê pêxemberan e.
- Dema te li wir jî derxistin tê çawa bikî?
- Wê çaxê ez ê cardin verim vê mescîdê. Ji bo ku hem wê bibe mescîda min hem jî xaniyê min.

Resûlullah ‘eleyhîselam:

- Dema te ji wir cardin derxin tê çi bikî?
- Wê çaxê ez ê şûrê xwe hildim û heta ez mirim ez ê xwe biparêzim.

Resulullah ‘eleyhîselam bi ‘ewr û bi ken;

- Ez ji te re tiştêkî ji vî tiştî çêtir bêjim! Dema te şandin kuderê tu here wir. Te nefiyê ku derê kirin tu here wir. Heta tu hatî gihiştî min ser wê rewşê be.”¹⁴

Di rêwîtiya (sefera) Tebûkê de dema misilman hemî rêketin çûn, ez jî digel wan ketim rê û em hemî bi hev re çûn. Di rê de hêştira min cihekî şîn dît, çû kete nav û çêriya. Heta wextekê ez li benda wê sekinîm lê belê piştî min kir nekir deva min ji cihê xwe rênêket heta demeke dirêj ez li ber ketim neketim fêde nekir. Ez ji rojekê bêtir li hêviya hêştira xwe mam, min dît ku niyeta hêştira min tune, hema min kelmelê xwe barkir û barê xwe da piştî xwe, bi tena serê xwe ez ketim rê.

Dema min hêştira xwe li pey xwe hişt û min da rê, Resûlullah ‘eleyhîselam û sahabe hema hema riya du roja pêşiya min ketibûn.

Li gorî gotina hevalan; di rê de sahabe dihatin cem Resûlullah ‘eleyhîselam, ew kesên ku nehatibûn beşdarî seferê nebibûn yek bi yek navê wan ji Resûlullah ‘eleyhîselam re digotin. Dema yek bi yek navê wan ji Resûlullah ‘eleyhîselam re digotin Resûlullah ‘eleyhîselam:

- Dev ji wî berdîn heke di wî de xêr hebe Xwedê yê wî bigihêjîne we.

Piştî yekî hat got:

- Ya Resûlellah! Ebûzer jî paşde maye. Resûlullah ‘eleyhîselam:
- Bihêlin heke di wî de jî xêr hebe Xwedê yê wî jî bigihêjîne we, heke xêr tunebe hûn ê jê xilas bin.

Edî kes nedixwiya, yê ku hatibûn gihiştibûn qefilê hatibûn. Resûlullah ‘eleyhîselam li cihekî sekinî û bêhna xwe standin. Sehabiyek hate cem Resûlullah ‘eleyhîselam û jê re wiha got:

- Ji dîr ve, mirovek bipiyan bi tena serê xwe tê. Resûlullah ‘eleyhîselam xwe bi xwe re got:
- Qene ev tu be Ebûzer. Dema ev meriv hinekî din jî nêzîk bû, însanan baş berê xwe danê, dîtin ku ev Ebûzer e.
- Ya Resûlellah Wellahî ev Ebûzer e. Resûlullah ‘eleyhîselam:
- **Xwedê rehma xwe li Ebûzer bike, ew bitena serê xwe birêve diçe, bitena serê xwe wê bimire û wê bi tena serê xwe yê were heşîrkirin.**

Elhemdulîllah min pir tiştên rind û xweş dît û jiyam. Lê min pir zehmetî jî dît ji vê dinyayê. Elhemdulîllah tu wextî qiymet û hezkirina dinê ne kete qelbê min. Nemaze piştî wefata Hz. Ebubekîr êdî ‘eleqa min bi dinayayê ve nemabû. Hema êdî Medîne ji min re teng dihat. Piştî rojan, rabûm min lêxist ez çûme Şamê, ez bi cih bûm.

Di dewra Hz. ‘Usman de êdî misilman dewlemend bibûn û ji xwe re koşk û qonax çêdikirin, ketibûn nava kêf û zewqê. Lê jiyana min ya berê bû, ya dema Resulullah ‘eleyhîselam û Hz. Ebubekîr. Û tu wextî malê dinyayê ji min re xweş nedihat. Ew kesên ku ketibûn nava jiyaneke bi debdebe, min ew hişyar dikirin. Bilxasa Hz. Mu’awiye û ew kesên devdora wî, min pir caran hişyar dikir. Ji bo wan hişyarkirinên min giliyê min li Hz. ‘Usman kirin. Hz. ‘Usman min anî Medîneyê.

Piştî rojan dema ‘asiyan di derheqê

¹⁴ Ehmed b. Hembel, Musned, b.6, r.457; İbnî Sa’d, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.226.

H.z. ‘Usman de çalakî kirin, xwestin ku min jî tevlî wî karî bikin lê belê min ew fersend neda wan. Herkesî dizanî ku ez muxalîfê h.z. ‘Usman im, lê belê tu carî min bêemriya wî nekir, Elhemdulîllah min xwe ji wê fitne û fesadê her daîm bi dûr xist.¹⁵

Di dema xelîfetiya H.z. ‘Usman de min nefiyê Rabzeyê kirin, cihekî nêzikî Medîne bû. Dema êdî Xwedê min da zanîn ku dawîya jiyanê hindik maye min gazî jina xwe û xulamê xwe kir û min wiha gote wan:

- Dema ku ez mirim min bişon û kefen bikin, daynin qeraxê rê û li bendê bisekinin. Hema karwana ku ‘ewil hat ji wê karwanê re bêjin ev Ebûzer e. Hûn êdî tevlê nebin, êdî ew dizanin wê çawa bikin.

Piştî ku ez mirim û gihiştim Rebbê xwe. Piştî min ev xeberdanê hanê hatin gotin û xeberdan dibe ku hemî jî rastbin, lê belê rastiya wî her Xwedê dizane.

Dema h.z. Ebûzer wefat kir wesiya wî pêkanîn. Karwan hat, ji bo ku ji bîr kirin û ji karwanê re negotin ajalên karwanê pê li tabûta wî kirin. Di wê qefîlê de h.z. ‘Ebdullahê kurê Mes’ud hebû, wî pirs kir:

- Ev çi ye? Jê re gotin:
- Cenazê Ebûzer e. Dema wisa gotin ji çavê h.z. ‘Ebdullah hêstir rijîyan û giriya û wiha got:
- Resûlullah ‘elyehîselam di derheqê wî de wiha gotibû, çiqas rast gotiye. **“Xwedê rehma xwe li Ebûzer bike, ew bitena serê xwe birêve dîçe, bitena serê xwe wê bimire û wê bi tena serê xwe were heşirkirin.”** H.z. ‘Ebdullah nimêja wî kir û ew defin kir.¹⁶

Jina H.z. Ebûzer wiha digot: **“Wellahî çawa**

ku xelk dibên; ‘Usman Ebûzer nefiyê Rabzeyê nekir, lê belê H.z. Pêxember ‘elyehîselam ji Ebûzer re ‘Dema xaniyê Medîneyê gihiştin çiyayê Sel’ayê tu ji Medîneyê derkeve.’ Ji bona wê emrê Resûlullah ‘elyehîselam çû.”¹⁷

Di derheqê H.z. Ebûzer de Resûlullah ‘elyehîselam wiha gotiye: **“Yekî mîna Ebûzer rastpeyv ne ‘esîman di binê xwe de sihkir û ne jî ‘erd li ser xwe xweyî kiriye.”**¹⁸

H.z. ‘Elî di derheqê H.z. Ebûzer de wiha gotiye: **“Ebûzer firaqekî tijî ‘ilm bû. Piştî rojan devê wê firaqê baş girêda, heta ew mir jî ji wê firaqê tu tişt derneket.”**¹⁹

Xwedê rehma xwe lê bike û me bide xatirê wî. Amîn.



15 Ashab-ı Kiram, Salih Özbey, r.406.

16 Tarixul İslam, İmam Zehebî, b.3, r.158; İbnî İshaq, İbnî Hîşam, Sîre, b.4, r.133; İbnî Sa'd, et-Tebeqatul Kubra, c.4, r.222.

17 İbnî Sa'd, et-Tebeqatul Kubra, b.4, r.222.

18 M. Asım Köksal, İslam Tarihi, b.1, r. 275-283.

19 Tarixul İslam, İmam Zehebî, b.3, r.1159.

Seyda

Îbrahim MÎRZA

Li ser bîranîna Bedî'uzzeman...

Zeman xerab ez bê te me kulle kewn û kulle hal
Per şkestim ji te dûr im guhan kerr im ziman lal

Aşiqê çavên belek im him nexweşim nîn e hal
Hicret ber te tu xerîbî em dikalin wek xezal

Hesreta dil ez helandim yek himmet şîbhê elif
Dest dirêj ke min xelas ke da bibe qelbim telif

Kengê veger em êtîm in ma nîne j'bo min delîl
Şev herikîn roj diborin tu l'ku yî wechê xelîl

Rake serî'l me binêre ma nîn e j'me re cemal
Kulle wext in ez dinalim el medet şêxê delal

Peyrevê şera Resûl î destegîrê 'asiyan
Dest dirêj ke me xelas ke derveyû hundir 'isyan

El medet ey peyrevê can peyrevê xortê ciwan
Rêberê te dunya terk kir ka bedî'ê ev zeman

Bê te me tev halim xerab feqîr im mecruhê dil
Xwediyê derdek xedar im min çûye heş û 'eqil

Tabê rûhi m ji 'eşqa te ey şêxê murîdên derd
Ger tu neyê wê xerab be cergeya karên ebed

Şêxê delal him şefî'ê gunehê me 'asîyan
Qasidê riya heqîqet melceê me feqîran

Pîvanên Jiyanê

Umer UMÎD

Danîna Ber Hev

Jiyana xwe, bi ya kesî re mede ber hev! Lewra tu, di gerdûne de tek î û bê mînak î. Şert û mercên jiyana te jî hew muhasirî te ne. Ji bo vê yekê, xwe hew bi xwe re muqayese bike...

Darizandin

Ti kes, sedî sed nizane ku, kê di jiyana xwe de, di bin kîjan mercan de, çi kişandiye / jiyaye... Ji bo vê yekê heya ji destê te tê, ti kesî medarizîne!

Paşeroj

Paşeroj, beşeka jiyana me ya li dû me maye ye. Zêde veşartin an jî jê xeyîdîn ne durist e. Bi çêyî û qenciyan, bi xirabî û xeletîyan ve paşeroj ya me ye û ji bo îbretgirtin û dersjêstendinê divê bi awayekî zindî, di bîra me de be û li pêş çavên me be.

Pêşeroj

Pêşeroj, gencineyeke devgirtî ye û li hêviya te ye.

Mîna amadekirina mala bûkê, di jiyana xwe de ciyê xelatên pêşerojê amade bike! Hemû rihêlên xwe hazir bike û bi vî halê xwe ve di pêrgîniya wê de here!

Bi hatina pêşerojê ve tu bikî ku ji hemû diyariyên wê îstifade bikî!

Baldayîna Ser Karê Xwe

Heke te hemû pîvan û wezin kir û tevdîr stand şûnda dest pêkir, divê bala te komî ser vî karê te be. Ji vê astê şûnda tew jî guh mede gotegotên ewareyan!

Dem jî Bijîşk e

Hin derd û kêşe û pirsgirêk hene ku meriv nuha nikanî ji heqên wan derkevî. Ez dibêjim ku yên wisa hewaleyî demê ke. Tê gotin ku dem bijîşkekî baş e.

Heke Tu Rojekê Marûzî/a Bêbextiyan Mayî,

Heke tu rojekê marûzî/a bêbextiyan mayî, tu, tu bî, tew bi hest û dilnên xwe tevnegerî! Û di pêvajoyeke wisa de, ti car dest ji rênîşandayîna êqil bernedî!

Rûkenî

Heya ji destê te we hat, li hember bûyeran rûken bin. Çi kêrdar çi ziyandar, li hember hemû geşedan û rûdanan rûken û gûnxweş bin!

Berpîrs

Berpîrsê/a hemû pejinînên te yên neyînî, bi rastî hew tu yî û nêrîna te ye! Di vî warî de ti kesî suçdar meke! Ji bo pêşilêgirtina wê rewşê, hemû cihazên pêwîst, ji te re hatine diyarî kirin. Bîr meke: Xweşnihêrî û xweşdîtî, xweş dide pejinîn.

Mêjî Êşandin

Divê meriv her dem mêjîyê xwe wisa bi her tiştî re jî neêşîne. Carna bersiv an jî çare, ji ciyekî netê da, an jî di demeke ku meriv jê bê guman e, tîn.

Hatina Aşîtiya Cîhanê

Serdem henin ku, cîhana me dûrî aşîtiyê ye. Her alî bi hev re neyar, her dugel bi hev re dijmin in.

Bê şek û şubhe, heya ku Rojava, venegere ser dilê xwe û heya ku Rojhilat venegere ser heşê xwe, hatina aşîtiyeke gelemparî, ne pêkan e.

Gotin

Meram, divê bi zimanekî zelal û nerm û şîrîn û destyar û eşkere werin vegotin. Bêjeyên ku tu yê di hevokê de bikarbînî, bila rasterast bi merama dilê te re pêwendîdar bin; bila rasterast bibin wergêrên wan daxwazan. Gelek caran, bêjeyên zêde û bi mijarê re ne têkildar, muxatabân aciz dikin û ji mijara girîng dûr dixin.

Meş

Meş, ne bi quretî, bi awayekî dîlnizmî tê kirin. Li gor rewşê, carna zû, carna jî hêdî tê meşîn.

Hin awayên meşê hene ku mirovan gunehkar, hin awayên meşê hene ku mirovan sevabdar dikin. Hin şêwazên meşê hene ku mirovan nêzî armancan dikin, hin şêweyên meşê hene ku mirovan dûrî armancan dixin.

Pirr bûn an jî hindik bûna meşê girîng e. Meş henin di riya Xwedê de, çiqas zêde bin mirovan ewqas sewabdar dikin; di riya şeytên de, çiqas zêde bin, mirovan ewqas gunehkar dikin.

Xwarin

Bes, zikê xwe têr bike, ne ku nefsa xwe!

Zikê birçî têr kirin asan e; lê çavê birçî an jî nefsa birçî têr kirin zor e.

Xwarin, ji bo jiyînê ye; ne ku jiyan ji bo xwarinê ye. Ji bo vê yekê, bi qasî pêdiviya bedena xwe, xwarinê bixwe; ne bi qasî pêdiviya birçîbûna nefsa xwe!

Razan / Raketin

Razan, ji bo vehesîna bedena westiyayî ye; seba zîndebûna bedenê xeweke ewqas dirêj ne lazim e.

Bila neyê jibîrkin ku xewa zêde, hest û dilnê mirovan yên şiyar dikuje û diteffîne!

Lixwekirin

Kincên ku tên li xwe kirin, divê li gor karên ku dê bên kirin, werin hîlbijartin. Lê ji bo çî karî dibin bila bibin, divê hemû paqij bin, divê hemû helal bin!

Dadmend

Dadmend be!

Li ziyana te be jî, di hemû kûlvar û gav û kêlên jiyanê de bila bala te li ser dadmendî û dadweriyê be!

Xêra Mezin / Şerê Biçûk

Li ser riya pêkanîna xêreke mezin, divê meriv li ber şerekî biçûk nesekine. Yan jî, ji bo pêşî lê girtina ziyaneke mezin, pêkhatina şerekî piçûk ewqas ne girîng e.

Ciwanmêrî

Di pêkanîna hemû tevgerên xwe de ciwanmêr / xweşmêr be! Di hemû pêwendiyên te de bila qebetî û quretî bi semta te nekeve!

Tebat

Di kêr de, tebat divê. Di nîvê kêr de terikan-din an jî ji kêr revîn, karê bêpîlanan, bêtebatan û bêbaweran e.

Ew Xwedêyê ku deriyek li te girt, teqeze dê yekî din veke. Dilê xwe rihet bigre, Ew ê xelata te-bata te bide, çî li vî alî çî li wî alî.

Tebat, ne li hember şertên giran serî tewandin e; li hember hemû berbest û mercan, bê navber meşîn û bi rê ve birina têkoşînê ye.

Li Ku Dibî Bibe Wezîfa Te

Li ku dibî bibe, jibîr meke ku bi hemû ziman û kirinên xwe ve divê tu, hîmê nezanî, zordarî û bêbaweriyê hilweşînî.

Bila ji te, her dem bîhna xawenê, bîhna dadmendiyê û ya dîlnizmiyê were!

Xweşbînî

Li jiyanê bi xweşbînî nihêrîn, di jiyanê de bi xweşbînî fikirîn, wesfeke bala ye.

Bawerî

Meriv bi çî bawer dike bila bike, ne ji bo mefa û berjewendiyê, divê rast û durist û bi dilekî safî pê bawer bike.

Tevgerîna bi Terbiye

Çi kar dibe bila bibe, li ku derê dibe bila bibe, di hemû kirinên xwe de heddê xwe bizanibe û bi terbiye tevbigere!...

Kêmanî

Ji bo mirovan kêmaniya herî mezin, ji kêmaniyên xwe haydarnebûn e.

Ku Hat bi Te Sekinî

Heke rojekê te dît ku dîwarên li dor Quranê şehitîn, bê şek û şubhe, bi her hêlê ve û bi her beşên bedena xwe ve, tu xwe li dor wê Peyxama Pîroz bike dîwar!

Li derdora xwe parêzgehên ji xawên û zanistiyê çêke. Tu, ji xwe bihurîyî, ew parêzgeh jî jixwebihuriyan dixwazin.

Cîhanê li dû xwe bihêle û tevî hevalên mîna xwe be û bibe parêzvanê wan parêzgehan û bibe niştecîyên wan deveran!

Li Hember Pêkhatinan, Helwest û Vegotinên Bawermendên Rasteqîn

Li hember dayîna nîmetan dibêjin “elhemdûlillâh”

Li hember hunerên li ser gerdûnê dibêjin “Subhanellâh”

Çaxa ku xeletiyên dîkin, dibêjin “estaxfurûllâh”

Dema ku dikevin tengiyê dibêjin “Hesbûnallâh”

Dema ku hemû tevdîrên xwe standin dibêjin “tewekeltû elellâh”

Li hember mercên giran dibêjin “La hewle wela quwwete îlla billâh”

Di dema dûçarbûna mûsîbetan de dibêjin “Înna lillâhî we îinna îleyhî racîûn”

Li Xwe Mikûr Hatîn

Ji xapandinên şeytên yeka girîng ev e ku, nahêle meriv li çewtiyên xwe mikûr were. Hal ev ku, îtrafkirina çewtiyan, rê li pêşiya nefsê girtin e... Bala bûyîn an jî paqij bûyîna ruh e.

Ji vê xirabîr jî ew e ku, nefs bibe abûqat û çewtiyên xwe mîna parêzeran piparêze. Herhal, di dinyayê de mirovê herî bê siûd ev e.

Geffarê mîhrîban bîleheq negotiyê “Duaya we tune be, çi qîmeta we heye?”

Bext

Bext, babetekî agahiyê ye. Mîna ku tê zanîn agahî, bi xuyayê / numayê ve girêdayî ye. Yanê, dê çawa bibe, wisa jî hatiye zanîn. Berevacî, xuyaya sirûştî li gor agahiyê naşekile.

Yanê destûrên agahiyê; di xala di derva da bi rê ve birina xuya/numayê nakin.

Yanê Zanyar, bi balazanîna xwe ve pêşeroj dîtiye û bext nivîsiye; ne ku vîna mirov mecbûrî kirinê kiriye.

Ev fermana Femandêr jî, vê rastiyê nîşan dide:

“*Me bexta her kesî, bi hewldana wan va girêdaye*” (Îsra, 13)

Ey yên ku dixwazin rastiyê fehm bikin! Bextreşî jî, bextyarî jî, bi dereceya hewldana mirovan va girêdayî ye.

Perwerde

Çi kar dibe bila bibe, heke pergala we xweş biçe, lêçûnên / mesrefên perwerdeyê zêde bikin!

Na heke pergala karên we ber bi nexweş bûnê / xirab bûnê ve biçe, lêçûnên / mesrefên perwerdeyê derxînin du qatan!

Ji bo Rojêke bi Xêr û Bereket,

Divê mirov, her sibe bi awayekî erênî dest bi jiyanê bike.

Xêrê û xweşiyê daxwaz û temennî bike.

Wek mînak,

bi dengekî xweş xwendina an jî guhdarî kirina Quranê, dikane ji roja xwe re bike destpêk.

An jî digel tesbîhateke tîr û tije bi edakirineke nimêjeke ji dîl, dikane dest bi sibê bike.

Gerçî xwendina çend rûpel ji rastiya baweriyê jî heman tiştî pêktîne.

Bi endamên malê û yên kar re, bi awayekî rûken û dilxweş tevbigere.

Diayên Çawa?

Mirov, li dewsa diayên devkî, ji xwe û derdora xwe re yên helwestî bike, gelo dê hîn zêdetir nêzî pejirandinê nebe?

Can Tefiya Êdî Nema

Melik TAHA

*Em bi cahê te xelas bin ey nebî
Ruh û canê me fîda canê te bî*

(Bateyî)

perçeyek ji dilê 'îşqê bûm
bûme kevîr
çîrokek serê çiyê bûm
ketim xwar
derman nema

parîkek ji wê sêwrê bûm
bûme hevîr
haveyn nema

arvanê hestên wî bûm
teşt qulupî
herikî av
tiyên parsekiyê li rê
avahî nema

min dilek hîlanî hilnehat
pêşiyê kenîya
seqema sibehê lê da
vemirî paşê
'hişk bû
'ewrên wê bar kirin
hêviyên şînhatî qurmiçîn
tebat nema

kesat e îro hemiyet
fanûsa 'îşqê bi xwê ye
ziwa bûme ji dilînan
bê êş dikelin xem
bablîsok bê rawestan min difirkînin
tirs jî nema

çîroka 'îşqê wefiya
rijîya xweliya wê
moxila wê ziwa bû
hûr hûr qeliya
dendik dendik heliya
can tefiya
hêsir nema

li rastê maye rastî
xwediyên rastiyê nema
sibat e lê xeyîdîne 'ewr
bereket wenda ye
xêr û ber nema

Xwedaya!
di rengên însanan de mirî
di laşên mirovan de herî
digindirin
her der bi 'ewrên herbê hûnandî
mirovahî di bin lingan de sayî
heya nema
edep nema

Pira Xudaferînê

Ahmet DEMİR

Di mêtû de ji aliyê Kurdan ve gelek dewlet hatine damezirandin. Yek ji van dewletan Dewleta Şeddadî (948-1200) ye. Ev dewlet, li Qafqasyayê bi destê Mihemmed lawê Şeddad ve hatiye ava kirin. Navendên wê Dowîn, Gence û Anî bûn.

Dewleta Şeddadiyan digel ji aliyê kirinên wan yê siyâsî û leşkerî, mixabin ji aliyê avakeriya wan a mîmarî ve jî zêdetir nehatine vekolînkirin. Li ser mêtûya wan a siyâsî di sala 2010an da li Zanîngeha Yüzüncüyılê ji aliyê me ve, bi navê “Şeddadîler Tarihi”, bi Turkî, xebatê hatibû kirin. Ev xebata li ser Şeddadiyan, bi qasî ku tê zanîn, di vê qadê de li Turkiyeyê xebata ewilî bû.

Di amadekirina “Şeddadîler Tarihi”yê de hate dîtin ku Şeddadiyan qîmetê mezî dane avadaniyê û di vê qadê jî mizgefta bigre heya hemaman, ji serayan bigre heya pîran, gelek berhemên giranbiha ava kirine.¹

Ji wan avahiyên şaheser yek jî, Pira Xudaferînê ye. Ev pira ji aliyê şeddadiyan ve hatiye çêkirin. Di vê nivîsê de dê li ser vê pira Şeddadiyan were sekinandin.

Nav Girtina Pirê

Li ser binavkirina vê pirayê tiştekî nesnel di destê me de tune ye. Ligel vê rastiyê divê were gotin ku, ji aliyê gelên wê herêmê ve navê pira Xudaferînê, bi menqîbeyan tê şîrove kirin. Di vî warî gelek tiştên gotin; lê em dê ji vana hew sisêyan binivîsin.

1. Li ser nav li pira Xudaferînê kirinê vegotinek, ev e:

Li gor vê vegotina, ava çemê Erezê pir bû û

bi şîp bû. Çaxa ku hosteyan nigên / lingên pirê di nêv ava Erezê de datanîn, ji şênbûna avê, heya sibê hemû nig, dişehetîn. Carekê, du caran, sê caran, heman tişt pêkdihatin. Her ceribîn bi encamê neyînî diqediya. Li ser vê yekê, rojekê çel (40) kesên mumîn tên vira; li qeraxa çem nimêj dîkin û li ber Xwedê digerin. Li ser vê yekê, bi awayekî mûcîzewî ava Erezê disekine û heya demekê peng dide. Di vê navberê de, ji neherikîna avê sût tê wergirtin û nigên pirê tên daçikandin û pira bi asayî tê ava kirin. Piştî qedandina avakirina pirê, ava Erezê cardin dest bi herikîna dike. Yê ku vê mûcîzeyê dibînin dibêjin “Aferîn ji karê Xwedê ra!” Ji vê gotinê jî “Xwedê Aferîn!” dimîne. Ev hevoka spasîyê di devê gel de veguheriye navê “Xwedaferîn”ê.

2. Li ser, bi nav kirina pira Xudaferînê, vegotinek di nav gel de ya din ev e:

Li ser ciyê pirê, bi aliyê jor ve, du peykerên ji kevîran hebûn; navên wan peykeran, “Xûdû” û “Aferîn” bû. Peykerê Xûdû, di şiklê mêran de bû; yê Aferîn di şiklê jinan de bû. Peykerê Xûdû, li keviya bakurê Erezê bû, Peykerê Aferîn li qeraxa başûrê Erezê bû. Li gor vê şîroveyê, pira Şeddadiyan navê xwe, ji van her du peykeran standiye û bûye “Xudaferîn.”²

3. Li gor vegotinekê din, jiber ku ava Erezê şên û bi şîp bû, qeraxên xwe vediroşt; bi vê veroşkirinê ve binê zinaran, vala ma û bi demê re, ew zinar ketin nav avê; nigên pirê jî, li ser van kevîran hatin danîn. Jiber ku Xwedê bi xistina van zinaran û li ser wan, îmkana avakirina nigên pirê da, şênîyê li wir bi hev ra gotin “Aferîn ji Xwedê re!” û ev nava, bi herikîna demê re, veguherî bûjeya “Xudaferîn”ê.



Sedema Avabûna Pira Xudaferîne

Li gor V. Mînorsky pira Xudaferîne, ji bo danûstandina bazirganî ya di navbera gelên başûr û bakurê Erezê de hatibû ava kirin û di wê demê de di vî warî de roleke girîng dilîst.³ Mîna ku tê zanîn riya hevrişmê, di Sedema Navîn de, ji bo pêwendiyên aborî yên gelên Asya û Ewropayê pirr girîng bû. Di vê mijarê de gelek mêjûvanên Ezerî jî mîna Mînorsky difikirin.

Îcar li gor hin vekolîner M. Altman, ev pira ji sedemên aborî zêdetir, bi armancên leşkerî hatiye çêkirin. Xêra avabûna vê pirê, leşkeri sewk kirina ji her du aliyên, hêsan bû û parastina welêt rewşeke têkûz qezenc kir. Peywendiyên başûrê Erezê û bakurê Erezê, xêra vê pirê durist û geş û domdar bû. Ev pira Şeddadiyan, li Rojhilatê Nêz û ya Navîn, di nav pirên herî mezin de tê jimartin.

Li aliyekî din, li hember kêşe derxistina Rewadiyan, divê Şeddadiyan tevdi bistan; her çiqas zext û zordayîneke mezin a Şeddadiyan li ser

vê dewletê ne dibû jî, Fadlûn, ji aliyê standina pêşgiriyan de, di paştî nedima.⁴

Şûna Pirê

Pira Xudaferîne, li ser çemê Erezê hatiye ava kirin; îro di navbera du dewletan de cî digere; aliyekî pirê li ser axa Îranê ye, yê din li ser axa Azerbeyganê ye; ev pira, herêmen Qerebax (herêmeka Azerbeyganê ye) û Qerejdaxê (herêmeka Îranê ye) bi hev ve girêdide.⁵ Li gor Nuzhetu'l Qulûbê (r.84), navê herêmeka Qerejdaxê, Gîlana Fadlûn bû û ev herêm ji 50 gundan pêk dihat.⁶ Jiber ku çemê Erezê îro di navbera Îran û Azerbeyganê de derbas dibe, mevkîya pira Xudaferîne, raste rast li ser sînor dimîne.⁷

Pira Xudaferîne, îro ji aliyê Îranê ve li ser qada bajarê Kalîbarê ye; ji aliyê Azerbeyganê ve jî pira li ser qada bajarê Xudaferîne ye. Wekî wê were texmîn kirin bajarê Xudaferîne, navê xwe jî vê pira dîrokî standiye. Îcar, bajarê Xudaferîn û

derdora wê, di herêma Cebraîlê ya Azerbeyganê de cî digrin.⁸

Di navbera sedsalên XI-XIIan de ev pira, li ser xaka Şeddadiyan bû û hew di navbera erdên Şeddadiyan yê li rojhilat û rojavayê Erezê da cî digirt û him ji bo gelên herdu rexên çem çûnhatineke asayî verast dikir, him jî di navbera her du rexan de peywendiyên bazirganî geş dikir.⁹

Wê demê li ser Erezê derbazoka herî bi ewle pira Xudaferînê bû. Li cihê ku pir hatiye ava kirin, çemê Erezê pir fireh dibe; di nava avê dê gomeyên bêtar hene. Ji xwe, her nîgekî pirê, li ser wan gomeyên ku di nav avê de ne, hatine lêkirin.¹⁰

Di Çavkaniyan de Qalbûyîna Pira Xudaferînê

Her çiqas, kitabeyên li ser vê pirê ne gihîştine roja îro jî, di derheqê avabûn û avakerên pirê de em xwediyê agahiyên pêbawer in.

Mêjûvanê ku cara ewil qala vê pirê dike Hemdullahê Mustewfiyê Qazwînî ye; di kitêba xwe ya Nuzhetu'l Qulûbê de li ser pira Xudaferînê disekine.

Mêjûvanê duyem yê ku qala vê pirê dike, Ehmed lawê Lutfûllah yê Munecîmbaşî ye; di pirtûkên xwe yê nav bi *Sehaifu'l Exbar* û *Camiu'd-Duwelê* de, bi destê serwerê Şeddadiyan Fadrûn lawê Muhammed ve, di sala 418 / 1027-8an de ava kirina pira Xudaferînê vedibêje.

Mêjûvanê sêyem yê ku li ser vê pirê disekine, vekolînerê Rûs V. Minorsky ye. Di roja îro da vekolînerên mîna Kemal Balkan û Osman Sümer jî derheqê pira Xudaferînê de agahiyên girîng didin.¹¹


Dîroka Avabûna Pirê

Li gor hin xebatan, li nêzî şûna pira Xudaferînê, pireke din hebû ku û dîroka ava bûna wê pirê, di nav heyamên entîk de digihîya Împaratoriya Axemeniyan. Lêbelê wisa xuya di-kiye ku wexta Misilmanên Erebbên Azerbayganê,

ev pira hilweşiyabû û ji holê rabûbû.

Li binya vê pirê, li cîhekî ji cîhê pira kevn musaîdtir, rasterast li ser riya ku ji aliyê başûr ve tê, pira deh derî hat çêkirin.¹²

Ji çavkaniyên pêbawer tê fehmkirin ku pira ku îro li ser piyan e, di sala 418 / 1027-8an (hin xebat vê tarîxê wekî 421/1030 nîşan didin ku bi gumaneke mezin xelet e) de hatiye çêkirin. Ev pira, di heyama xwe de pirayeke mezin û zexm bû. Yê ku ev pira ava kiriye, ji serwerê Şeddadiyan Fadrûn lawê Mihemmed lawê Şeddad e. Ev Serwer, bi navê Fadrûnê Duyem tê naskirin. Di sala 375/985an de bi zorê bû hukumdar. Di demeke kin de, bi rêvebirîyeke xweş, xwe bi xelkê da hezkirin û pejirandin. Li pişt 47 salan şûnda di sala



422/1031î de vefat kir.¹³

Ev pira Şeddadiyan her çiqas di heyama Axa Mihemmed Şah Qaçar de, di sefera wî ya bi ser Azerbeyganê ve de hinekî hilweşiya jî, dû re hate venuhkirin / restorekirin. Axa Mihemmed Şah, di navbera 1742-1797an da li îranê şahiya xanedana Qaçaran kir. Vî şahî, di sala 1794an da, dawî li Xanedana Zendên Kurd (1750-1794) yê şahên Îranê anî û Serweriya Qaçaran (1794-1925) ava kir.¹⁴

Hinekî li dûra pira Xudaferînê ya Şeddadiyan, pirake din jî heye ku ew jî bi navê Xudaferîne tê naskirin; lêbelê ev pira ne ya Şeddadiyan e; ji aliyê Êlxaniyan ve di sedsala XIII. de hatiye ava kirin; îro hew sê deriyên wê mane. Ev pira, bi qasî 750 metroyan e û li rojhilata pira Xudaferînê cî digre.¹⁵

Pîvanên Pira Xudaferînê

Pira Xudaferînê bi mîmariyeke bê mînak hatiye çêkirin. Pira Xudaferînê, ji aliyê dirêjbûnê ve du sed (200) metro ye; firehiya wê çar metro nîv (4.50) e. Ji avê bilindbûna pirê nêzî donzdeh (12) metroyan e. Berê pirayê, bi aliyê rojhilat û rojava va ye. Îro panzdeh (15) deriyên pirê yên ku xuya dikin hene. Heke li ser avahiya pirê kolîneke berfireh a zanistî were kirin, guman heye ku li herdu seriyan jî deriyên di bin axê da—ger hebin—dê derkevin holê.¹⁶

Ev pira li ser zinarên sirûştî hatiye ava kirin. Pirraniya vê pirê, gihîştîye roja îro. Bi qasî ku pir tê dîtin û ji avahiya pirê tê fehmkirin, avahî ji keviran hatiye çêkirin. Lê di kemberan de li dewsa keviran, tûxle hatine bikaranîn.¹⁷ Dema meriv li pirê dinihêre, nigên kemberan, ji aliyê çûyîna avê ve bi plana sêgoşe hatine çêkirin; heman nig, ji aliyê hatina avê ve di şeweya avqelaşên gilover de ne.¹⁸

Di roja îro da di çêkirina van kemberan da, ti aheng xûya nakin; bibêje pîvana hima her derî û kembera wê bir pîvaneke serbixwe ye. Dema ku meriv bi awayekî baldarî li pirê dinihêre, dibîne ku pir, li gor şertên zemîn yên sirûştî hatiye ava kirin. Di binê her nîgekî pirê de zinarekî sirûştî dixuye. Yanê avakerê pirê, firehiya navbera nigên pirê, li gor firehiya navbera van zinaran eyar kiriye. Ji bo

vê yekê di navbera firehiya deriyên pirê de ahengeke bi pîvan tune ye.¹⁹

Nava du kemberan ji aliyê firehbûn û bilindbûnê ve, ji nava kemberên din firehtir in; ji aliyê bilindbûnê de jî, ev her du derî ji bilindbûna deriyên din bilindtir in. Hemû kemberên Xudaferînê di formên kembertûjik de ne. Ji bo van taybetmendîyan meriv vê pirê, di nav pirên rêxûzî bijmêre, xelet nabe.²⁰

Li ser pirê, bi her du aliyan ve, caxên ku ji keviran hatine çêkirin, balê dîkşînin.²¹ Li gor xêzkirina R. Serhad Rzaev, di orteya pirê de, deriyekî bala hebû. Bi gumaneke mezin ev derî çiyê qontrolkeran bû û ji bo qontrol kirina rêwiyên ku di ser pirê re derbas dibûn hatibû avakirin. Îro, li ser pirê, deriyekî bi caxên hesinî devgirtî xuya dike jî, ti qimeta wê ya dîrokî tune; armanca çêkirina vî derî, ji bo parastina pirê ye û di ser pirê re, pêşî li derbasbûna mirovan an jî heywanan girtin e.

Encam

Pira Xudaferînê, berhemeka Dewleta Şeddadiyan a giranbûha ye. Ev pira, gîhaye heyama me û îro li ser piyan e. Li ser çemê Erezê, bi armanca geş kirina danûstandina her du rexan hatiye çêkirin. Derheqê nav li pirê kirinê de, vegotinên ji hev cuda hene. Pir, di dema serweriya Fadlûn de, di sala 1027an de ava bûye. Ji panzdeh deriyan



pêk tê. Jiber ku nigên pirê li ser zinarên di nav avê de hatine çêkirin, di navbera pîvanên derîyan de, ti aheng tune ne. Her çi qas kitabeyên pirê negihîştine destên me jî, hebûna pirê û agahiyên di çavkaniyan da, rê li ber vekolîneran vedike. Ji bo domandina hebûna pira Xudaferînê, divê restorasyoneke cîddî were kirin.



Jêrenot:

1 Derheqê Şeddadiyan de ji bo agahiyên berfireh bnr.: Ahmet Demir, Şeddadîler Tarihi, (Zanîngeha Yüzüncüyılê, Fakulteya Îlahiyatê, Enstîtuya Agahiyên Civakî, Makeagahiya Mêjûya Îslamê, Semînera Lîsansa Bilind a Neweşandî), Wan, 2010; Heman mêjûvan, "I. Ebu'l Esvar Şavur Döneminde Şeddadî-Bizans İlişkiler", *II. Uluslararası Aras Havzası Sempozyumu*, (Ed.: Oktay Belli), Erzurum, 2012, 357-371. Digel van xebatan bnr.: René Grousset, *Başlangıcından 1071'e Ermenilerin Tarihi*, İstanbul, 2006; Marie Félicité Brosset, *Gürcistan Tarihi*, (Wergêr: Hrand D. Andreasyan), Ankara, 2003.

2 Muhammed Alipur Mukaddem, "Xudaferin Bölgesinde Çarşamba ve Bayram Debleri", *II. Uluslararası Aras Havzası Sempozyumu*, (Ed.: Oktay Belli), Erzurum, 2012, 193-194.

3 V. Minorsky, *Studies in the Caucasian History*, London, 1953, 44-45.

4 Elbrus İsayev, "Araz Çayı Üzerinde İpek Yoluna Hizmet Eden Köprü ve Bere Geçitler", *II. Uluslararası Aras Havzası Sempozyumu*, (Ed.: Oktay Belli), Erzurum, 2012, 170.

5 Minorsky, *Studies in the Caucasian History*, 44-45.

6 Hamdullah el-Müstevfî, *Nuzhetu'l Qulûb*, (Weşanger: Debîrê Siyakî), Tehran, 1336, 84.

7 Mukaddem, "Xudaferin Bölgesinde Çarşamba ve Bayram Debleri", 193.

8 Mukaddem, "Xudaferin Bölgesinde Çarşamba ve Bayram Debleri", 193; Zekai Erdal, "Büyük Selçuklular Öncesi Kafkaslardaki Beylikler: Şeddadiler", *V. Uluslararası Van Gölü Havzası Sempozyumu*, (Ed.: Oktay Belli), İstanbul, 2010, 133.

9 Demir, Şeddadîler Tarihi, 10.

10 İsayev, "Araz Çayı Üzerinde İpek Yoluna Hizmet Eden Köprü ve Bere Geçitler", 170.

11 Hemdullahê Mustewfîyê Qazwînî, *Târîh-i Güzide*, (Weşangêr: Abdu'l-Hüseyn Nevâ'î), Tahran, 1362; Ehmed Lawê Lutfüllah yê Muneccîmbaşî, *Sahaîfu'l-Exbar Fî Vaqayi'ü'l-A'sar*, Matbaa-i Amîre, İstebol, 1285; İsayev, "Araz Çayı Üzerinde İpek Yoluna Hizmet Eden Köprü ve Bere Geçitler", 170; Erdal, "Büyük Selçuklular Öncesi Kafkaslardaki Beylikler: Şeddadiler", 133.

12 İsayev, "Araz Çayı Üzerinde İpek Yoluna Hizmet Eden Köprü ve Bere Geçitler", 170.

13 Demir, Şeddadîler, 8-11.

14 <http://www.azeribalasi.com/showthread.php/75771-Eski-k%C3%B6pr%C3%BCler>, lê nihêrîn, 15.04.2013; http://tr.wikipedia.org/wiki/A%C4%9Fa_Muhammed_Han_Ka%C3%A7ar, lê nihêrîn, 15.04.2013; <http://sabuncu-mks.az/328-xudafyrin-kgprgsg.html>, lê nihêrîn, 30.04.2013.

15 İsayev, "Araz Çayı Üzerinde İpek Yoluna Hizmet Eden Köprü ve Bere Geçitler", 170; <http://www.azeribalasi.com/showthread.php/75771-Eski-k%C3%B6pr%C3%BCler>, lê nihêrîn, 15.04.2013.

16 İsayev, "Araz Çayı Üzerinde İpek Yoluna Hizmet Eden Köprü ve Bere Geçitler", 170; Mukaddem, "Xudaferin Bölgesinde Çarşamba ve Bayram Debleri", 193; Erdal, "Büyük Selçuklular Öncesi Kafkaslardaki Beylikler: Şeddadiler", 133.

17 <http://sabuncu-mks.az/328-xudafyrin-kgprgsg.html>, lê nihêrîn, 30.04.2013.

18 Erdal, "Büyük Selçuklular Öncesi Kafkaslardaki Beylikler: Şeddadiler", 133.

19 <http://sabuncu-mks.az/328-xudafyrin-kgprgsg.html>, lê nihêrîn, 30.04.2013.

20 Erdal, "Büyük Selçuklular Öncesi Kafkaslardaki Beylikler: Şeddadiler", 133.

21 Erdal, "Büyük Selçuklular Öncesi Kafkaslardaki Beylikler: Şeddadiler", 133.

Astengên Li Ber Zûpêşketina Nivîsandina Kurdî

E. Semed

*Ger dê hebûya me jî xwidanek
Alîkeremek, letîfedanek*

*Ilm û hiner û kemal û iz'an
Şî'ir û xezel û kitab û dîwan*

*Ev cins biba li ba wî me'mûl
Ev neqd biba li nik wî meqbûl*

*Min dê 'elema kelamê mewzûn
'Alî bikira li banê gerdûn*

Ehmedê Xanî

Ziman alaveke herî xurt a surîştî ye ku têkiliyên nêvbeyna mirovan pêktîne. Ziman dezgeheke komelî ye; hem kom û komîçkan digehîne hevdû û hem jî li hemberî pişaftinan diparêze. Bêguman ji stûnên ku milletan dihêlin ser piyan yek jî ziman e.

Ziman ji bo peywendiyên di neqeba mirovan de arîkariyê dike û di têkiliyên civakî de her dem tê bikaranîn. Mirov ji dayîkbûnê û pêve hêdî hêdî di'elime zimanî. Tu kes di roj û salên serî de nikare bi axîfe. Zarok di nêv civakê de, ji dorûberê xwe hînî axaftinê dibe. Ango, ziman bi rêya hînbûnê tê bidestxistin. Hînbûna zimanî hem bi destê civakê hem bi destê perwerdeyê çêdibe.

Ziman parçeyeke ji xwebûniya (ezîfî) mirovî ye û jê nayê veqetandin. Bi saya zimanî mirov dikare zanîn, tecrube, fikr û ramanên xwe pêşkêşî mirovên di bike. Ziman û hizir pêkve girêdayî ne; mirov bi zimanî hizir dike û dijî. Peresîna zimanî girêdayî peresîna hizirê ye. Ramanên bingeha şaristanîyê bi saya zimanî peşveçûnên mayînde peyda kirine.

Mijara me derbarê astengên li ber zûpêşketina nivîsandina kurdî ye. Di vî welatî de kengê mijar bibe kurdî hingê asteng jî hema mezin dibin, rê li ber mirov dibe kortûçal, dorûber dibin kendûkosp.

Di serê vê nivîsarê de min viya hinek xetereyên mezin ên li ber zimanê kurdî jêkvekim. Baweriya min ew e ku heke zimanê kurdî yekcar nebe zimanê jiyanê nikare bigihe asteka payeberz.

Nivîsandina kurdî xebateke pîroz e û bi fedekariya keda şexsî roj bi roj pêşve diçe. Rêbaz û standartên zimanê kurdî tene raçandin û bingehên kurdîyê tene mismidkirin.

Digel van xebatên pîroz ez giringiyê didim bikaranîna zimanî ya di jiyanê rojane de. Mîheng ev e; gelo sal û sal nisbeta axaftina kurdî kêmtir dibe an zêde dibe? Nemaze di nêv zarokan de axaftina nisbeta vî zimanê nestêle çî ye? Kurdiyê nû çêdibin yan na?

Angaşt min ew e ku heta yekser zimanê perwerdeyê nebe kurdî zimanê jiyanê nabe kurdî. Vêca, ew zimanê di jiyanê de neyê bikaranîn û axaftinê dê nêzikî mirinê bibe.

Kurdîtiya part-time:

Belê, me di serî de jî gotîbû; ziman alaveka herî xurt a jiyanê komelî ye. Herwiha di jiyanê komelî de bê ziman jiyan nabe. Ziman jî bi axaftinê xwe nîşan dide. Bi destê axaftinê ziman heyîna xwe didomîne û serdeyî nîfşên dahatû dike. Ew zimanê ku axaftinê pê çenebe wê zimanê mirî hesab bikin û jê re fathekê bixwînin.

Di van salên paşiyê de em dibînîn ku axaftina bi zimanê kurdî gelek kêr bûye. Hinek mirov dikarin baxifin, hinek dikarin hem baxifin hem binivîsin, hinek jî hema têdigihin.

Yê baxife dikare zimanî serdeyî nîfşê nû bike.

Yê tenê fêmbike nikare zimanî serdeyî nîfşê nû bike.

Piştî vê tespîtê de ka em lê binêrin di jiyana me ya rojane de çiqas axaftina kurdî heye:

24 saetên rojê hene. Serê sibê em taştê dixwin û berê xwe didin karê xwe û mekteba xwe. Di nava rojê de hemî kar û xebat û xwendinên xwe bi zimanê serdest, tirkî, dikin. Perwerde, xwendin, nivîsandin, axaftin, guhdêrin, sohbet hemî bi tirkî ye.

Zarok û jin li malê bi heval û cîranan re têkiliyên bi tirkî saz dikin, rêzefilm û xêzefilmên bi tirkî temaşe dikin. Êvarî gava tu hatî malê bi zarok û hevsera xwe re bi çî zimanî diaxifi? Hizr bike; di jiyana rojane ya te û malbata te de çiqas kurdî axaftin heye? Heke em 24 saetên rojê bijmêrin, belkî “part-time” kurdî jî dest me nakeve. Bi vî awayî dê kurdî çawa xwe serdeyî nîfşên nû bike? Nebêje ma ne zarokên min kurdî fêmdikin. Ew kesê nekare baxife wê nekare bibe ragir û hilgirê zimanî.

Em gelek paşve neçin; ji sala 1980 ê û pê ve heta îro, eşkereye ku sal bi sal axaftina bi zimanê kurdî kêr dibe. Di van 30 salan de xwe-windakirin û pişavftineke ‘ecêb çêbûye. Sedemên vê pişafînê cûre cûre ne. Koçberbûna ber bi bajaran ve û lêzêdebûna mekteb û televîzyonan lez daye pişafînê.

Qey em hemî nabînîn ku sal bi sal nisbeta axaftina kurdî kêr dibe? Bi hesabeke hêsanî; di sala 1980 ê de ji hezar zarokên 7 salî çendan bi kurdî diaxafîn, dîsa, - ji berekê ve - di salên 1990, 2000, 2010 an de ji hezar zarokên 7 salî çend zarok dikarin bi kurdî baxifin? Ez texmîn dikim; hêzên ewlehî û îstîxbaratê îstatîstîkên kurdîaxêvan kit bi

kit digrin û raporên girêdidin. Rêvebirên dewletê derbarê şape û lehiya pişafînê de ji me baştir xwedî agahî ne.

Ha kurdolojî ha arkeolojî:

Van salên paşiyê derbarê zimanê kurdî de hinek gavên girîng tên avêtin. Ew berf û qeşa ya stûra li ser zimanê kurdî hêdî hêdî dihele. Hêviya me ew e ku tu asteng li ber zimanê kurdî nemîne. Lêbelê heta zimanê kurdî nebe zimanê perwerdeyê ev gavên di ji sembolîkbûnê zêdetir kêrî tiştekê nayê.

Hezar mirovên binavûdeng û karşinasên zimanê kurdî hebin û lêkolînan li ser zimanê kurdî bikin û hinek berhemên giranbiha binin meydanê, bi van xebatan dê mirov kêfxweş û dilgeş bibe. Bi van xebatan pêkane kurdî di warê nivîsandinê de pêşve biçê û zimanê nivîsandinê ber bi standartbûnê ve biçê. Her çî dibe bila bibe, divê xebat û lêkolînen li ser zimanê kurdî kêr nebin û pêwiste bi her awayî xebat û lêkolîn bi-domin. Lêbelê ya girîngtir ew e ku ev xebat rê li ber zimanî veke da ku di her aliyê jiyanê de bête bikaranîn. Heke ziman nebe zimanê jiyanê mixabin tu girîngiya van xebatan jî namîne. Hingê em dikarin bibêjin; ha kurdolojî ha arkeolojî. Weke tê zanîn; arkeolojî beşeke zanistê ye ku lêkolînan li ser şûnwaran dike. Derbarê war û şaristanîyên kevnar de agahiyên peyda dikin. Qaf û qolên ji binê axê tên derxistin di mûzeyan de radixin berçavan. Carinan agahiyên di lêkolînen arkeolojîk de hatin destxistin dibine mijarên kovar û pirtûkan. Tîrsa min ew e ku heke kurdî nebe zimanê jiyan û deshilatîyê dê ferqa kurdolojîyê û arkeolojîyê nemîne. Milyonan ferdên vî milletî hene û çênabe bi van gavên qels hêdî bibin.

Zimanê bazar û ticaretê:

Carinan em dibihîzin ku hinek dibêjin; ger zimanê kurdî nebe zimanê bazar û ticaretê ne pêkane pêşve biçê. Ev angaşt ji milekî ve rast be jî ji milekî digêr ve şaşîyeke hima em xwe lê digrin.

Tecrûbeyên jiyana civakî li mirov dide nîşan ku bazar û ticaret bi serê xwe tenê nikare bibe



sedemê pêşketina zimanekî. Ji bo mijar çêtir bête fêmkirin em ê zimanê inglîzî daynin ber çavên xwe: Zimanê inglîzî di seranserê cîhanê de heta tu bejî bi qedr û qîmet e. Yekî zimanê inglîzî bizane di her karî de du-sê gavan di pêşiya hevalên xwe de ye. Jixwe li Tirkîyê jî dibistana seretayî bigre heta lisansa bilind û doktorayê dersên zimanê inglîzî tête xwendin û tevlêbûniya her xwendekarî bi vî zimanî re çêdibe. Digel vê rasteqîniyê, gelo mirov dikare bibêje zimanê inglîzî di vî welatî de pêşve çûye û di qada jiyanê de cihek mezin girtiye? Belkî mirov dikare bibêje hima inglîziya hinek mirovan pêşve çûye. Lewra jiyan û deshilatî û rêveberî bi zimanê tirkî ye û her gav tirkî tê bikaranîn.

Bi qena'eta min, bazar û ticaret li ser zimanî bandoreka gelemperî çênake. Di hengama vebûna TRT6'ê de gelek mirovan xwe avêtin pêş û gotin em jî kurdî dizanîn. Bivê nevê kurdî piçekê bi qedr û qîmet ket. Lêbelê kurdîaxêvên nû çênebûn, belkî kurdiya hinek mirovan pêşvetir çû.

Zimanê helbestan û zimanê metn û pexşayan:

Zimanê helbestan zimanê dil û hestên mirovî ne. Helbest rasterast ji cegerê mirov derdikeve. Helbest ne li bin bandora tu kes û tu ramanan de ye. Helbest hinek caran tercûmanê kul û derdê dilê mirovî ye, hinek caran tercûmanê şadî û dilxweşiya dilê mirovî ye. Di helbestên dilînî de behra hiş û fikrê gelek kême e. Ji ber vê çendê mirov dibîne ku zimanê helbestan bi xwerû kurdî ye. Şêwe û dirûvên raçandina hevok û malikên helbestan kurdiya di dile mirov de diyar dike.

Berevajiyê helbestan, metn û pexşe di mejiyê mirovî de dikemile û diseride. Pexşe kar û hûnerê eqil û mejî ye. Di vî karî de perwerde û zanîn, hîzr û fikr, ray û raman, tecrûbe û serpêhatî hemî cih digrin da ku pexşeyeka liberketî bê meydanê.

Lêbelê, zanîna me, perwerdeya me, ray û ramanên me bi çî zimanî çêbûyî be wê ew ziman xwe di nivîsandina pexşeyê re bide der. Em kes xwe hirvelûve nadin, hişê me di bin bandora tirkî

de ye. Ustad Bedîûzzeman dibêje: “ewil bi erebî tê dilê min, bi kurdî tê hişê min û bi tirkî dinivîsim.” Îro ev formûl ji me re serûbin bûye. Lewra em bi tirkî difikirin û bi kurdî dinivîsin. Vêca, hevokên me xwar û vîç, kurdiya me kelî û rijî, metnên me bêserûber xwe didin der. Gelek caran ji bilî xweyê nivîsarê kes di jê fêmnake. Zimanê metnê çiqas ji hizr û fikrên zimanê biyanî azad be dê ewqas menfî’et û feydeyî bide zimanê me.

Astengên li ber nivîsandinê

Me li jorê got; heta ziman nebe zimanê jiyana rojane dê ev ziman pêşve neçe. Jibo zimanê jiyane jî gerek perwerde û rêveberî û deshilatî bi zimanê kurdî be.

Dema zimanê jiyane yekser bibe kurdî, bivênevêye, nivîsandina kurdî jî yê pêşve biçe.

Hinek tişt ne li destê mirovî ye û nika-re şert û mercên dinyayê li gorî viyana xwe pêk bîne. Îro em nikarin zimanê deshilatî û rêveberî bikin kurdî. Daxwaziya me heye jî lêbelê zimanê perwerdeyê ne kurdî ye. Digel van astengiyan jî çênabe mirov dest ji daxwazî û kar û xebatên xwe berde.

Kesê bivê kurdiya xwe pêşve bibe û di milê nivîsandina kurdîyê de bibe xwedîyê gotinê ji beriya her tiştî divê kurdîperwer be. Di her karî de hezkirin û daxwaziya ji dil, mirovî digehîne serfiraziyê.

Divê mirov xewn û xeyalên xwe, hiş û hizrê xwe bike kurdî. Hizirkirina bi kurdî, axaftina bi kurdî, xwendin û nivîsandina bi kurdî dê jiyaneke kurdewarî peyda bike. Pêwist e, heta ji destê mirov tê, bi dost û hevalên xwe re, bi xweyî û xwedanên xwe re bi kurdî baxife.

Hayî ji kurdiya her deverê hebe. Bi çavekî neyînî nefekire kurdî û devoka deverên dî. Devok û şeweya herkesî lê xweş û şîrîn e. Bizane ku li her deverên welêt bêje û têgînên xweser û orijînal hene. Ya giring ew e ku mirov bikare ji van bêjeyan xwedî behr bibe. Jixwe her bêje û axaftin deriyên zanîne li ber mirovî vedike. Her kelîme û

bêje heçvegu zanîn û hîkmeta mirov ya windabûyî ye, divê mirov kom bike û lê xwedî derkeve.

Eşkereye ku, me hemiyan perwerdeya xwe bi zimanê biyanî kiriye. Zanîna me ya zanistî, têgînên em pê hizrên xwe dikin, mixabin, tirkî ye. Gava em dest bi nivîsandina kurdî dikin ev rasteqîn derdikeve pêşiya me û dibe asteng. Karê nivîskarî zor û zehmet dibe, herwekî di nav berfa zivistanê de lê bigere da ku bihareke biheştin ava bike. Weya di akwaryûmê de masiyan xwedî bike, yan jî di bin camçadirên serayan de bax û bostanan biçîne.

Nivîskarê zimanê kurdî divê xwedîyê zanîneke rast û durist be da ku bikare mijarê bide fêmkirin. Piştî vê pileyê divê kurdiyeke zelal û paqij bikar bîne. Jixwe di vê hindê re astengên mezin derdikeve. Lewra zanîn, tehsîl, perwerde, têgîn hemî bi tirkî hatine peyda kirin. Çawa me li jor jî gotibû, hiş û hizrê mirovî ne kurdî be dê nivîsa mirovî ji kurdiya zelal dûr bikeve. Ya ez dibînim ev pîrsgirêk li ber hemî nivîskaran astengan derdixe. Belkî gelek caran nivîskarî ji nivîsandinê sar û sist dike.

Her çi dibe bila bibe, çiqas neyar û asteng hebin bila hebin dîsa jî çênabe mirov dest ji kar û xebatê berde. Mirovê xemê ji kare xwe bixwe dê serfiraz bibe. Divê her nivîskar weke şairê meşhur Fîrdewsî mîsyonekê li xwe bar bike. Di Şahnameyê de dibêje:

Di van sih salan de bizêdeyî bûm rencîde

Di taliyê de bi vê farsiyê min ‘ecem kire zînde

Hêdî namirim, ez zindî me,

Tovê gotinê min reşandiye.

Her kesê xwedî hiş û ray û dîn,

Piştî mirina min bêjin aferîn.

Helbesta Wenda Ya Duyem Ya Evdirrehîmê Hekkarî:

Lorya Welat

A. Aqîl MÎHACÎR

Evdirrehîmê Hekkarî (Zapsû) helbestvanekî Kurd e. Gelek helbestên wî hene ku ji wana gelek jî wenda nin. Di jimara 14an a kovara Nûpeldeyê de helbesteka wî ya wendayî –ku navê wê “*Eşqa Welat*” bû- hate weşandin.

Di vê jimarê de jî em dê helbesteka wî ya wenda ya din, bi we re par ve bikin. Navê vê helbestê “*Lorya Welat*” e. Ev helbest, di malpera Rûdawê de hatiye nîşan dayîn. Lê li wir di transkrîbê de hin xeletî û çewtî hebûn.

Li gor agahiyan, Evdirrehîm Zapsû, ev helbesta xwe ya ku 93 salan berî nuha nivîsiye, di kovara helbestan “*Gaziya Welat*” de weşandiye. Kovar di sala 1921ê de hatiye çapkirin û bi temamî ji helbestên Evdirrehîmê Hekarî pêk tê.

Ev nusxeya Gaziya Welat li Qonyayê, di mizgeftekê de hate dîtin. Metna helbestê ji aliyê me ve cardî hat saxtîkirin û ji nuh ve hate transkrîbe kirin. Him berga kovarê û him jî rûpela ku helbest li ser hatiye nivîsîn, li jêr hatiye nîşandayîn. Bi halê xwe yî ji xelet xwendinan hatiye paqijkirin, helbest ev e:

LORYA WELAT

Istran

Lorî lorî welat lorî

Dijmin hatin ketine dorî

Wê diklûn ji te ra gorî

De lorî lorî bêkes lorî

Lorî dikim ji bi hêvî

Mindal piçûk bûyîne kêvî

Qe nizanin mayîne sêwî

De lorî lorî welat lorî

Birîndar e xew lê nayê

Li ber mirinê ketiye tayê

Mindal piçûk neyne hayê

De lorî lorî bêkes lorî

Şîrî li me ‘aza neke

Singa xwe ber Xwedê veke

Nifiran bike, du’ayan meke

De lorî lorî welat lorî

Du Çîrokên Bizirî

Sidîq GORÎCAN

ku vebêjim du çîrokan
du çîrokên mîrate yên rondikên kelegirîna xwe
ku îro roj du caran ji dilê min
pengizîn li nav çav û hinarikên min,
divê roniya rojê vekêşe bin ewrekî reş
divê hemû robar biqerisin di gêravên xwe de
divê hemû ziman li laliyê biqelibin
û hemû teyr ji mirazê xwe bin;
carekê helepçeyî bû
ku awaz û wêneyên xwînziwa şîneke giran li min vedan
carekê jî kelepçeyî bû
ku çeng û lingên min li min hatin badan...

du caran bizirîm îro roj
yek kîmyewî bû ku reng û dirûva wê ne xef e
nayê gotin a dî
ku her dem li min veşarî û gef e...

adar16, 2014wan

Temrînên Şevê

M. Zahir ERTEKÎN

Şeb ta bi seher, seher heta şeb
Farix ne dibû ji zikrê Ya reb!
Ehmedê Xanî

Temrîna Yekem

Îro em di nava gencîneyeke bêhempa de li gencîneyan digerin. Di her berhemeke me de bihatirîn bi sedan pîvanên jiyanê veşartî ne, lê em li derve li welatên bê'edalet li xwe û li hin nîrxên nejime/wiyalî digerin. Xatirnezaniya me ya çandî, hunerî û şaristanî me bi dû xatirnezanan xistiye. Me şibaka bîra xwe li ber şoqa fanosa destan vekiriye. Îja mirovê dilêş û ji rewşê nerazî, (weke min û te) geh xwe li qelemê sor dike, geh pala xwe dide êvaran û geh di şevên asûde de li xwe digere. Li dengê xwe digere. Li evîna xwe digere. Li qedera xwe digere. Li welatê xwe digere. Ji rojên qerebalix xwe dike mêvanê şevan. Ji dengên beradayî xwe dispêre sukûnet û suhbeta şevan. Li xwe godarî dike. Li gerdûnê godarî dike. Ku hêz û qewetê di xwe de bibîne li Xwediyê gerdûnê godarî dike û bi vî awayî hundirê xwe hinne dike. Reng û boyaxa kirasê xwe nûtir dike. Lewra dizane ku di şevan de hindiktir dibin guneh. Lewra di şevan de tarîtiya dinyayê xwe bera ser xetayên mirovahiyê dide, qe nebe li ber çavan, li ber guhan û li ber pozan xeletî xuya nabin. Şev bi vî awayî gelekî watedar û giranbiha nin. Gelek mirovên balaqamet bi serketftinên xwe deyndarê şevê ne.

Temrîna Duyem

Fîraq, êşên meriv di şevan de dikewîne. Dema ku deng jî mîna dinyayê kirasê sukûnetê li xwe dike, dilên hişyar dest bi kelînan dikin. Dilên kel di vê demê de radibine reqsê. Roj li şevan û şev li rojan dizivirin. Êvar fanûsa şevan e, dide çavên vekirî. Xew jî dawiya pîlê çava û ji şevan îstîfa kirin e. Ev demeke wisa ye ku, mirovên ku ji xew radibin an mirovên xew li wan diherimin û radibin nikarin têbighîjin. Lewra şev bi kesên ku bi wê nahesin, nahese. Şev himbêza xwe ji dilxwazên xwe re ve-

dike. Tenê ji wan re. Lewra yên ku kezaba xwe bi êşên rojan de nekiribin birîn, nikarin di şevan de derman bimeyînin. Yên ku ji dewr û zemanê nexeyîde û bi tenêtiyê razî nebe, şev dê çî ji wan ke. Yên bêhna şevê bi ser giyana xwe daneke, nikare êşên xwe bi bayê seherên şevê bikewîne. Hal e şev. Ehwal e şev. Ji bo aramiyê efsûneke bêhempa ye şev. Feryadresî ye ji bo feryadkêşan. Weke ku Melayî Cizîrî jî dibêje;



“Şev bû di nêv çeşmên me da hetta beşîr mizgîn we da
Dê bê seher şahê geda feryad ji destê firqetê”

Dinya şevtarî ye û heta ku mizgînî xwe ji xwediyê xwe bigihîne çavên me, wê temennaya me her li ber dengê seherê be. Firqet jî di nav de, tevde nexweşiyên di xwe de derman dike, şev.

Temrîna Sêyem

Êvar ji bo gelaleya xwendinê demeke neqane ye. Şev jî ji bo nivîsîne... Şev wargeha dilên xembar e. Rêveçûna rêyên dûr û dirêj e. Dema ku ji hewcedaran re hembêza xwe vedike weke taviya baranê bicoş e. Bi adan û bibereket e. Bêhnên nuwaze yên sibehan, tenê diyariya xwediyê pozên ku qedrê şevan dizane ne. Lewra mirovê ku şev, bi mirîftî derbas kiribe, nikare xwe bigihîne vê bêhnê. Hin kes di şevan de tenê deriyê xewnan li xwe vedikin. Hin jî hilmên xewnên xwe jî bi xwe re dibin û diyariyê şevê dikin. Çav û hiş, vekirî xewnên xwe dijîn. Ji kerwana mehebbetê xwe dispêrin roniya şevê. Devê hestên qenc vedikin û li rewhaniyeta xwe vedigerin. Lewra kolanên şevê tev ê wan in. Lewra roj tenê ji bo şiyariya wan amade dibe û li hêviya xwedanvînan heta destê sibehê cihoka? xwe ya hestdar û reweqdar vekirî dihêle. Ew roja ku bi şev di dilê wan de disincire, di sehera sibehê de xwe ji temamê cihanê re diyarî dike. Tew belkî roj bi xêra van ruhên şevalûd dubare dinyayê li xwe dike sibe.

Temrîna Çarem

Şev çima xweş e? Giyanên biyanî û giyanên nenûranî vedikişin û ji holê wenda dibin, loma. Durûtî û muzurtî dikeve xewê, loma. Dest û piyên şer û şeytaniyê dikeve ber, loma. Jiyan tenê bi asûdegî û bi rehnumayî li rastê, ji dilê rasteqîn re dimîne, loma. Ji bo rêşasiyên di rojê de hatine kirin, deriyê kûrahiya atmosfera hêviyê vedibe, loma... loma... loma...

Heyhat!. Ez van xetikên westiyayî jî di şeveke wiha bihadar de dinivîsim. Di vê şeva hanê de bi hêviya hêşnahiya şaxeke nûpeldayê hewl didim, li ber xwe didim û xwe radigihînim dîrokê. Dîrok baskê xwe li ber min vedike. Pênûs tê nutq û kalamê. Ê ez ji hevalê xwe re bi nameyên betilî bersîvan vedikolim.

Ji bo qedrê xebatên biqedr, di şevan de Per-to Begê Hekkarî dawî li kalamê aniye.

Şevê rewşen ji enwara tecella

Mubarektir ji sed nûrojê xerra

Yanê dibêje ku bila şeveke te ya ku xwe neynika xwe li hember tecelliyatan vekiribe hebe û bila bi vî awayî ronahiya tecellaya Wî li dor canê te bigire, bixêrtir û bimbarektir e ji sed rojên te yên mirî. Ew çavên hêvîdar ên ku di şevan de naqerimin helbet dê tecellayan bidestxin û wê bereketa şevê ji ezmanan hilweşînin.

Temrîna Pêncem

Di despêka şevê de geremola rojê berde-wam e. Her ku diçe ji rojê û ji teşqeleyên rojê azad dibe şev. Mîna masiyekî ku xwe bera behreke kûr de, her ku bi binî ve diçe, rengê behre gewretir dibe. Behr, her ku diçe masî ber bi sînorên xwe yî bêsînor ve dikêşe. Aramiyê dide. Wisa jî şev dema ku kûr dibe tarîtiya xwe jî zeximtir dike. Ji bo istirahetê jî reweqtiyê dibe. Her ku kûr dibe hestên însanan jî ji gil û gişiyê bi dûr dixê. Dawiya şevê baştirîn û guncavtirîn beşa şevê ye. Him jî ev dem nêzikî şeveqê ye jî. Loma jî rehman di vê demê de limêja sibehê xuluqandiyê. Ji bo ku bi pakî were edakirin û jê bête îstîfadekirin. Ji bo tameke bê guneh jê were standin. Limêja sibê ku dema wê ji nava şevê de derketiye, herçiqas bi rik'etên xwe hindik be jî, bi fêdeyên xwe ji gelek nimêjan bêtir hatiye pesindayîn.

Herçend di dilekî de aramî hebe şev jî roj jî roj e jê re. Lewra em dizanin gelek însanên mezin ji bo tefekkure şikeftên ji însan û mijûliya dinyayê dûr hildijartine. Bi piranî di şevan de tefekkura xwe kûrtir kirine. Bi vî awayî teziya nefsa xwe, kamiliya sincên xwe, aramiya dilên xwe bilind kirine. Îja di roja me de ev derfetên şikeftayî pir ne pêkan û pir ne hêsan in. Loma jî di nava bajarekî mezin de mirov dikare mala xwe di şevan de bike şikefteke uzletê. Qe nebe di demeke bijarte ya şevê de...

Temrîna Şeşem

Li kaşan û ji kaşan betilîm, min derxîne ser textê eywana xwe. Min bibe ber paceyeke henîf û li kêleka rasteqînê deyne. Bila ev îskeîskên min nebin qeder, nebin mohr ji min re. Bila nebe dijmin dizên dilê min. Bila ev xîyalên dirêj û serserî nebîne rê ji min re, ey şev...

Deste xwe dirêj dikim, şev e...

Zimanê xwe davêjimê, şev e...

Rihê xwe dirêj dikim, şev ê... were û min ji şevê azad bike.

Kemaneke min î dîl, neyeke min î şkestî û hêstirên min î şolî diherikin henin. Bêhesab xwedan xeta û sûc im. Ji bo van gunehên dîwarî baranek tavî divê. Dem diherike. Wext kêr dibe. Ji bo herkesî ji bo min jî lêdide sa'et. Destekî hovane ji şeş hêla ve bi min vedide, min dikêşe û dike mîna xwe. Ditirsim. Wekî Seydayê Bateyî dibêjim:

*"Nê ji me sûc û xeta tên û sîtem
Lê ji te îhsan û xufran û kerem"*

Di her deqîqeya vê şeve de, janên 'esrî li bin giyanê min dikevin. Nikarim xwe ji bin vî barî bilind bikim. Dipelçiqim. Ji ber ku gul wenda dibe, şev e. Îskeîskên min bi ser şevê de dibarin. Şev jî xwe diçe.

Dest û gotinên min ji serma diricifin.

Serma ye ji ber 'eyba gunehan. Berê min bide riya rast...

Dixwazim ji xortaniya xwe ya ku dişibe şevê, koçî îxtiyariya xwe ya ku dişibe rojê bikim. Bi her 'eza û endamên xwe yên menewî vê dixwazim. Tevî ku belawela me jî...

Ba dîkin dest û lingên min... diricifin.

Dîliya bi tiştan, bila êdî xilas bibe. Min azad ke ji şevê...

Temrîna Heftem

Bêguman di xuliqandina erd û asîmanan de,

di guherîna şev û rojê de,

di keştiyên ku ji bo feydeya însanan li ser deryayê dikişin de,

di barana ku Xwedê ji asîmanan dibarîne û erda hişk ji nû vedijîne de,

di her cûreyên jîndarên ku li ser ruyê erdê belav bûne de,

di tevgera ba û ewrên fermanber ên di navbera erd û asîmanan de, helbet ji bo qewmekî birewer re nîşan û delîl hene. (Qur'an-2/164)



Nirxandina Qismê Kurmancî ya Kitêba Dersa Kurdî ya Hilbijartî ya Pola 5.

Zafer AÇAR¹

Ev xebat ji bo kitêba dersa kurdî ya hilbijartî ya pola 5. binirxîne hatiye kirin ku ev kitêb ji aliyê Wezaretê Perwerdehî ya Neteweyî ve ji bo sala xwendinê ya 2012-2013'an hatiye amadekirin. Armanca vê xebatê ew e ku qismê kurmancî ya kitêba navborî unîte bi unîte ji aliyê naverok, dîtbarî, ziman û vegotinê ve binirxîne û bi nêrîneke rexnegir lê bikole.

Destpêk

Di dîroka Komara Tirkîyê de ev cara pêşîn e ku di xwenderên Tirkîyê yê fermî yê navendî û lîseyê de kurdî wekî dersa hilbijartî dê bikaribe cî bigre û di sala xwendinê ya 2012-2013'an de di polên 5. de tê dan. Piştî ku sîstema çarsalî(4+4+4) ya xwendina pêşîya zanîngehê hate pejirandin riya dersên hilbijartî jî vebûn ku, çarê pêşîn ne tede, di herdu çarên din de îmkana hilbijartina dersên nû jî vebû. Ev dersên hilbijartî yê cur bi cur yê ku ji pola 5'an heta ya 12'an li gorî qada xwe dikarin bên hilbijartin di serê sala xwendinê ya 2012-2013'an de di xwenderên navendî û lîseyan de hatin diyarkirin. Herwiha ev ders li ser daxwaza xwendevanan bi riya daxwaznameyan hate diyarkirin û ji bo vekirina derseke hilbijartî şertê, 'herî kêr deh daxwazname' hat danîn. Di vê sala xwendinê ya 2012-2013'an de di nav dersên hilbijartî de di bin navê 'Ziman û Zaraveyên Zindî/Yaşayan Diller ve Lehçeler' de kurdî(kurmancî-zazakî) jî wekî dersa hilbijartî cî

¹ Mamosteyê Xwendera Seretayî, Xwendevanê Lîsansa Bilind a Bitez a Ziman û Edebiyata Kurdî ya Zanîngeha Bîngol'ê

girt û bi şiklê di heftê de du saet hat diyarkirin.

Ji bo hînkirina zimanekî helbet di heftê de du saet têrê nake û ders jî wekî dersa hilbijartî nikare bibe dermanê birînên zimanê gel an neteweyekê. Ji bo ku gelek zimanê xwe hîn be, bixwîne, pê binivîse û hîn bike divê ji zarokmalê heta zanîngehê di hemû xwenderan de wekî mecbûrî zimanê xwe bixwîne, pê perwerde bibe û bikaribe pê hemû karan bike. Herçiqas dersa kurdî ya hilbijartî têrê neke jî ji bo destpêkê dê bibe nimûne û tecrubeyek û hêvî heye ku dê bibe pireke kurt a ku digihije perwerdehiya serzimanî.

Piştî ku dersa kurdî ya hilbijartî hat vekirin mufredat û bernameya wê jî hat amadekirin û kitêba wê jî bi destûra Wezaretê Perwerdehî ji aliyê komeke pîspor ve hat amadekirin. Ev kitêba ku bûye mijara xebata me ji gelek aliyan ve girîng e, lewre ev kitêb dê bibe xebateke yekgirtî, serastker û dê bibe çavkaniyeke zimanê kurdî.

Em ê jî di vê xebata xwe de qismê kurmancî ya vê kitêbê ji aliyê naverok, dîtbarî, ziman û vegotinê ve binirxînin, kêmasiyên ku me dîtine nîşan bikin û pêşniyarên xwe pêşkeş bikin.

Kitêba Dersa Kurdî ya Hilbijartî ya Pola 5. wekî dualî hatiye amadekirin. Aliyekî wê ji bo zaraveyê kurmancî aliyekî wê jî ji bo zaraveyê zazakî hatiye amadekirin. Herdu alî jî ji 140 rûpelan pêk tên û di dawîya wan de ferhengok û çavkanî hene. Xebata me dê li ser qismê kurmancî be.

Kitêb bi giştî ji bo hînkirina zimanekî û ji bo asta pola 5. lêhatî ye lê belê kitêb bi giştî li ser hînkirina ziman û nasandina wî sekiniye. Metnên xwendinê kêm in û kitêb zêdetir xîtabî kurdîzanan dike. Wêne, xêzkarî û rengandin başe û li gorî zarokan e. Wêneyên wê ji ber ku xêzekî/karîkaturîk in bala zarokan dîkşîne û li gorî temenê wan e jî. Dîsa pûntoya nivîsan li gorî zarokan e. Unîte û mijarên unîteyan li gorî jiyana zarokan e. Zimanê wê

û kêş e lê di rûpela 21'an de di bikaranîna pêveka dema borî de 'dê' hatiye tercîhkirin ku li gorî me ev pêvek li her derê, bi xweser jî di ciyên ku axaftinê giran dike de, neyê bikaranîn dê baştir be. Li şûna 'Ez dê ji te re...' 'Ez ê ji te re...' hêsantir e. Bikaranîna 'dê'yê di ciyên cuda de dîsa bi heman awayî hatiye bikaranîn ku cî hat em ê li ser bisekinin. Di rûpela 22'an di mijara hejmaran de, di hejmarên navbera 10 û 20'an de nivîsandina tîpa 'h'yê axaftin û jimartinê giran dike. Ji ber ku di axaftinê de jî ev tîp nayê gotin di nivîsandinê de jî neyê nîşankirin dê baştir be. Jixwe nenivîsandina wê jî tevliheviyekê çênake. Dîsa di vê unîteyê de di rûpela 24. de nivîsandina navê du ajelan wekî 'kîso' û 'jîjo' derbas dibe ku li gorî me wekî 'kûsi' û 'jûji' bînin nivîsandin çêtir e. Çendî li gorî dever û herêmên cuda yên Kurdistanê ev ajel xwediyê navên cuda bin an jî xwediyê bilêvkirinên cuda bin jî di diyarkirina navên wiha de divê li berbelaviya wî û hêsaniya bilêvkirina wî bê nêrîn.



û vegotin li gorî asta zarokan e lê di hin mînakên de dijiwariya bikaranîna zimên vegotinê jî qels dike. Di kitêbê de hevyeckirin, danberhev, rêbaza 'pîrs-berşiv'ê, çalakîyên nivîsandinê, ferhengok beşên bikêr in. Lê niha em unîte bi unîte li kitêbê binihêrin.

Qismê kurmancî ji 9 Unîteyan pêk tê. Unîteya 1. bi sernavê 'Alfabeya Me' ye û bi hevnaşînê dest pê dike. Paşê alfabeya kurdî, tîpên hûrdek û girdek, pevdeng, bêje û hejmar bi mînakên hatine nîşankirin. Rengandin û dîtbariya wê baş e. Zimanê wê hêsan

Unîteya 2. 'Ez û malbata Xwe' ye. Di unîteya 2. de rengandin li gorî asta zarokan e û bi wêneyên xweşik hatiye dagirtin. Zimanê wê xweş e lê di rûpela 30'an û 36'an de peyva 'xwendîngeh'ê hatiye bikaranîn ku di wateya 'dibistan'ê de ye. Lê em li şûna van bêjeyan bêjeya 'xwender'ê pêşniyar dikin ku di wateya 'derê xwendinê' yan jî 'ciyê ku xwendin jê dertê' de dika-re bê fêmkirin. Dîsa di rûpela 32'an de li şûna 'ez dê biçim' de 'ez ê biçim' hêsantir e. Dîsa di rûpela 36'an de di nivîsandina navên polan de dabir bihata bikaranîn dê baştir bûya. Yanî wekî '4-A'yê de', '5-B'yê de'.

Di unîteya kitêbê ya 3. de ku navê wê: 'Xwendîngeh û Jîngeha min' e, rengandina wê baş

e û bi wêneyên lêhatî ve hatiye dagirtin. Zimanê wê xweş e lê di hin mînakên de xwendin giran dibe ku ew jî; di rûpela 43'an de bêjeya 'xwendingeh'ê axaftinê giran dike, dîsa di heman rûpelê de navê polan bê dabir in. Di rûpela 44'an de 'Ez di dersa bîrkariyê de mijara jîmareyan hîn dibim' xwendinê dijar dike ku wiha baştir dibû: 'Ez di dersa bîrkariyê de jîmaran hîn dibim'. Di rûpela 49'an de di hevoka binî de: 'Ser çavan were, ez jî dê bi hatina te kêfxweş bibim' de ciyê nivîsandina 'dê' yê çewt e. Divê wiha bûya 'ez ê jî bi hatina te kêfxweş bibim'.

Navê unîteya 4. 'Laş û Tendurustî' ye ku bi wêne û mînakên baş ve hatiye dagirtin. Zimanê wê xweş e lê di rûpela 61'an de di hevoka; 'Ez ser û çavê xwe dişom' de 'ser û çav' çewt hatiye nivîsandin. Lewre ew peyv ne 'ser û çav' lê 'serçav' e ku hemwateyê bêjeya 'rû' ye. Bona, divê hevok wiha be: 'Ez serçavê xwe dişom'.

Unîteya 5. 'Demsal û Salname' ye. Mînakên wê, wêne û çalakiyên wê yên xwendin û nivîsandinê baş in. Demsal bi zarokan daye naskirin û zarok û demsal li hev aniye. Di vê unîteyê de ziman û vegotin xweş e lê di rûpela 85. de di bêjeyên 'bêhnvedan' û 'sibeh' de tîpa 'h' yê ne hewce ye bê bikaranîn lewre xwendinê dijar dike û nebûna wê jî nabe sedema tevliheviyan. Di rûpela 86. de jî bêjeya 'dibuhure' wekî 'dibore' bihata nivîsandinê dî hêsantir bûya. Vê unîteyê cî daye deman ku dem ji bo zîmanekî gelekî girîng e. Xweser jî navê roj û mehan. Navên mehên kurdî jî bilî çend guhertinên biçûk wekî di kovarên 'Hawar û Ronahî' yê de hatine bikaranîn in. (Hawar, 2012), (Ronahî, 2010). Lê di kovara 'Kurmancî' de jî li şûna 'Çiriya Pêşî' 'Çirî', li şûna 'Çiriya Paşî' 'Teşrîn', li şûna 'Kanûna Pêşî' 'Kanûn' û li şûna 'Kanûna Paşî' 'Çile' tê bikaranîn. (Kurmancî, 2010) Li gorî me navê mehan wekî Kovara Kurmancî bê bikaranînê dî hêsantir be. Dîsa wekî pêşniyar li şûna meha 'Teşrîn'ê 'Mijdar' dikare bê bikaranîn û bi vî awayî navên mehan wiha dibe: Çile, Sibat, Adar,

Nîsan, Gulan, Hezîran, Tîrmeh, Tebax, Îlon, Çirî, Mijdar, Kanûn.

Unîteya 6. 'Xwarin û Vexwarinên Me' ye û mînakên xwarinan û wêneyên wan guncaw in. Lê di bikaranîna hin bêjeyan de çewtî hene ku ew jî ev in: rûpela 95. bêjeya 'çêbûn'. Lêkera 'çêbûn' lêkereke dariştî ye û ji peyvên 'çê' yê ku hevalnav e û 'bûn'ê ku lêker e pêk tê. Lewre li gorî wateya hevokê divê herdu peyv wekî 'çêdibin' bi hev ve bihata nivîsandin. Dîsa di heman rûpelê de navê Bajarê Bilîs'ê wekî 'Bedlîs' derbas dibe ku gel ne wekî 'Bedlîs' wekî 'Bilîs' bi kar tîne û bilêvkirina awayê gel hêsantir e. Dîsa di rûpela 96. de 'Meletî' wekî 'Meleti' û di rûpela 97. de 'nivîşk' wekî 'nivîşk' hatiye nivîsandin ku ew jî mînakên çewtiyên rastnivîsî ne.

Unîteya 7. jî 'Lîstik û Xeberoşk' e. Di vê unîteyê de jî mînak û wêne baş hatine dayîn lê dîsa di zîman û vegotinê de di hin mînakên de kêşe heye. Di rûpela 103. de hevoka; 'Ez jî dê bilîzim.' divê wiha bûya 'Ez ê jî bilîzim.'. Dîsa di heman rûpelê de hevoka; 'Baş e, pêşî dê kî ji me bibe pîra holikê?' divê wiha bûya: 'Baş e, pêşî kî yê ji me bibe pîra holikê?'. Heta di vê hevokê de îfadeya 'ji me' jî zêde ye ku hevok wiha dibe: 'Baş e, kî yê bibe pîra holikê?'. Dîsa di rûpela 106. de hevoka; 'Hevalno ka dê kî ji we vê zûgotinokê bibêje?' ku xwendina wê zor e û wiha bê nivîsandin xwendina wê dê hêsantir be: 'Hevalno ka kî yê vê zûgotinokê bibêje?' disa heman hevokê ku xwendinê giran dîkin di rûpelên din de jî hene.

Di unîteya 8. de jî ku navê wê 'Çalakiyên Serbest' e. Bi mînakên dewlemend û wêneyên rengîn unîte hatiye dagirtin û çalakiyên ku zarok jê hez dîkin hatine nîşankirin. Lê di wêneya li jêra rûpelê de zarokê bi navê Aram dibêje: 'Ez dawîya hefteyê digel hevalên xwe diçim seyranê' lê di wêneyê de ew tenê dixwiyê. Di vê unîteyê de zîmanekî xweş hatiye bikaranîn lê tenê bêjeya 'cîh' wekî 'cî' bê nivîsandin

baştir dibe. Di kurmançî de hin peyv hene ku bi du awayan, awayê kurt û awayê dirêj tên nivîsandin ku herdu jî rast in.² Lê di zimanekî de bêje çiqas kurt bin û bilêvkirin û xwendina wan çiqas hêsan bin ewqas tên tercîhkirin. Zarok jî bi piranî ji bêjeyên kurt, biaheng û hêsan hez dikin.

Unîteya dawiyê ya 9. e ku navê wê; Hatûçû-Geştûger' e. Ev unîte jî, bi wêne û mînakên xwe ve dewlemend e û li mijara unîteyê re hemaheng e. Ziman û vegotin xweş û danasînên baş hene. Di hin îfadeyan de zêdehî yan jî çewt bikaranîn hene ku em ê wan diyar bikin. Di rûpela 129. de di bin beşa 2. de îfadeya '*...bisiklêta xwe di wir re bajon*' dikaribû wiha bûya '*... bisikleta xwe tê re bajon.*'. Di rûpela 133. di paragrafa 2. de bêjeya '*carinan*' divê wekî 'carna' bihata nivîsandin. Dîsa di rûpela 137. de diviya îfadeyên '*li jorê*' wekî '*li jora*' û '*li jêrê*' wekî '*li jêra*' bihata nivîsandin. Rûpela 138. de jî lêkera '*hatin*'ê wekî '*forma*' bêt de hatiye nivîsandin ku li şûna '*bê*' 'werim' û li şûna '*bê*' 'werî' bihata bikaranîn dê baştir bûya. Lewra '*bê*' di kurdî de wekî lêkera alîkar bêt bikaranîn rastir e.

Encam

Me di vê nivîsa xwe de qismê kurmançî ya Kitêba Dersa Kurdî ya Hilbijartî ya Pola 5. ji aliyê naverok, dîtbarî, ziman û vegotinê ve nîrxand û başî û kêmasiyê wê digel pêşniyaran da pêş çav. Çendî li Tirkîyê mînaka yekem a fermî be û pêşîn be jî kitêb serkeftî ye û li ziman û çanda kurdan hatiye. Ebat, şiklê nivîsê, xêz, wêne û rengandin li gorî asta polê ye. Ziman û vegotina wê bi giştî kêş e lê cî bi cî hin îfade xwendinê dijwar dikin û axaftinê giran dikin, hin bêje çewt hatine nivîsandin û hin îfade di hevokan de zêde dimînin ku me ew di rûpelên pêş de diyar kiribûn.

Di zimanekî de rastbikaranîna bêjeyan têrê

nake divê bêje; biaheng, xweş, heta ku pêkan be kurt û bi wate bin da ku gel xweser jî zarok jê hez bikin. Peyvên wekî 'cîh', 'buhurî', 'sibeh', 'bêhnvedan' rast in lê zarok zêdetir ji awayên wan ên; 'cî', 'borî', 'sibe', 'bêhnvedan' ê hez dikin. Dîsa peyvên wekî; 'xwendîngeh', 'balafirgeh' dirêj in û di hevokan de xweser jî bi daçekan re bikaranîna wan dijwar e. Em ê li vir çend bêjeyan pêşniyar bikin ku ji van hinek di kitêba mijara xebata me de jî derbas dibin hinek jî dibe ku di kitêbên polên din de cî bigirin in. Bêje ev in: Li şûna '*balafirgeh*'ê '*firyân*'; di wateya cîyê ku gelek firîn lê tên kîrin de dikare bêt fêmkirin. Di hevokên mînak de: "*Balafira me li firyanê danî*", "*Firyan Amedê gelekî mezin e.*". Li şûna '*park*'ê '*geryan*'; di wateya cîyê gerê de dikare bêt fêmkirin. Mînak: "*Ez li geryanê rûniştîme.*". Li şûna '*zimanê zikmakî*' '*serziman*'; di wateya zimanê sereke de dikare bêt fêmkirin. Mînak: "*Serzimanê min kurdî ye.*". Li şûna '*kompîter*'ê '*bîryar*'; di wateya tiştê bibîr, xwedî bîr û bîrbîr dikare bêt fêmkirin. Mînak: "*Bîryara min naxebite.*". Li şûna '*ekran*'ê '*ser(r)û*'; di wateya tiştê ser rûyê tiştêkî de dikare bêt fêmkirin. Mînak: "*Serûyê televîzyonê toz girtiye.*". Li şûna '*dataşov*'ê '*navnîşan*'; di wateya tiştê ku nava/hundirê tiştêkî nîşan dike de dikare bêt fêmkirin. Mînak: "*Navnîşana pola me nû ye.*". Li şûna '*tepegöz*'ê '*serşan*'; di wateya tiştê ku bi ser ve nîşan dike de dikare bêt fêmkirin. Mînak: "*Hevalê min ders bi serşanê vegot.*"

Di dawiyê de ji bo kitêbê em dikarin bêjin ku kêmasiyeke mezin ji holê rakir û ji bo kitêbên pêşerojê bû mînak û çavkaniyek. Helbet ji bo polên jortir kitêb, materyal û bername dê bêt amadekirin û ji bo ziman û edebiyata kurdî pêş keve xebatên mezin dê bêt dan. Ev kitêb dê bi kêrî yekgirtîbûn û serûberiyê were û ji bo kitêbên nû dê firsenda dîtina kêmasî û qelsiyên jî bide pispor û lêkolîneran.

2 Di kitêbên rêzimanî de herdu awa jî cî digirin û mînakên wan tê dan. Ji bo zêdetir agahî binêre: (Celaldet Bedirxan û Roger Lescot, 2000, r.64), (Samî Tan, 2011, r.50), (Çetîn Taş, 2013, r.23)

‘Işqa Şêx ‘Eleddîn

M. Emin HEYDERÎ

‘Işqa te li dil da tu şîrînê me ‘Eleddîn
Dunya bi te xweş bû xem revînê me ‘Eleddîn
Zanim tuwî dermanê birînê me ‘Eleddîn
Em man ji xemar e tu dibînî me ‘Eleddîn
Hetta mirinê derd û evînê me ‘Eleddîn

Rûhê me ‘Eleddîn dev û lêvê şekerî bû
Exlaq melekî bû lê bi şiklê beşerî bû
Xêr xwazê mirî da jimera pişt û serî bû
Mêrxasê terîqê rûh û canê Heyderî bû
Hetta mirinê êş û evînê me ‘Eleddîn

Derdê li me peyda bû me bawî ez ji gava
Wechê wekî heyvê ku li çarda diçû ava
Hêstir wekî baranê dibarin ji dû çava
‘Eşqa te biraştî nema tê der ji hinava
Halê me xerab e tu dibînî me ‘Eleddîn

Piştî te li ber çavê me dunya hemî reş tê
Navê te dibêjim wekî waye tu bi meş tê
Dermanê dilan î li birîna çiqas xoş tê
Xweziya min hebîbê xwo bidîta li bûhiştê
Wê wextê tu dermanê birînê me ‘Eleddîn

Wellah ji te têr nabim ez navê te dibêjim
Weqtê te nebînim li heyatê kerr û gêj im
Heqê min e piştî te dilê xwe bibirêjim
Hêstir ku nemînin heqe xwînê ez birêjim
Ez kuştîyê ‘eşqa te şîrînê me ‘Eleddîn

Ez kuştîyê ‘işqa te me hetta mirinê aax
Dunya ku li ber şewqa te bû ey gula ser şax
Xwoş nabî heyata me di piştî tu nema sax
Xweziya te bibînim bi wî şiklê heye ew çax
Ez dînê te me ey Sit û Zîn ê me ‘Eleddîn

Qurbana te bim Zîn û Sitê taca serê min
Bê şubhe tu wî wens û heyata cegerê min
Axir te mirandî hemî şewq û fenerê min
Em man ji kula ra ji xwo pir bûn kederê min
Dunya hemî kerr bûn ji qîrênê me ‘Eleddîn

Billah ‘Eleddîn tu bû sorgul ji dila ra
Ma wek te hebûn şîrîn û dilxwaz ji mela ra
Tuj kîsê me çûyî te em hiştin ji kula ra
Piştî te heyata me di maye ji xema ra
Îmdad û hewar e kul û şînê me ‘Eleddîn

Ya Reb bide sebrê ku ‘Eleddîn çû wefatê
Xwezîya me bidîta di wê weqtê sekeratê
Agir digirtî dil ji kula naê tebatê
Sed heyfa me winda kirî ser taca welatê
Lê Heyderî zanî tu emînê me ‘Eleddîn

Sedemên Paşdemayîna Me¹

Ji Munazarat'ê

Bediuzzeman Seîdê Kurdî

Wergêr: Abdurahim YILDIZ

Pîrs : Mêraniyek wisa bi me re heye weke dil mezin, belkî wek hucrê di laşê me de tije ye. Hem bi meran mêraniyek wisa wek çiyayên li nava van çeman belavbûyî heye. Her hêla serê me tijî aqilê me heye. Guhlêdanek me ya biqasî beden û libatên me tijî bike heye. Û mirovên me welê çalak, zîrek he-nin ku dikanin rih bidin çemên me, ji çiyayên me re jiyanê bînin û wan bixemlînin.

Çima em wanî sefil bûn û me îflas kir, em perîşan bûn, li ser rîyan man. Ê ku ketin ser rêya pêşdeketinê em derbas kirin û ketin pêşiya me. Ber bi pêşerojê bi hêl ve direvin. Ê ku ji me kêmtir û qaweta wan ji ya me hindiktir, ji me mezintir bûn?

Bersiv: Cihên ku fikrên gel, xwedî tesîr in û tenê saziyên wan li gor dadperweriyê dişixulin, ji xeletiyên xwe veger, li nerastiyên xwe poşmanîbûn heye û ên wanî pir in jî. Ev xerabiyana ne emelê rêvebirinê (karbidest) neha ye, ji bo wê ez wan rexne nakim û heqê min tune ye ez tîrê xwe bavêjim wan . Ez tirê rexnê davêjim ew rêvebirên berî niha yên dewra istîbdadê. Dilê wan pêgirtiyên istîbdadê dişkê jî bila bişkê, bira li qûsûrê mêze nekin. Bilindiya rastiyê a heqiyê ji hemû xatiran bi rûmettir e. Tenê bila dilê heqiyê neşkê. Lewre xatirê gel ji xatirê wan bilindtir û birûmettir e.

Du xal bûne sedema paşdemayîna me, ji bilindiyê ketina me ez ê ji we re bejim.

Yek jê; hinek karbidest in ku sexte mîlîyetperwer in ji dil ve li gel nafikirin, lê ji gel her roj her roj fedakariyê dixwazin. Yên din jî ev sexte-karan in ku birastî haya wan ji dîn û îmanê tune ye lê belê li ser navê dîn derketine holê, têkiliya wan qan-di zerreyê misqal bi Xwede re tune ye lê dibêjin em

weliyê Xwedê ne. Tev van hemî tiştan jî ev merivên nebaş û fikra ne li cî ya nebaşiyê ji îstîbdadê ji me re mayî ye.

Pîrs: Belê ew cureyên te li jor jimart çawa li wê dewra berê man û çawa di paşdemayîna me de roleke girîng digrin?

Bersiv: Ji bo her gelî hewzekî manewî ku;

1. Wêrekiya neteweyiya wî gelî çê bikê,
2. Namûsa neteweyî ya wî gelî biparêze,
3. Qaweta wî gelî tê de kombibe heye.

Dîsa ji bo her gelî gencîneyek ku;

1. Comerdiya neteweyî pêk bîne,
2. Menfî'eta neteweyî temîn bike,
3. Malê ji ber mesrefkirinê zêde maye kombike û bihelsengîne heye.

A ha du cureyên sedema li paşdemayîna me ku min li jor jimartibûn bizanetî ya nezanetî di diwarên wî hawiz û wê xezîneyê gelek qulik ve-kin. Pêkanîna berdewamiya jiyana wî gelî bi erdê ve teqandin. Ew unsûrên jiyanî ewqas bera valahiyê dan wî hewza bitemamî ziha kirin, û ew gencîne bi temamî valakirin. Heke ev qulik wanî bidome, ji bo kêmaniyan, dewlet wê têkeve bin deynan. Hebûnên wan wî deynî dernaxe ew ê ni-karibe wî deynî bide (sedema ku tune ye) dewlet wê li ser piştê bikeve.

Çawa ku ew ji hisên meriv ên tabîî hîsa xezibê ku nîşana wê def'kirin e, û ya xwestinê ku nîşana wê berve xwe kişandine, eger ew his bi merivan re tunebe meriv ne merivekî normal e.

¹ Di vê wergerê de, min ji Kovara Şamramê hejmara şeşan rupelê 14an ku bi şiklê tirkiya îro hatiye nivîsandin, istifade kir.

Wekî bi şeklê xwe însan be jî bi taybetmendiyan xwe ne însan e, yan mirî yan jî nîv însan e.

Çawa ku trêneke bi hilmê/dûkêlê dişixule, sîtila wê qul bibe ew trên nikare bilive.

Dîsa çawa ku benê serê tizbiyê biqete ew hebikana her yek wê bi hêlekê belav bibe û ew ê ji tizbîtiyê derkeve ‘eynî wisa jî ew hewz û xazîneyên ku parastina hebûna şexsiyeta manevî ye. Qaweta aborî û her cur qaweta gelan e ku ji hêla bêtewman/xerabxulqan hatiye valakirin, ew gel jî bê muwazene, perîşan û ji her tiştî bê par maye. Hîsên hezkirinê û bilindkirina gel kor dikin û wî gelî perçe perçe dikin. Li qusurê nenêrin ez ê van yeko yeko bêjim. Ez ê ji bo heqîqet nezanan xatirê heqîqetê neşkinim.

Pirs: Em lawa ji te dikin, ev mijar pir girîng e; bi temamî şîrovekirina wê jiyanî ye, muhîm e. Tu vê mijarê sergirtî nehêle û ji me re bi temamî şîrove bike ew ê pir pir bifayde be.

Bersiv: Di dewra berî a niha de hinekên xwedî qewet bi rêyek xayînî, bi darê zorê, bi qewetê ji dinê nezeniyên we û menfî’eta xwe ji nezaniya we îstifade kirin û çavkaniyê we yê mezin (cesareta we ya millî, namûs û qeweta we ya millî) û comêrdiya we ya millî û ew qeweta we ya aborî ku hemû menfî’etê we di xwe de civandîbûn a wan madenê we qul kirin.

Ew cesareta we ya millî, qaweta we û namûsa we ya millî ku ji bo we ava jiyanê ye ku bi erda tiştek lê hêşîn nayê berdan, bi erdê ve teqandî û gelek parsek û tembel derxistin holê. Ev rewşa bi zanetî hate kirin ku gel bêtaqet bikeve, ew biqewet bibin.

Heta xwediyê wê qewetê di rêya nefretkirina malê dinê de ew merivên me yên ji bo sipehîtiya paşeroja xwe li tiştê diqewimandin ji bo ku ew hîsên xwe lê qewimandinê qutbikin li ser wan damaran runiştin û ew ziha dikirin. Ev însanên me yên ku bi vî awayî ji taqetê diketin bidestxistiyên muhtemel jî hîna di serê rê de wenda dikirin. Lewra neyarê gel ji xwe ev dixwestin.

Erê her milletê ku paşeroja xwe û berjewendiyên xwe difikire qewetek wî eşkere

ya madi-manewî heye, ew qeweta bi hişmendî cî hê tê lîbikaranîn heye. A ew qeweta me ya madi-manewî li kar û îşê neliçîh û pîs hat şuxilandin.

Ew qeweta milletên din ya madi-manewî mîna ava dilop dilopî dicivî ser hev, dibe mîna golege biçûk dicive û di destê wan de dibe xezîneyek. Wan miletan berê xwe dan perwerdehiyê, qeweta xwe ya madi-manewî zêdetirkirin û bi vî rêyê girtin.

Lêbelê mixabin li ba me hinek mezinên me yên dewra berê (dewra istibdadê) cesareta me ya millî ku namûs û qaîdeyên milletê me diparastin, li rêya xerab şuxilandin û însanê me bera ber hev dan. Wek avek tu bera çolê de, qeweta me mahv û perîşan kirin. Ev xerabxulqên di nav me de hinekan hêlek qeweta me, hinekan hêlek qeweta me ya din dan hember hev û bi hev şkandin.

Ez bi rewşek xemgîn dibêjim ew qewetên me niha şkandine, ev qeweta vî milletî ye ku di rêya parastina namûs û şerefa vî gelî - ku 500 hezar egîtî bi carekê ve rê dike merteba şehadetiyê- di wê qabîliyetê de ye. A ev xopereşt û bêbextî jî ma’na ruhê millet bêpar, wê qeweta mezin li hember hev xistin û sekînîn. Neyekîtiya di nav civatê de hebû wan jî hezar neyekîtiyên din li ser kirin, ew neyekîtî xistin halekî ku nikaribe bicebire. Ên ku ev zerara mezin dan millet xwe musteheqî cezayê kirin.

Li ser van şîroveyan min şûnda ez dikanim bêjim, dive hûn ji wê meşrûtiyet û huriyeta şer’î ku dewra istibdadê ji holê rakiriye (kî ev her cûr xwelêdanîna musbet teşwîq dike) îstifade bikin.

Wan destê nezan qulikê di hawizên we vekirine derhal bigrin ya jî wek dilopên dikevin ser hev û golek biçûk çêdikin hûn jî golek wanî çêbikin. Wê qeweta xwe ya birûmet ji bo gefên li hember dewletê tînin bikaranîn bidin destê dewletê.

Eger hûn van hemiyan bikin dêlva li rewşa berê hiştinê, hûnê merhamet û alîkariyê, li hember îltimasê hûnê dadmendiya û ji dil ve wehşeta ku hûn di nav de mane hiştin hûnê medeniyetê bi dest xin.

Helbestên Ku Helbestvanên Wan Ne Diyar in -I-

Tîpveguhezêr: Emîn AGAHDAR

Helbesteke tesewîfî ye. diyar e ku li ser Xewsê Hîzanê hatiye nivîsîn. Şêwaz û forma klasîk parastîye. Bêje û terkîbên ‘erebî gelekî hatiye bikaranîn. Ji ber ku helbestvan ne diyar e, belkî meriv dikare bibêje ku helbesteke anonîm e. Ji malika şeşan ku dibêje *“Nezerke tu li ya û xa bi xidmet hate meydanê”* xuyaye ku navê xwe bi îşaretî destnîşan kiriye. Lê dîsa jî meriv nikare jê derxîne ku ka kî ye.

Em ê helbestên wilo biweşînin, lewra dibe ku bi vê awayî em xwe bigihînin çavkaniya ‘eslî û nivîskarî. Bêguman di edebiyata Kurdî “bênav” gelek in. Hinekan ji dîlîzmî navê xwe nenivîsandine. Hinekan jî zêde li helbestên xwe xweyî derneketine. Para pirtir qîmet dane hestên xwe û dilûcaniya xwe. Loma tameke cuwan di helbestên wan de heye. Belê xuya ye ku ev helbest, rûpelek ji dîwaneke wenda ye. Mixabin edebiyata kurdî ya klasîk bi “dîwanên wenda” ve dagirtî ye. Hêviya min ew e ku kurdologên me mîna arkeologan bidin pey dîwanên wenda. Û di avakirin, pêşdebirin û di nava edebiyata cîhanê de ciyekî payebilind girtina kurdî de rol û ciyê dîwanan niştecîh bikin û qerase bikim.

*“Da xelq-i nebêjtin ku Ekrad
Bê ma’rîfet in, bê esl û binyad
Enwayê millet xwedan kitêb in
Kurmanç-i tenê di bê hesêb in
Hem ehlê nezer nebên ku Kurmanç
‘Îşqê nekirin ji bo xwe armanc
Kurmanç-i ne pîr di bê kemal in
Emma di yetîm û bê mecal in
Min dê ‘elema kelmê mewzûn
Alî bikira li banê gerdûn” ji Mem û Zînê*

Ela Ya Eyyûhel Xews¹

Ela ya eyyûhel xewsul ‘ezîm û înnenî ‘asî
We ente emcedun femnun ‘eleyye eyyûhes saqî

Bidî min kaseya ‘îşqê bixwarim ez tenê mecrûh
Fe entel tuf bî ela ya kehfe ‘uşşaqî

Tu nîn e bo me ra çare ji xeyrê te eya bazî
Li min şefqet ke tu îro ela ya melceya nasî

Ez im kelbê derîzanî bi heqqê hedret û seyda
Li min rehmê bike carek ela ya qutbê heqqanî

Nebêje laûbalî tu bide carek ji wê rehmê
Tu ihsan ke li min îro bi heqqê Xewsê Hîzanî

Nezerke tu li ya û xa bi xidmet hate meydanê
Berê qelbê wî mûswed e nizanî dew çî dermanî

Gunehkar û zelîl im ez di zenban da xerîq bûm e
Umîddar im ji şahê ma li min carek ke ihsanî

Tu pir ihsan xweyî şefqê ji ‘alem ra mû’indar î
Reîsê vê terîqê tu xewsê berr û behran î

Di ‘ilmê da tu yî sabîq wekî Îmamê Rebbanî
Di zuhdê da tu yî faîq wekî xewsê li Geylanî

Di hilmê da bedî’î lew di xewfê da tu yî meşhûr
Di husna xedd û xalan da wekî Yûsûf di Ken’anî

Tu faîq î li ser eqran def û turren di her tişt î
Me taqed nîn e em ‘ed kin şemaîla te Sultanî

Bi wî çavê xezalî tu li min carek bike nezer
Ji wê feydê nehêle min ez im îro bi efxanî

Eger xewsê di Qesrê da li min carek nekî rehmê
Nizanim ez çî çar kim lew li vî qelbê birîndar î

Umîda min tu nîn e lew ji xeyrî te di ‘alem da
Ji ser qelbê min î ‘asî tu rake hezza şeytanî

Te nûr û feyd û nisbet tev li ser ‘alem bala kirye
Me jî mehrûm nekî îro bi heqqê şahê Xiznayî

¹ Di lîstûseke Mela Salih Ertekîn’de ev helbest hatiye dîtin. Bi destxeta Mela Salih hatiye nivîsandin. Dîroka nivîsandina vê destxetê 1962 ye. Mela Salih bi xwe jî nizane ku ya kê ye û nayê bîra wî ku ji kê wergirtiye.

Newrozname

Remezan BINETARÎ

Li ser salvegera newroza (destpêka bihara axîretê ya) giyanê pak ê Bediuzzaman Seîdê Kurdî.

Çend kerametên ku Xweda, ji Seyda re derbarê wefata wî de îhsan kirine hene:

1. Seyda bi îzna Xwedê îşaretî sala wefata xwe dike di şanênava xwe ya helbestî ya “Eddaî/Duakar”ê de:

...Ez qebrek hilweşiyayî me ku, kom bûye di navê de

Ji Seîd heftê û neh mirî (Jêrenot) bi gunehên eleman.

Yê heştêyan bûye, ji qebrê re kêlikek

Tev bi hev re digrîn ji xisarên Îslamê re.

(Jêrenot) ...Îsal Seîd di heftê û neh saliya xwe de ye. Di her salekê de Seîdek miriye ku dê heta vê tarîxê Seîd bijî.¹ Ji yîna heta wê mêjûyê... Ango Seîdê dilseîd heta heftê û nehan (79an) yanî sala hezar û sê sed û heftê û nehan (1379an) a hicrî sala 1960î ya zayînî dijî. “Yê heştêyan bûye, ji qebrê re kêlikek” jî rênîşanî dike ku piştî çar mehên din di sala 1380î² ya hicrî de ji ber ku zalim ji meytê wî jî dikevin metirsiyê û jê aciz dibin, di gorê de jî wî rehet nahêlin. Bi destên şikestiyê kêlikên tîrbê dişkinîn, termê wî yê mibarek jê derdixin û dibin ciyekî nediyar. Seyda li dunyayê ji ber têkoşîna domdar bi vîna xwe, nebûbû xwediyê xaniyekê jî, lê çavên zordestan bi quncikekê li bin axa welatê wî jî bar nebûn.

1 Bediuzzaman Said Nursi, *Lem'at*, Hizmet Vakfı Yayınları, Stenbol 2014, r. 8 wer: Aydin Uneş, Ayhan Yıldız

2 Abdulkadir Badilli, *Mufasssal Tarîxçe-i Hayat* (Tarîxçeya Jiyanê ya Berfireh) l'Amicale des Musulmans d'Europe, Stenbol 1998 cild 3 r. 2163

Xwedayê me! Tu wisa jiyanê zelal û baweriyê xurt bide me musulmanan ku ziravên neyaran ji meytên me jî biqetin.

2. “Divê em bi ruhên xwe, bi canên xwe, bi wicdanên xwe, bi fikrên xwe, bi hemû hêzên

xwe bibêjin: Heke em bimrin, Îslamiyeta ku milliyeta me ye jîndar e, heta ebedê domdar e. Milletê min her sax be. Xêr û berên axîretî ji bo min bes e. Heyata manewî ya di jiyana milletê min de ye min dide jiyandin. Di alema bala ya axîretê de min kêfxweş dike. Divê em bibêjin: Elmewtû yewme newrûzîna/Mirin ji bo me roja/cejna Newrozê ye û rêberên ronak ên Nûr û xîretê ji xwe re bikin rêber.”³

Îca Seyda li vê derê jî bi destûra Xwedê îşaretî roja/hefteya wefata xwe dike. Jixwe di 23'yê Adarê (Newroza) ya sala 1960'î de piştî jiyanê kul û keser, êş û têkoşîn, digel ku wî bihuştê jî ji xwe re nekiribû amanc bi dilxweşiya cejnê çû diyarê çêjnê. Seyda lezandibû, di zivistanê de hatibû, tov û dendikên bibereket ên ku niha em ber û berhemên wan dibînin reşandibûn lê negihîşt bişkivîna wan a di biharê de. Ji aliyê xuyanê ve pêwendî nîne bi roja wefatê û newrozê ji ber ferqa du rojan. Lê îro ro pratîka welatên mîna Îran û Agirbêcanê ku newrozê wekî hefteyek pîroz dikin û li gorî hin nêrînan jî ev têkilî tê peyîtandin. Wekî mînak: “Belê rûpela 1474'an a Qamûsa Tirkî ya Şemseddîn Samî roja Newrozê wiha tarîf dike, dibêje: ‘Newroz di salnameya berê ya Îranê de û di salnameya Celalî de roja nehemîn a meha Adarê ya Rûmî ye ku serê salê ye û destpêka biharê ye.’ Roja nehemîn a Adarê ya salnameya Rûmî jî 23'yê Adarê ya Mîladî ye û ew roj

3 Bediuzzaman Said Nursi, *Asarê Bediyye*, Elmas Neşriyat, Stenbol 2004, r. 347

tarîxa wefata Hezretî Ustad e.”⁴

Ha nêrîna Quranî heke mirra mirinê jî biguherîne bi çêjna cejnê...

Ya Rebb vê Newrozê bike destpêka bihara aşitî, biratî hemû daxwazên Îslamî û insanî û bike wesîleya bihara axîretê. Amîn...

3. Feqîrullah Melezadeyê Nisêbînî ku nêzî heft mehan digel Ustad li herêmê geriyaye û jê ders xwendîye kerameteke din a Ustad wisa vediguhezîne: “Rojekê gava ji min re bi henekî diştexilî got: ‘Sed salo! Tu yê sed salî bijî. Ez ê jî li Ruhayê wefat bikim. Lê belê dê qebra min vekin û min jê derxînin û bibin.’ Û wekî vê min bi aşkerayî gelek kerametên wî dîtî. Ji min hez dikir, tim û tim têkilî min dibû û bi min henek dikir: Nemiro! Sed salo!.. Bi rastî jî Melezade di sala 1973’an de tam sedsaliya xwe temam dike li Nisêbînê diçe rehma Xwedê.”⁵ Rehma Xwedê li wan be. Seyda nêzîkî wefata xwe de jî vê mijara ciyê qebrê bi awayekî din aniye zimên û wek wesiyetê wisa gotiye: Divê mezêlê min di ciyekî gelek nepenî de be, bêtî şagirdê du şagirdên min tu kes ciyê wî nizanîbin. Vê yekê wesiyet dikim. Lewre heqîqeta ku li dinyayê, min jî sohbetê men dike helbet piştî wefata min jî ew heqîqet bi vî awayî min bêgav dike.” Lê ji ber vê gotina Ustad qet neyê bîra tu kesî ku em ji ber pêkhatina wesiyetê ya bi destên xêrnediyo yên zordestan kêfxweş in, alîgirê zulma wan in, bi hezaran heşa. Xweda duaya Seyda qebûl kiriye ev tiştekî din lê sîtemkaran zilmeke erşê dihejîne kiriye. Xwedayê mezin û adil însaellah ji sîtemkaran re

nehêle, hem li dinyayê hem li axîretê Seyda jî bextewar bike li herdu daran. Amîn.

Ji Rîsaleyên Nûr Newroza Sultanî:

Ka were, îro, Newroza Sultanî ye. (Haşîye) Dê guherînek çêbibe û dê karûbarên ecêb biqewimin. Di vê roja xweş û geş a biharê de, em biçin wê sehra hêşîn a ku xweşik û bikulîlk e û ji xwe re geşt û seyran bikin.”

(Haşîye): Ango roja Newrozê, îşaretî demsala biharê dike. Sehra hêşîn a bikulîlk jî, ew rûyê erdê yê di demsala biharê de ye. Îca ew perde û dîmenên ku diguherin jî, îşaretî wan tebeqeyên mawcûdên biharî, taîfeyên çêkiriyan havînî û xwarinên ku dibin erzaqên heywanî û insanî, yên ku ji destpêka biharê heta dawîya havînê, Sani’ê Qedîr ê Zulcelal, Fatîrê Hekîm ê Zulcemal, bi kemala întizamê wan diguherîne û bi kemala rehmetê wan teze dike û li pey hev wan dişîne, dike.⁶



⁴ Abdulkadir Badilli, *Mufasssal Tarihçe-i Hayat* (Tarîxçeya Jiyanê ya Berfireh) l’Amicale des Musulmans d’Europe, Stenbol 1998 cild 3 r. 2161
⁵ Heman berhem: cild 1 r. 117

⁶ (Ji bo berfirehî bnr: Sûretê Dehem ê Peyva Dehemîn ku Rîsaleya Heşrê ye.)

Berawirdkirina “Ey av û av”a Feqiyê Teyran û “Su Qesîdesî” ya Fuzûlî

M. Emîn DEMÎR¹

Em ê di vê nivîsa xwe de, ji kurdî û tirkî berawirdkirina du berhemên hêja û sereke bikin. Em ê li gor rêbazên Zanista Wêjeya Berawirdkirî, lêkolînên li ser “Ey av û av” a Feqiyê Teyran û “Su Qesîdesî” ya Fuzulî bikin. Em ê di serî de di derbarê Zanista Wêjeya Berawirdkirî de hin agahiyan bidin û dû re derbasî mijara xwe bibin.

Zanista Wêjeya Berawirdkirî

Berawirdkirin di navbera du berhemên zimanekî, an jî di navbera du berhemên du zimanê cuda de tê kirin. Li gor Gursel Aytaç, Zanista Wêjeya Berawirdkirî şaxeke zanista wêjeyê ye ku berhemên edebî lêdikole. Peywir û fonksiyona wê: Du berhemên ku bi zimanên cihê hatine nivîsandin ji hêla mijar, raman û ruxsarî ve lêbikole û hêlên wan ên hevbeş, wekhev û cihê tesbît bike û li ser wan şiroveyan bike.² Li gor Evdirehman Adak, lêkolînên li ser metnên edebî ji du aliyên ve tê kirin: Ji aliye ruxsarî û ji aliye naverokî ve.³

Piştî me di derbarê zanista berawirdkirinê de hin agahî dan em ê helbestên “Ey av û av” û “Su Qesîdesî” yê li gor Gursel Aytaç ji hêla mijar, raman û ruxsarî ve lêbikolin û hêlên wan ên hevbeş, wekhev û cihê tesbît û şirove bikin. Lêbelê, em ê ewilî di derbarê jiyana her du nivîskaran de hinek agahiyan bidin.

Feqiyê Teyran:

Di sala 1563yê mîladî de li gundê Warezûzê yê bi ser Miksê ve hatiye dinyayê. Navê wî Mihemed e.⁴ Navê bavê wî Evdilah e. Di nava gel de

wekî Feqiyê Teyran bi nav û deng bûye. Li Miksê di medreseya Mîr Hesênê Welî de xwendiyê û piraniya xwendina xwe lê wê derê pêk aniye. Di helbestên xwe de mexlesên “Mîm û Hê”, “Miksî” û “Feqî” bi kar aniye. Li gor Evdilreqîb Yûsiv: Feqiyê Teyran yek ji wan helbestkarên kurdan yê ku binaxeya wêjeya kurdî daniye.⁵ Berhemên wî evin: Menzûmeya Şêxê Sen’anî, Menzûmeya Bersîsê Abîd, Menzûmeya Zembîlfroş, Menzûmeya Dimdimê û helbestên cur bi cur, wek Ey av û av, Îro ji dest Husna Hebîb, Feqê û Bilbil û hwd. Helbestên wî jî piştî wek dîwan hatine çapkirin. Li gor Aleksandir Jaba Qewlê Hespê Reş jî berhema Feqî ye.⁶



Feqî di helbestên xwe de zimanê gel li gorî dema xwe bi awayekî zelal bi kar aniye. Ji ber vê di nava gelê kurd de helbestvanê ku herî zêde tê naskirin Feqî ye. Di sala 1641ê de çiya ser dilovaniya xwe.

Fûzûlî :

Di sala 1483yê mîladî de li Iraqê hatiye dinyayê. Navê wî yê rast Mehmed kurê Silêman e. Perwerdeya xwe ya ewil ji bavê xwe yê miftî standiye û paşê jî ji mamosteyekî bi navê Rehmetullah

1 Serokê Komeleya Ehmedê Xanî ya Navenda Lêkolînên Cîvaki ya Navnetewey

2 Gursel Aytaç, Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi, Say Yayınları, Stenbol 2013, r. 9.

3 Abdurrahman Adak, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Weşanên Nûbihar, 2013 r. 327.

4 Adak, j.n.b, r. 211.

5 Qanarê Kurdo, Tarîxa Edebiyata Kurdî, Weşanên Lîs –r. 93

6 Kurdo, j.n.b, r. 93.

perwerde dîtiye. Ji bilî Tirkî bi Azerî, Erebi û Farisî jî helbest nivîsîne. Di helbestên xwe de zimanekî zelal bi kar anîye. Ji heft ozanên mezin yek Fûzûlî ye. Mexlesa Fûzûlî bi kar anîye.

Berhemên wî evin:

Tirkî : Dîwan, Beng û Bede, Leyla ile Mecnûn, Rîsale-î Muammeyet, Kirk Hadîs, Su Kasîdesî, Hz. Alî Dîwani, Şikayetname, Kanûniye Kasîdeler, Hadîkatus Sueda, Mektuplar

Farisî :Dîwan, Enîsul Kalb, Heft Cam, Resale-e Muammeyat, Sehhat o Maraz,Rind û Zahid.

Erebî : Helbest

Di sala 1556an de çûye ser dilovaniya xwedê.

Ji aliyê nivîskaran ve hevbeşî, wekhevî û cihetiyên wan evin:

Hevbeşî :

- 1- Her du nivîskar jî di dîwela Usmaniyan de jiyane.
- 2- Her du nivîskaran jî di helbestên xwe de zimanekî zelal bi kar anîne.
- 3- Her du nivîskaran jî perwerdeyeke olî standine.

Wekhevî :

- 1- Her du nivîskaran jî mexles bi kar anîne.
- 2- Her du nivîskaran jî ji gelê xwe re xizmetên giranbiha kirine.
- 3- Her du nivîskar jî di nav gelê xwe de helbestvanê herî navdar in.

Cihetî :

- 1- Fûzûlî di sedsala 15-16an de jiyaye, lê Feqî di sedsala 16-17an de jiyaye
- 2- Fûzûlî ji bilî zimanê xwe bi zimanê din jî nivîsandiye, lê Feqî tenê bi Kurdî nivîsandiye. Ew jî raber dike ku Feqî helbestvanekî netewperwer bûye.
- 3- Fûzûlî ji malbata ke belengaz bûye, lê Feqî ji malbateke dewlend bûye.

Niha jî em ê ji her du berheman du beyta binivîsînin û helbesta bi gelemperî şirove bikin.

Ey av û av ey av û av

Ma tu bi 'îşq û muhbetê

Mewc û pêlan tavêy belav

Bê sekne û bê rahetê

Bê rahet û bê sekne yî

Yan 'aşîqê baxwê xwe yî?

Yan şubhetê qelbê me yî

Ji îşqa kê natebitê⁷

Feqî di helbesta xwe de avê dike kesayet bane avê dike û bi avê re şorê dike û derdê avê jê dipirse: Dibêje derdê te çi ye tu bê sekin û bê rawestan dimeşî, diherikî ji bo çi? Yan jî 'eşqek e te heye ku tu bi şopê ketiyî ku ewqas bi debdebe pêl didî, bi şev û roj rihetî ji te re tune. Feqî di beytên 5, 6 û 7an de ji avê re dibêje ku tu bi hal zîkrê dikî û bi şev rojan ranakevî û guşguşê betal nakî. Tu çira di vî halî de yî? "Tu j'emrê kê ve lez ketê". Feqî di beyta 8an de ji avê dipirse: "Tu j'emrê kê her tîy bi bez" Yan jî tu bi emrê hinekan diherikî ji min re bêje ku ez mesele zanibim û têbigihêjim. Feqî ji avê dipirse: "Yan 'aşîqê baxoy xweyî" ma tu 'aşîqê Xweda yê xwe yî. Feqî bi avê re şorê dike, jê dipirse û li rastiyê digere. Feqî di beyta 15an de dibêje: "Qet nanivî, nasekinê", "Reng şubhetê qelbê minê" ango avê dişibîne qelbê mirovan ku qelb bisekine mirov dimire ku av jî bisekine genî dibe. Av jî di beyta 26an de li Feqî vedigerîne û bersivên pirsan wî bi pirsan dide û dibêje: "Buhrîn l imin çend mah û sal", "Qet kes nekir ev reng sual" û beytên 27 û 28an de didomîne: Dibêje heta ez gihastim vê demê ji 'ebdên Xweda teve pêxembera pîrseke bi vî rengî ji min nekirin cihetîya te çiye ku tu vê pîrse ji min dikî. Feqî jî dibêje ku pêxemberan aqil hebû û bi sirra te zanibûn, qet hewceyî pirsan nebûn. Lê ez ne 'alimim ez feqe me û 'aqilê min nagihêje ku ez sirra te zanibim, hewce ye ku tu sirra xwe j imin re bibêjî. Feqî bi vî awayî û bi van pirsan bi şopa sirra avê dikeve, lê av sirra xwe jê re nabêje. Di beyta 39an de anîye ziman ku Xwedê Te'ala 'alem bi giştî tev ins û heywan û nebat ji anasiri erbaa ango ji av, ax, ba û agir xuliqandiye. Feqî di helbesta xwe de hebûna Xwedê Te'ala û xuliqandina 'alemê bi awayekî edebî vegotiye û anîye ziman ku her tiştên di 'alemê de di bin emre Xweda de tevdişî û biruh û bêruh be bi halê xwe ji Xwedê Te'ala re zîkrê dikin. Feqî fikren xwe yên di derbarê jiyan, felsefe û 'eşqa îlahî de bi hunereke edebî xemilandine û anîye ziman.

⁷ M. Xalid Sadîni, Feqiyê Teyran Jiyan, berhem û helbestên wî, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2009, r. 113.

Saçma ey göz eşkten gönlümdeki odlare su
Kim bu denli tutuşan odlare kılmaz çare su

Âb-gûndur günbed-i devvar rengi bilmezem
Ya muhit olmuş gözümde günbed-i devvare su

Fûzûlî bangî çavan dike û bi wan re şorê dike dibêje Hey çav: Hêşiran bi ser arê dile min de nebarîne, arê dilemin arê ‘eşqê ye û tu av nikare vî arî vemirîne. Xwe newestîne tu feyde nake. Fûzûlî hêşirên çavan şibandiye avê û di heman demê de çav kirine kesayet û bi wan re şor kiriye. Fûzûlî jî bo ‘eşqa pêxember ewqas zêde hêşirên çavan dibarîne ku di beyta 2yan de dibêje ku: Ev asîmanê ku dizîvire di rege avê de ye anjî ev hêşirên çavên min in ku asîman dorpeçkirine. Ji Fûzûlî wetnê ku hêşirên çavên wî rege asîman guherîne û hêşirên ku dibarîne bi awayekî mubalexe aniye ziman. Fûzûlî dibêje ku hêşirên wî bi armanca ku arê di dile wî de vemirînê diherikin, lê wan dike kesayet û ji wan re dibêje xwe newestînin hûn tu feydê li min nakin. Di beyta 5an de dibêje ku: Bira bexçevan xwe newestîne û bexçe av nede ku hezar bexçe jî werin avdan guleke bîna rûyê pêxember venabe. Ji ber vê bira hemî bexçeyan bidin ber pêlên avê. Dîsa di beyta 6an de gotiye ku: Bira bedewnivîs xwe newestîne ku ava reş jî bi ser çavan de were dîsa xetên xwe bişibîne mûyên rûyê te. Fûzûlî divan her du beytan de hunera şibandinê bi kar aniye û di yekê de gul şibandiye rûyê pêxember û di ya din de jî hunera xettatiya piçûk nivîsandinê şibandiye mûyên rûyê Wî.

Fûzûlî di beyta 11an de dibêje ku: “Ravza-i kûyîna her dem durmayub eyler gûzar”, “Âşık olmuş galiba ol serv-i hoş-reftare su” av jî wek min aşiqe pêxember bûye û bi awayekî tebi’î ber bi Wî ve diherike bexçeyê bihuştê. Fûzûlî divanê beyte de jî hunera şibandinê bi kar aniye û av şibandiye xwe. Fûzûlî di helbesta xwe de bi awayekî mubalexe ‘eşqa pêxember aniye ziman ku di dinyayê de ‘eşqa herî mezin e û tu aveke ku arê vî ‘eşqî vemirîne tine. Girîngiya pêxember a di jiyana xwe de bi awayekî mubalexe aniye ziman û ku çawa mirovek ecûre her ro avê vexwe ew mirov mecbûre ku her ro pêxember bi bîr bîne. Di beyta 32an de jî wanî dibêje: “Hâb-ı gafletden olan bar olanda rûz-ı haşr”, “Eşk-i hasretten tökende dîde-i bîdâra su” Fûzûlî bi vî awayî roja mehşerê tîne bîra me û

di beyta 33an de jî hêviya xwe tîne ziman ku roja mehşerê Wî bibîne ku dawîya hesreta wî were û arê di dile wî de vemire.



Ji aliyê mijarê ve berawirdkirin :

Hevbeşî :

- 1- Mijara her du helbesta jî eşqa îlahî ye.
- 2- Bingeha her du helbesta jî peyva “Av”ê ye.
- 3- Di her du helbesta de jî anasiri erbaa (av, agir, ax, ba) heye.

Wekhevî :

- 1- Feqî bi avê re şor kiriye (Ey av û av) lê Fûzûlî di beyta ewil de bane çava kiriye (Saçma ey göz) bi çava û hêşirên çava re şor kiriye.
- 2- Feqî av bi zimanê halî daye şor kirin , av kiriye kesayet, lê Fûzûlî av şibandiye hêşirên çava.

Cihêti :

- 1- Feqî li ser jiyan û felsefê nivîsiye, fikirên xwe yên li ser jiyanê bi kesayetkirina avê aniye ziman.
Fûzûlî eşqa pêxember bi awayekî mubalaxe aniye ziman.



- 2- Di Ey av û av ê de pesin tineye, lê di Su Qesîdesî yê de ji pêxember re pesin heye.

Ji aliye fikirê ve berawirdkirin.

Hevbeşî :

- 1- Her du nivîskara jî peyameke dînî dane.

Wekhevî :

- 1- Feqî emrê Xwedê derxistiyê pêş, gotiye ku av jî di bin emrê Xwedê de diherike, lê Fûzûlî roja meşerê derxistiyê pêş fikir roja meşerêye.

Cihêti :

- 1- Feqî li şopa rastiyeke digere, ka av ji bo çi û bi emre kê diherike, lê di Su Qesîdesî yê de rastî diyar e: ‘eşqa pêxember e.

Ji aliye Ruxsarî (Şiklî) ve berawirdkirin

Hevbeşî û Wekhevî

- 1- Her du helbest jî Qesîdene.
- 2- Her du bi wezna ‘erûzî hatine nivîsandin, lê Feqî hinekî serbest tevgeriyaye.
- 3- Di her du helbesta de jî hunera edebî heye.
- 4- Her du helbestvana jî fikrên xwe bi hunera edebî xemilandine û anîne ziman.

Cihêti :

- 1- Ey av û av çarîn e, Su Qesîdesî du beytî ne.
- 2- Ey av û av 51 çarîn in, Su Qesîdesî 32 heb du beytî ne
- 3- Di Ey av û av ê de peyvên hemwate wek sekin-rahet, îşq-muhabet hatine bikaranîn, lê di Su Qesîdesî yê de peyvên dijiwate wek su-ateş hatine bikaranîn.
- 4- Zimanê Ey av û av ê hîn zelal e, lê zimanê Su Qesîdesî yê li gor Ey av û av ê hinekî giran e.

Encam

Me di serî de di derbarê Zanista Wêjeya Berawirdkirî de hin agahî dan û dîre helbestên ‘Ey av û av’ û ‘Su Qesîdesî’ şirove kirin û ji hêla mijar, fikir û ruxsarî ve hêlên wan ên hevbeş, wekhev û cihê tesbît kirin. Bi rastî her du helbest jî di qada wêjeya kurdî û tirkî de du berhemên sereke ên edebiyata xwe ne. Feqî û Fûzûlî her du ya jî beytên xwe bi hunereke edebî xemilandine û ‘eşqa îlahî anîne ziman. Hêviya me ewe ku ên vê nivîsê bixwînin jê sûd werbigirin.

Çavkanî:

- 1- M. Xalid Sadînî, Feqiyê Teyran Jiyan, berhem û helbestên wî, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2009.
- 2- Abdurrahman Adak, Destpêka Edebiyata Kurdî ya Klasîk, Weşanên Nûbihar, Stenbol 2013.
- 3- Qanatê Kurdo, Tarîxa Edebiyata Kurdî, Weşanên Lîs, Stenbol 2010.
- 4- Gürsel Aytaç, Karşılaştırmalı Edebiyat Bilimi, Say Yayınları, Stenbol 2013.

Hecîkê Çûkan

Ramazan YAMAN

Jê re digotin Hecîkê Çûkan. Temenê wî ji heştêyî derbasbûyî bû. Di xaniyekî biçûk û jihevderketî de dijiya. Heft –heşt zarokên wî hebûn lê tu kes ji wan, lê xwedî dernediket. Xwedanxêran jê re xwarin dişandin. Rojê pêncşeman diya min şîva miriyan derdixist û dida min û digot bibe ji Hecîkê Çûkan re. Em gelek caran diçûne ba wî. Serpehatiyên xwe bi awayekî efsûnî ji me re digot. Hema bêje hemû serpehatiyên wî li ser çûkan bû. Ku dest bi vegotinê dikir te digo qey hew disekine. Şêwazeke vegotina wî wîlo xweş hebû ku, em jî beşdarî serpehatiyê wî dibûn. Carcaran ku me ew guhdar dikir em jî vê jiyane derbasî xewn û xeyalê dûv û direj dibun. Birastî, qey em ne lehengê çîrokên wî bûn...

Ku demsal dibû zivistan karê Hecîkê Çûkan dest pê dikir. Lewra qelereşkan koçî vî diyarî dikirin. Hecîkê Çûkan derdikete du'aya berfê(!) Ku berf dihat û rûyê erdê çîlsipî dikir. Çûkên reben birçî diman. Çûk li hêviya rizqê xwe, Hecîkê Çûkan jî li benda çûka bû. Ku berf zêde nedihat mad û mirûzê xwe tirş dikir û digot:

- Na lawo îsal bereket nîne. Ya rebbî! tu me bê berf nehêle. Rehmeta xwe li me bibarîne. Ku

hin digotin:

- Xalê Hecî tu ne li benda bereketê yî, tu li benda çûkan î.
- De here pîsê heram ma qey ez ji nêza mirî me. Derd û kulê min zad û zêviyên feqîran e.

Radyoke wî ya biçûk hebû. Li rewşa hewayê guhdarî dikir. Ku nûçeyên berfê dibihîst gelekî kêfa wî dihat. Ku berf dihat, berî berbangê radibû. Hin textik derdixist li ser wan, dafik çêdikir. Ku dafika xwe amade dikir, ew dixiste kîs û li pîştê xwe dikir.

Dibejin “Birçîtî, masiyên herî jîr jî ber bi torê ve tine”. Erê Xwedê tu jîndarî bi birçîtî imti-han neke. Lê zivistan e sar û seqem e. Mirovên aqil-mend ku birçî dimîne eqlê xwe winda dike. Vêca ev çûkên reben wê çi bikin. Ku li deverkê têhna tiştên xwarinê dikirin li wir dicivîn. Dibû wîtewîta wan...

Carna Hecîkê Çûkan bi goştê qelereşka, deşta cila tijî dikir. Dibir malê ew dibiraştin û yeko yeko ew dixwarin. Hin caran sê-çar heb didan me jî.

Rojekê dîsa berf dihat. Ez û pismamê xwe Ehmed jî dibistanê dihatine malê. Di rê de me Hecîkê Çûkan dît. Textikê bi dafik di destê wî de hêdî hêdî dimeşiya. Min silav dayê:

- Xalê Hecî qewet be. Tu çawan î baş î?
- Wey! Xwedê emrê we dirêjke zarokno. Hûn çawan in baş in?
- Em jî baş in Xalê Hecî. Xwedê ji te razî be. Em di berde derbas bûn û çûn. Ehmed bi hêdîka ji min re got.
- Fikreke min heye. Heger tu alîkariya min bikî. Ez ê ji te re jî bêjim.
- Bêje fikra te çi ye.
- Na heke tu soz bide ku tê alîkariya min bikî. Ez ê ji te re bibejim.
- Soz ez ê alîkariya te bikim.
- Meyzê em ê biçin dafika Hecîkê Çûkan jê bistînin.
- Na ez diziyê nakim!
- Ev ne dizî ye lo!
- Ma çi ye?
- Em ê paşê dîsa bidine wî. Yanî ku karê me xelas bû. Em ê dîsa dafika wî daynin ba mala wî.

- Temam.

Em çûn me çentê xwe danî malê. Me firavîn xwar û em derketin derve.

Danê êvarê bû. Ez û Ehmed li bal mala Hecîkê Çûkan bûn. Enterîka mala wî vekirî bû. Me di şibakê de meyîzand. Hecî, çûkên ku girtibûn li ser sobê diqelandin. Ehmed got:

- Vaye textik û dafika wî li vir in. Hadê hê ku me nedîtiye em rahêjne wan û birevin. Min rahişte textikan, wî jî rahişte dafikê û em bi lez û bez ji wir reviyar. Em hatin mala me. Me textik û dafik li hewşa me veşartin. Ehmed:
- Sibê şemî ye. Dibistan tune. Şeveqê zû rabe. Em ê dafika xwe daynin. Haydê êvara te bixêr.
- Temam em ê zû rabin û dafika xwe daynin.



Êvara te jî bixêr.

Ji kêfa min şîv jî nexwar. Çiqas bi kelecana bûm. Erê wê sibê tije çûkên me çêbin. Ez ê wan xime qefesê û wan xwedî bikim. Dêrê min ne xwarina goştê wan bû. Erê wey xwelî li sero! min ê weke çûkê tûfî, qelereşkan di qefesê de xwedî kiribane...

Dotîra rojê berî banga sibehê ez rabûm. Bi dizî ji malê derketim. Bi baz di derencan de hatime xwarê. Ehmed li devê deriyê hewşa me li heviya min

bû. Ehmed:

- De heydê lo em dereng man.
- Law derengbûna çî, hê mela bang nedaye.
- Hadê zû zû zêde neştexle.

Me çû dafik û textik anîn. Li ser textikan yeko yeko me hemû dafik danîn û em derketin derve. Nêzikî mala me ereşeke me hebû. Me li wîr top dileyîst. Em çûn wêderê, me teftikê bi dafik danîn erdê. Deqene dafik xuya nebin me berf avêt ser textik. Hinek ceh min ji malê anîbû. Me ew jî avetê ser. Wê qelereşk ceh bidîtana û bihatana ku ceh bixwin. Wê linge wan li dafikê bialiqiyana û me yê ew bigirtana. Ehmed got:

- Temam vaye dafikên me amade ne vêga em herne malê. Piştî ku me taştê xwar, em ê werin û çûkên xwe bigrin.

Em çûne malê. Min deriyê malê vekir. Ox hê kesek şiyar nebûye. Ku diya min û bavê min şiyar bûbûna nedihîştin ku ez wê şeveqa tarî derkevîm derve. Ketime nav nivînan lê qet xewa min nedihat. Di nav doşekê de geh diziviriyam wî alî geh diziviriyam wî alî. Ku deh deqîqe çavê min di hate girtin sûretê qelereşkan di ber çavê min de derbas dibûn. Nizanim ev hal çawa derbas bû. Lê hişê min bi dengê hate serê min :

- Kurê min rabe taştê bixwe.
- Temam yadê va ez rabûm.

Min ji kêfa qelereşka bilez çaya xwe vexwar û ez ji ser sifrê rabûm. Diya min

- Tê biçî ku de, te tişteke nex-

war?

- Ez ne birçî me yadê. Ez û Ehmed em ê derkevîne derve, bi gogê bilêzin.
- Temam, lê zû were malê.

Ez bi lez û bez daketim xwarê. Ehmed li devê derî li heviya min bû. Em ji hewşe derketin bi ber dafikên xwe de çûn. Ehmed:

- Gelo li gora te çend heb çûk ketine dafikên

me?

- Hema dido bin jî bes e. Yeke min, yeke te.
- Law ma tê çi bikî ji yekî. Ne hewce ye ku tu daynî ser agir.
- Ma tu dibê qey ez ê goştê wan bixwim. Ehmed bi dengê bilind kenîya:
- Wey lêlê ma tê wan bike dermale. Ez qeherîm:
- Erê ez ê wan bixim dermalê û vê zivistanê ji goştê wan qelî çebikim. Law ma tu dînî ez ê wan di qefesêde xwedî bikim.
- De heydê lo ma kî dîtiye ku qelereşk di qefesêde hatine xwedî kirin.
- Tê cara ewil bibinî ma ne baş e.

Em gihane ba dafikên xwe. Lê ne çûk ne jî dafik xuya nedikirin. Min got:

- Ehmed ma me dafikê xwe li vir danenîbûn?
- Belê çawa me danenîbûn vê derê.
- Lê kanê ne livir in. Hê gotina min jî devê min derneketibû. Yekî bi guhê min girt :
- Qewet be ji were dizên biçûk. Ev deng dişibiya dengê Hecîkê Çûkan. Erê ew bû. Dafik û textikê wî li piştê wî bûn. Di destê wî de jî sê-çar qelereşkê serjêkirî hebûn. Ehmed dest bi giriyê kir. Kelê giriyê kete qirika min. Me herdûkan serê xwe da ber xwe.
- Ma hûn ji Xwedê natirsin dizekno. Ma malê xelqê li ber avê hatiye. Ez ê giliyê we li bavê we bikim.

De vêca were ji vî halî xwe xelas ke. Welah dê bavê min têra min li min bixista. Hêsir weke baranê ji çavê min dibarîn. Jixwe Ehmed gava ku peyva 'bav' bihîst qêrînî pê ket. Em herdû girîn û girîn lê çi fêde. Hecîkê Çûkan çû ku giliyê me bike. Çiqas me jê re lava kir lê tu fêde nekir...

Piştî ku em têra xwe giriyan me piyê xwe da malê û bi gavên tirsonek em hêdî hêdî çûn. Ne jî devê Ehmed ne jî ji min qet peyvek dernediket. Erê em herdû jî sûcdar bûn. Ma me yê kî tawanbar biki-ra. Em hatine devê deriyê hewşa me. Ehmed ber bi mala xwe de çû. Min deriyê hewşê girt û derketime jor. Bi destê reelî min li derî xist. Diya min derî vekir û got:

- Wey xwefî li serê min o. Min zarokekî çawa xwedî kiriye. Ma min ji bo diziya xelqê te aniye

dinyayê. Bila bavê te were ez ê jêrê bejim. Wê têra te li te xe. Min serê xwe rakir ku tiştêkî bibejim. Şelqênîkîk ji rûyê min hat. Bi dengê bilind ez



girîm û ketime hundir.

- Yadê bi Xwedê ez hew tiştêkî wilo dikim. Ji bavê min re nebêje û min xwe çendkire destê wê.

Diya min destê xwe kişand lê min destê wê zevt kir û maç kir. Ma di dinyayê de dil weke dilê dayîka meriv heye...

Erê wê şevê ez ji lêdana bavê xwe xelas bûm. Lê xew nedikete çavên min. Birastî me çima ev bêyomî kiribû. Ji bo sê-çar qelereşkan. Qelereşkên ku ji nêza dihatin diketin dafikan û ji me re dibûn dîl...

Roja dî diya min ceza da min. Nehîst ku ez

derkevim derve. Ez di malê de girtî mabûm. Gelo Ehmed çi kiribû, çi hatibû serê wî.

Dotira rojê dibistan hebû. Ez zû rabûm min taştê xwar û derketime derve. Ehmed li devê deriyê me li hêviya min bû.

- Sibeha te bi xêr tu çawan î?
- Baş im Ehmed. Xwedê ji te razi be. Çi bû li mal çi qewîmî.
- Ma tu nizanî bê çi qewîmî. Diya min û bavê min li min xeydîn û li min dan. Lêbele em vê

meselê wilo nahelin.

- Em ê çi bikin kuro. Ez vê neqlê alî te nakim.
- Netirse lo em vê carê tiştê xerab nakin. Ma destê me şkestîne em ê ji xwe re dafikan çekin.

Em ne hewceyê dafikên Hecîkê Çûkan ne. Bila dafikên wî serî wî bixwin.

- Ma em dikarin çi bikin. Ez ji vî karî fam nakim. Ehmed:
- Ez ê çekim.

Piştî ku em ji dibistanê hatin. Em çûnê mala Ehmed. Me li hewşa wan çend textik peyde kir. Ehmed çû hundir benik anî û dafik çêkirin. Me dafikên xwe li ser textik danî û em çûn nêçîra qelereşka.(!) Me li nêzikî mala Hecîkê Çûkan dafikên xwe danîn. Ji bo ku çûk dafikan nebînîn me berf avetê ser dafika. Hin ceh jî me bi ser de reşand û em vegevan malê.

Roja dî berî ku em herne dibistanê me biryar da ku em herin li rewşa dafikên xwe bimeyzînin. Gelo me çend qelereşk girtibûn? Bi gavên lez û bez em hatin ber dafikên xwe. Wa cihê nêçîra me jî dûr ve xuya kir. Li ser cihê ku me dafik danîbun tiştne reş xuya dikirin. Ehmed:

- Tu dibînî vaye dafikên me ne vala ne. Em jî weke Hecîkê Çûkan jêhatî ne. Min got:
- Ehmed ev naşibe çûkan tu dibe qey tiştê dî ketiyê dafikên me. Em nezîkbûn ku em çi bibîn

di dafika me de kîsoyek heye. Rebenê kîso li dafikan 'aliqiye. Lingê wî ye paş ketibû dafikê. Me hewl da ku em kîsoyê nesteleh jî vê beyomiye xelas bikin. Ji xeynî dafika di piyê kîso da, hemû dafik qetiyabûn. Me kîso jî dafike derxist. Lingê wî xwî bibû. Em li

hêviya qelereşkan bûn lê nesibê me kîso derket.

Me rahişte textikê xwe û me berê xwe da malê. Tu nabê Hecîkê Çûkan li rewşa me ya xerab dimeyîzand. Hate peşiya me û bi dengê bilind kenîya. Em gelekî aciz bûn. Ehmed:

- Tu çima dikenî?
- Ma ez bigrîm kuro. Ma bi halê we nayê kenîn. Birastî hûn gelekî jêhatîne. Bû çil salî ez vî karî

dikim. Lê heta vêga jî bilî qelereşkan mi ti heyvan negirt.

- Hahahah kîso girtine kuro. Gelo hûnê goştê wî bixwin. Ma ne herame law. Ji were van çûkan. Ji torbêkê xwe dido qelereşk derxistin û dirêjî me kir. Ehmed:
- Bila çûkên te ji te re bin û va ye kîso li derêha ye herê wî jî bixwe çav birçiyoy. Vêca dora kenê

ya me bû. Em herdû bi dengê bilind kenîyan. Hecîkê Çûkan hêrs bû destê xwe rakir ku şîmaqekî li Ehmed bixê. Lê Ehmed xwe da alîkî. Em bazdan û hatin malê. Hecîkê Çûkan di pey me de gotine nebaş digotin. Lê ne xema me bû. Me tola xwe jê standibû.

Me wê rojê disa dafikên xwe amede kir û danî cihê berê. Lê gava ku nesib tunebe tiştê derna-keve holê. Vê neqlê dîkê cîranê me ketibû dafika me û hem jî ne lingê wî, serê xwe xistibû dafika belqîtyo. Xwediyê dîk, dafikên me hemû xerakir û textikên dafikan jî avetê soba xwe.

Piştî vê bûyera dawî êdî me hew dafik danîn. Me jî vî kare xirab tobe kir. Jixwe jî tirsê dê û bavê xwe me hew dikaribû behsa çûka bikira. Lê Hecîkê Çûkan heta wê sala dijwar hê vî karê xwe didomand. Ya rebbî ew çi zivistan bû. Em ji serma jî ber sobê ranedibûn. Diya min a reben heta ku sobe tije ezing dikirin dêm û bevîla wê reş û şîn dibû. Di wan rojên sar û serma de gelo Hecîkê Çûkan çi dikir. Rewşa wî çawa bû. Rojek xeberek hat guhê me. Digotin Hecîkê Çûkan jî serma qufiliye... Disa weke her rojeke bi berf dafikên xwe danîbûn û li hêviya qelereşkan bû. Lê piştî nêçîrê, ku di vegera malê de lingê wî dişemite û dikeve erdê, lingê wî dişkê. Li derdorê kesekî ku alîkariya wî bikê û bibe mala wî tunebûye. Lewra her kes li bal sobê xwe germ dike. Ma kî diwêribû ku wê serma û seqemê derkeve derve. Ji xeynî Hecîkê Çûkan...

Têkiliyên Nabeyna Zimanê Dayikê û Hizrê

Îzzettîn SEVEN MARÛNISÎ

Ku mijar Têkiliyên Nabeyna Zimanê Dayikê û Hizrê be divê di pêşiyê de piçêkê mirov li ser peyva ziman bisekine.

Ziman; pergala peywendiyê û ragihandinê ye.

Ziman; haletê têgihiştinê, fehimkirinê û naskirinê ye.

Ziman; pira navbera dûh û îro ye.

Ziman; sazkarê şaristaniyê ye.

Ziman; xîmê tifaqa miletekî ye.

Ziman; nasnameya miletî ye û kesayetiya mirovî ye.

Ziman di nav şaristaniyên gelan de kêliyê çikilandî ye.

Ziman; bo xwediyê xwe ji bo dîtina çand û hunerê pêşangeha herî mezin e.

Divê bersiva pirsekê di jî bê dayîn.

Ziman pêşiyê çawa çêbûye?

Zimanzanan bersivên cuda cuda dane. Hinek zimanzan dibêjin; “Însanan di nav jiyanê de diwar de xwestine alîkarî ji hevdu bixwazin. Hestên xwe bi hinek dangan bi lêv kirine. An jî ku hinek karên incax bir hev re pêkbînin dema ku ev karên wiha pêk dianîn deng derxistine. Ew deng bûne bingehe zimanan. Hinek zimanzanên dî nêrînen cihê gotine.” Ji bo bawermendan bersiva vê pîrsa jorê ewqas zehmet nîn e. Ji ber ku di Qur’ana Pîroz de dibore, Xweda Teala gotiye “Xweda navên hemî tiştan nişanê Adem daye.” Di vê derê de xuya dibe ku ziman ji van navaan çêbûye.

Vêca li vêrê pirsekê di tê aqlê mirovî. Gelo di serî de ziman yek bû çawa çêbûye ku îro ew qas zêde ziman hene? Tê zanîn ku zarokên Adem (a.s) bi çepirastî zewicîne û dûmêza wî zêde bûye. Hindî dûmêz zêde bûye ewqas jî belavî dinyayê bûne. Ji êkudu dûr ketine, hinek çûne serzemînên cuda cuda. Haja wan ji hevdu nemaye. Ew însanên belavî dinyayê bûne di bin bandora sirûştê wê derê de mane, dengên heywanên wê derê, sirûştê wê derê tesir li wan kiriyê. Bi vî awayî cuda cuda ziman çêbûne.

Pirsekê di jî ev e: Ziman bo çi hene? Ziman ji bo hindê heye da ku însan hevdu nas bikin. Hev fêm bikin. Da ku ew tiştên di mejiyê xwe de diborînin da bikaribin parve bikin. Vêca li vê derê têkiliyên nabeyna ziman û hizrê derdikeve holê.

Rewşenbîrek dibêje: “Ziman hêlîna hizrê û ramanan in.” Bi rastî jî mirov encax bi imkanên zimaneke ve dişê bihizirîne. Hizir girêdayî zimane ye. Ziman hebe dê hizir hebe. Tê zanîn ku hêlîn mala çivîkan e. Li wêrê malbatekê ava dibe, zêdehî çêdibe. Ji bo insanan jî cihê zayîna fikrê û ramanan ziman e. Bi maneyek mecazî hêlîn an go ziman ser pê sekinandina mirovî ye. Şibihandina hêlînê û serî an jî mejî jî balkêş e. Ka çawa mirov bi hêza mejî dikare xwe li ser piyan bisekinîne, wargêhê ziman jî mejî ye. Ziman bi wargêhê xwe mejî ve mirovî dixê asta însanan. Miletan jî digêhîne qonaxa neteweyî yê.

Hizirkirin yanî tefekkür cureyekî ta’et û îbadetê ye. Tê zanîn ku li gelek sûretên Qurana Pîroz dibore, Xweda Te’ala me gazî bal bi fikirandinê ve û bi kar anîna bal hiş ve kirye. Madem hizirî girêdayî zimane ye tê vê wateyê ku divê em di serî de zimane xwe rêkûpêk bikin. Dîsa ‘ilm dibêje mirov incax bi zimane dayikê dişê baş bihizirîne. Ji ber ku dengê yekemîn car dikeve hişê mirovî dengê dayikê

ye. Zimanên dî, dengên dî biyanî ne. Cihê biyanîyan an jî tiştên biyanî di hêlînê de nîn e. Hêlîn aramgeha mirovî ye. Mirov bi zimanê dayikê ve teşe digre. Mirov bi zimanê dayikê ve mezin dibe û zimanê dayikê wek lebatek mirovî ye. Wek uzvek mirovî ye. Manewî ye belê bêyî wê şexsiyet ava nabe, kesayetî çênabe. Ji bo gelekî jî bêyî zimanê dayikê ne mumkin e ku ew millet bişêt şaristaniyekê ava bike.

lorînên xwe bi zimanê xwe ve dijî. Heku ziman ji dest çû; ev e hizir çû, fikir çû, çand çû, huner çû. Derfetên avakirina şaristaniyê çû, pêşvebûna zanebûnê çû.

Ji ber sebebê van tiştên hatine rêzkerin li jorê, Xweda Teala rûmet daye hemî zimanan. Her zimanek ayeteke xwe hesibiandiye di sureya Rum ateya 22 de. Xwedî derketina zimanekî -wek zimanê Kurdî - xwedî



Gelo zimanê dayikê kîjan ziman e? Bersiva vê di pêşiyê de mirov xuya dizane belê ne wisa ye. Hinek zimanzan dibêjin zimanê dayikê ka zarok ji dayika xwe kîjan ziman hîn dibe ew ziman e. Hinek zimanzan jî dibêjin zimanê dayikê zimanê bav û bapîran e. Bi rastî jî ji bo me Kurdên ku ji gundan derketin; bav, bapîr, dapîr, pîr pir pêwîst e. Dilsojîyek e belê piraniya dayikan bi zimanê serdestan li gel zarokên xwe diaxivin. Zarok bi saya serê bapîr û dapîran pîçekî Kurdî hîn bûne. Vêca malxirabkirana mezin jî ev e ku hêlîna hizrê ji me hatiyê standin. Ka çawa dema ku helîna çivîkan xera dibe mala wê xirab dibe wê dema ku zimanê gelekî hate qedexe kirin an jî astengî li ber hate danîn ji bo wî miletî jî malxirabkirina herî mezin ew e. Ziman ruhê miletekî ye. Mirov xemên xwe, xeyalên xwe şîn û şahiyên xwe, hêrs û xemgîniyên xwe, dawet û dîlanên xwe, axîn û

derketine ayeteke Xweda ye. Xwedîderketina ziman çawa bi cih tê? Xwedîderketina ziman bi wî zimanî hizirîn e, bi wî zimanî xwendin e, bi wî zimanî nivîsîn e. Di têkoşîna siyasî de belkî Kurd xurt bin belê mixabin di têkoşîna aliyê ziman de gelek lawaz in. Xwendin û nivîsîna Kurdî hema hesabkê nîn e. Tiştê ku mirov naxwaze bawer bike ew e ku mirovên xwe Kurdewar dihesibînin jî piraniya wan jî xwendin û nivîsîna Kurdî dîr in. Jixwe hinek siyasatmedarên ji nava me derketin û Kurdî nizanin ne hewceyî gotinê ye. Vêca madem hêlîna hizrê ziman e, xwedî derketine vê helînê jî peywira me hemîyan e.

Meseleya Hz. Mûsa û Xidir (a.s)

Wergêr: Mûcahit YILDIRIM

Ji Ubeyyê kurê Qab (r.x.l) hatiye ragihandin
Pêxemberê Xwedê 'eleyhîselam gotiye:

- Hz. Mûsa (a.s) ji bo zarên Îsrail xutbe da. Ji Hz. Mûsa hate pirsîn ku, alimtirînê însanan kî ye

Mûsa (a.s) bersiv da:

- Ez im. Piştî vê bersivê, Xwedê (c.c) ji Mûsa (a.s) re wehy kir, got: "Du behrê ku digihin hev li

wê derê 'evdekî min heye. Ew ji te zanatir e."

- Ya Rebbî! Ez ê çawa wî bibînim? Xwedê Te'ala got:

- Masîyekî bigre û têxe zembîlê. Tu, masî li ku winda bikî, ew 'evdê min li wê derê ye. Mûsa (a.s) û alikarê wî Yuşa b. Nûn, bi rê ketin, çûn. Dawiyê hatin behrên ku digihin hev, li wê derê betilîn û li ser tehtekî razan. Ew çax masî ji zembîlê derket. Paşê xwe avêt behrê û çû. Piştî ku masî xwe avêt behrê Xwedê Teala herkîna avê da sekinandin. Mûsa (a.s) û alikarê wî rojek û şevêkî meşyan û çûn. Wexta ku bû sibe Mûsa (a.s) ji alikarê xwe re got:

- Xwarina me bîne. Ev rêwîti me betiland. Resûlullah 'eleyhîselam got:
- Hal ev e ku hetta cihê ku derbas kirin, Mûsa nebetilî bû. Alikarê Mûsa (a.s) got:
- Wexta ku li ser tehtê em razan min masî ji bîr kir. Min ê bigota lê belê şeytan da jibîrkirin.

Mûsa (a.s) ji wî re got:

- Cihê ku em lê digerin ew der e! Hema ji rêya xwe vegeyriyan hatin. Dawiyê hatin tehta ku li ser razan mêze kirin ku mirovekî li wê derê ye. Mûsa (a.s) silav da wî. Xidir (a.s) got:

- Li vir tu kes silav nade, tu kî yî? Mûsa (a.s) got:
- Ez Mûsa me. Xidir got:
- Mûsa yê ji kurê Îsrailiyan? Mûsa (a.s) got:
- Belê, 'ilmê ku ji te re hatiye hîn kirin ez ji bo wî hatim. Xidir got:
- Lê belê tu nikarî bi min re bisebrî ya Mûsa! Ez 'ilmek ji 'ilmê Xwedê zanim, tu nikari bi wî 'ilmî hîn bibî Xwedê ev 'ilm hinî min kîr. Tu jî, ji 'ilmê Xwedê 'ilmek zanî lê belê ez jî wê 'ilmê nizanîm. Ev 'ilim Xwedê hinî te kîr. Mûsa (a.s) got:
- Înşallah ez ê bisebir bim. Ji bo tu tiştî ez hemberî te dernakevim.
- Xidir (a.s) got:

- Hingê tu tabiyê min bibî, heta ku ji te re nebêjim, ji min nepirsî. Paşê li ber behrê meşyan.

Ew çax keştiyek hat. Ji keştivanan re gotin:

- Me jî bigirin.

Keştivanan Xidir nas kirin û ew girtin keştiyê. Wexta ku li siwarê keştiyê bûn

Xidir ji keştiyê textek şand. Mûsayî (a.s) got:

- Van keştivanan em girtin keştiyê tu çima xirab diki? Tu wisa bikî hemî yê bixeniqin. Te tişteki xirab û ecêb kir.

Xidir got:

- Min ji te re negot tu nikarî bi min re bisebrî!

Mûsa (a.s) cara yekemîn ji bîr kir. Paşê ji keştiyê peya bûn. Li ber behrê dimeşyan ku çend zarok dileyistin. Xidir di nava zarokan de zarokek dit û ew zarok kuşt.

Mûsayî (a.s) got:

- Ew zarok bê guneh bû. Te zarokek bê guneh kuşt. Bi rastî te tişteki xirab kir.

Xidir (a.s) wisa bersiv da:

- Min ji te re negot! Tu nikari bi min re bisebrî!

Mûsayî got:

- Êdî ji te tişteki napirsim.

Li rêya xwe meşyan. Hatin gundekî û ji gundiyan xwarin xwestin. Lê belê gundiyan ew mêvan nekirin. Li gund diwarek xirabe dîtin. Xidir (a.s) bi destê xwe nişan da û got: diwar wisa xwar bûye. Paşê diwar rast kir û çê kir. Mûsayî (a.s) got:

- Gundî em mêvan nekirin û xwarin nedan me. Te bigota ji bo vî karî pere dixwazim.

Xidir got:

- Êdî rêya min û te ji hev vediqete. Tiştê ku te sebir nekir hikmeta wan ji te re bibêjim. Keştiya ku em siwar bûn a feqîran bû. Min wer kir ku ji bo keştiya wan kevin xuya bike. Li ber avê şahek hebû, keştiyên nû bi zordestî digirtin. Min zarok kuşt lê belê, dê û bavê wî misilman bûn. Ew zarok wexta mezin bûya dê ji rêya rast derketa û dê û bavê xwe jî bixista rêya xirab. Min ew zarok kuşt ji bo ku dê û bavê xwe nexa rêya xirab. Mirina wî ji xirabiya wî baştir bû. Diwarê ku min çêkir ê du heb zarokên sêwî bû. Li bin diwarê de zêr hebûn. Wexta ku zarok mezin bibin zêr ê ku li binê diwarê de ye ê bibînin û ji rehma Xwedê re mezher bibin. Tiştên ku te sebir nekir hikmetên wan ev in. Min ev tişt bi xwe nekirin^{1*}

¹ Ev nivîs ji Tefsîra Sûreta Kehf, Ayet 60-82 û Muhammed Ali Es-Sabûnî, *Safîyetu'r Tefsîr*, b.III, rûpel-,445-446 hatiye wergerandin.

Serpêhatiya Seydayê Mele ‘Eleddîn

Tîpveguhezêr: Nureddin Ertekin

Gava mirov ji Amedê ber bi Mêrdînê ve diçe piştî qereqola Avgewr ku mirov ji kaş berjêr bû li rastê rêkek bi destê çepê ve diçe. Li ser wê rêyê bi rêzê Şifistan, Tizyan, Bernîş, Baqustan, ‘Ewina û Dengiza li pey hev tên. Ji van gundan re dibêjin ‘Surgucî’. Rê piştî gundê Dengiza digheje ser rêya Mêrdîn û Stewrê (Savur).

Di demekê de gelek Mela ji gundên Sûrguciya derketibûn. Ev Mela, melayên xurt û zêde ferzende û zan-yar tev wî qasî şair û hozan û helbestvan û nevşekar û rewşenbîr bûn. Ew dem; dema ku xwendina dîni hatibû qedexekirin bû. Em dikarin bêjin wan melayên ku di wê demê de xwendibûn hemî bi vî rengî bûn.

Yek ji wan Melayê Sûrgucî Mele ‘Eleddîn e. (Xweda Rehma xwe lê bike) Mele ‘Eleddîn, Mele Tajdin, Mele Hesên, Mele Îhsan, Mele ‘Eliyê Şeref, Mele Xidir ê Hêşerî, Mele Nezîr, Mele Mihemed, Mele Mecîdê Dirîkê, Mele Felemez, Mele Şêxmûsê Bernîştî di wê demê de xwendibûn. Pirê wan bi hev re xwendibûn. Li gundê nêzikê hev melatî dikirin, têkiliyên wan bi hev re zêde hebûn. Dihatin ba hev û bi hev re demên xweş derbas dikirin.

Mele Şêxmûsê Bernîştî serpêhatiya Mele ‘Eleddîn şopandiye û bi helbesê aniye ziman. Di serê helbestê de çend hevok gotiye, ji bo ku helbest xweş bê fêhm kirin çawa ku ji devê wî derketiye me li vir nivîsandiye.

‘Sala 1953’an de ez li gundê Dehşik Melê Remezanê bûm. Di çarê Remezanê de gundiyan xwe bi xwe şer kirin. Pismamê wan li Tolik hebûn. Ên li Tolik jî hatin hewara wan, di pênc deqqan de du kes hatin kuştin. Ez jî firarê ‘eskeriyê bûm. Sal û nîvek ‘eskariya min derbas bûbû. Min got; bi Xwedê ez li vir bimînim an ew ê min bikin şahid, an jî ew ê min bigrin. Hema min rahişt boxçika xwe ez hatim. Wê şevê li ba feqiyên Mele ‘Eliyê Şeref li Tehtok ez raketim. Û serê sibê bi tavê re min xwe avêt Cûmikê û ez çûm Goliya fillehan li ba daşya bûm Melê Remezanê. Piştî meha Remezanê bavê mazûvanê min go here wê derê, ba zarwa, Brahîm û Şêxo li wê derê ne ew ê zekat mekat bidin te. Min got;

‘Welleh çavê min bar nabe.’ Got; ‘Na here.’ Rabûm ez çûm Dehşik, hijde kod (çap) genim dane min. Min avêt ser qamyona Tahirê Qado, min bir ‘Erradê. Min firot. Em ketin rêza peran. Roja septê bû. Wê çaxê sept ne tehtîl bû. Hat nêzikê rêza min, gotin; ‘Welleh pere xelas bûn, hûn ê herin roja duşemê werin.’ Rabûm ez hatim mala Mele ‘Eleddîn. Tu nabê perê wî jî li ofîsê hebûn. Mêvanekî wî hatibû, ew jî Melê Rojîyê bû li Melho. Rabû jî me re kulavik û lihêfik û tejikik ji wan ên ‘Intabê, orta wan dirûtî ji me re anî. Min ji hevalê xwe re go: “Em ê lihêfê bavên bin xwe, ser kulav û em ê tejikê jî dawşînin û bavên ser xwe.” Se’eta me tejik dawşand – Mele ‘Eleddîn heta tu bêji cuwamêr e, û jina Mele ‘Eleddîn jî heta tu bibê çurûk, çuros û bexîl e. Û îja Mele ‘Eleddîn re kir pitepit. Çima te tejik da wan, ew ê tejikê biqetînin û virde û wirde. Û wî jî go zîrar nake. Welhasilî me rabû dawşand.- çima neçiriya! Yanî nefitiqî, çiriya. Û bû serê sibê. Em rabûn. Me çay çêdikir. Hevalê min hey çû. Mele ‘Eleddîn go welleh heqê vê tejika me qesîdek e. Çar ferdik jê çêkîrin. Ew jî di hundurê vê qesîdê de ne. Min go bira te çêkir, go welleh min çêkir. Îja rabû min jî hema rahişt qelema xwe û min a wiha got. Me qesîde çêkir heta berî ku em herin ‘Erradê. Hîn li odê xwend. Pê keniya, welhasil kêfa xwe anî. Û em çûn Mêrdînê. Welhasil hema çi hat serê wî, hey min çi bihîst îlawe kir, îlawe kir heta ku hat bû melê Dixî. Qesîda wî jî ev e. Yanî serpêhatiya serê wî.”

Leylun mînelleyalî rabûm ji nav cillikê
Kull û keder tev rabûn l’vê xwopana Cûmikê

Em êvarî raketin ji nivîna bêhêvî
Mela tejik j’mer anî me çirandî ta nêvî

Jina melê xeyidî mele di go ya hurme
Ev emrekî ji Xweda îşev hatiye ser me

Çi me’dê xwo tîrş dikî wek bizina hersim xwar
Daîm dikî piti pit wekî fata te’im sar

Exlaqê xwo xwoş bike wekî car û cîrana
Ne tu jina mele ye ey seroka nezana

Ma qey çavê te lê ye ez mêvana qewrînim
Bawer bike ji Xwûda ezê pir li te xînim

Jina melê digotî ma tu karî li min xe
Herdû rabûn şer kirin şerrê Beran û berx e

Em rabûn navçitîyê mele mabû heyyirî
Mela jinik qanî kir bihêviy û ber gerî

Go: heta ez herim Mardînê perîşan û dilbirîn
Ezê ji xwera bikirim du, sê çar qatê nivin

Yeqîn gundê Cûmîke bi dil dujmin bi dev dost
Nadin mêvanê melê lihêf û ya hinek post

Nabên mele wer bibe j' mêvanar qatek nivîn
Gelî bira ne heqqe bêjin eya hadirîn

Mela gelek xwestibû nedabûnê ya bira
Ew jî jiwan qehhirî deyn kir gelek ji pera

Min ji melê'r digotî ma qey tu ne mele ye
Ma ji vî gundî pêve ji tera gundik tune ye

Ma xatirê te ev e îşê te li vir çiyê
Ger tu bê ser fikra min here bibe bekçî ye

Rabe ser xwe'j Cûmîkê le'net bîne li iblîs
Her 'Erradê biv hemmal hilgir çewal û tellîs

Mela gelek qehhirî sond duxwarî bi yemîn
Ger Xwûda ruh nestîne sibê ez derim Mêrdîn

Mela sibê nimêj kir jina xwer got rab heydê
Ez jî rabûm teva wan em hatine 'Erradê

Em çûn derê ofîsê me stendin perê xwo
Pera'l hevdu teqşim kir pê birî bilête xwo

Suwar bû l'şimendûferê ta tasyona Mardînê
Em l'tasyonê peyabûn paşê ketin qamyonê

Em gîhane çarşiyê bi dil xweş û kêf gelek
Mela ji xwe ra kirîbû çar lihêf û pênc doşek

Min ji Melê dipirsî çîr çar lihêf pênc doşek
Go lihêfek me heye zêde li malê bê reyî û şek

Tevlî wê lihêfa malê bû pênc qatek ji nivîn e
Mela nemaye naqis illa ku jinkê bîne

Mele gelek serf kiri li Mardînê ya exî
Yeqîn nedîm ji mela bi mîslê wî pir sexî

Mele ji heşsend banqenot qurûş b'xwe ra nehiştî
Cêbik ji xwe ra kirê kir wî de'w xewstî ji Bernîştî

Mele ji kêfa livîna ketî delxa dunyê ye
Du sê bedlî wî ketin ji dawîya cêbê ye

Weqtê gîha berderî nerîn livin tunene
Hema l'cêbê suwar bûn pey talanê ketine

Derketin ji Cûmîkê bi son sur'et ajotin
Berî bighên Hêşerî du sê bedlê xwe dîtin

Kêfa wan hat ciyê xwo Xwûda kêfê bide wan
Lakin piştî çendakî ketin halê pir giran

Ger halê wan dipirsî ji tera bêjim 'eynî ye
Birê mele tev marê yek ji wê revandî ye

Melê reben heyirî nema zane çewabe
Ger li wêder bimîne ji wîre gelek xerabe

Ji tengasî neçarî mala xwe j'wê bar dikir
Berê xwe daye Dixê ber Mele 'Ezîz xerakir

Du sê salê wî l'Dixê halê wî bû pir bilind
Rizqê wî lê kom dibe wek çivîkê li dor kund

Bû xwedyê xwo hertiştî bi zekata Dixê ye
Şensê wî pir geriya bû mamûrê avê ye

Dema dibe havînî bi Eyo re dere her derê
Piştî 'ilmê xweyî pir bû maknîsê bîçerî

Paşê j'xwer radyo kerî xeber disten ji Misrê
Navê wî pir bela bû nav dewleta û xelqê

Hukmat bi wî hesiya casûs li wî gerandî
Ew jî ji ber tîrsa wan rîha xweşik qusandî

Eyo ji wan ra bû muxtar 'Eleddîn bû îmam e
Mela 'Ezîz mûezzin îşê gund bû temam e

Bernîştî bes bibêje 'Eleddîn.....
Qet bike van elfaza heqqê te l'wî tune ye

Derdê Tûtiyê

Mewlana Celaleddin Rûmî

Wergêr: Rıdvan Demir

Bazirganek hebûye, tûtiyeke wî hebûye. Mehkûmê qefesê bû û gelek jî rind bû. Rojek ji rojan bazirgan ji bo çûyîna Hindîstan'ê xwe amade dike. Ji kole û cariyên xwe yek bi yek dipirse:

- Ka bejin daxwazên we çine?
- Her kesî lib lib daxwazên xwe jê re gotin. Dor hate tûtiya wî, ew ê jî wiha got:
- Dema tu çûyî Hindîstan'ê ji wan tûtiyên wê derê re bibêje, filan tûtî girtiyê min e. Ez wî di

qefesê de xwedî dikim, ji we re slavê wî hebû û digot: "Ez ê li xerîbiyê di qefesê de ji hesreta we can bidim da ku hûn bikaribin li ser pelg û daran û zinaran azad biferin. Qe nebe bi sehereke sibê de hûn min rebenê Xwedê jî bi bîr bînin bila ez jî kêfxweş bibim. Zêdetir tiştêkî naxwazim" got.

Bazirgan karwanê xwe amade kir û kete rê. Bi rojan û bi şevan rê çû piştî xwe gihande

Hindîstan'ê. Li wê derê çend heb tûtiyên li ser zinaran kund vedabûn dît û hespê xwe da sekinandin ji wan re got:

- Ez li filan bajarî, ji bo bazirganiyê derketim hatim vira. Tûtiyeke min heye, slavê wê ji we

re heye. Piştî jî daxwazên wê ji wan re lib lib vegot. Bazirgan gotinên xwe ret kir nekir tûtiyek ji wan ricifî û ket erdê û mir. Bazirgan jiber dîtinên xwe gelek li berxwe ket û got: 'xwezila min ev daxwazî qe ji van re negota.' Gelek poşman bû. 'Min çi kir? Ez bûme sedema mirina vê tûtiyê. Bawer dikim ev digihêje tûtiya min.' Got. Ser re gelek wext derbas bû, dan û standina xwe xilas kir û zivirî welatê xwe. Siparîşa her kesî radestî wan kir. Lê tûtiyê jî li wan dinêrî. Dawiyê li ber xwe neda û wiha got:

- Kanê daxwaza min? Te xwişk û birayên min dît? Te ji wan re çi got? Ji min re bibêje bila ez jî

kêfxweş bibim.

Bazirgan:

- Tûtiya min e delal qusûrê nenêre. Ez ji te re nebêjim ê çêtir be. Lewra ez hê jî ji ber ew birina

agahiyên te yê bêqîmet re diqehirim, min çawa ew bêaqilî kir. Ji te re nebêjim çêtire.

Ji ber ku tûtiyê zêde heter kir, berxwe neda got:

- Ez çûme Hindîstan'ê, silavên te ji tûtiyên hevalên te re min got, yek di nav wan de nişkeve

ricifî û ket mir. Ji ber vê şahidbûna xwe ez gelek berxwe ketim û poşman bûm. Lewra nafiye ye derbas bû çû. Tûtiya bazirgan jî nişkeve di dewsa xwe de ricifî û di qefesê de ket mir. Bazirgan di ser de bû sedemê mirina tûtiya xwe jî. Ji ber vê yeke zehf qehirî, bigirînî dest bi gotinê kir.

- Hey tûtiya min a delal. Çi li te hat. Tu çima wisa dikî. Min çi anî serê xwe. Got û gilî kir û li

çokên xwe da. Piştî ew tûtiya mirî di qefesê de derxist û danî keviyê pencerê. Tûtiyê ev firsend dît, tavi lê fir da. Çû li ser dareke bilind danî.

Bazirgan tu wate neda wan bûyerên qewimî û matmayî ma.

- Hey tûtiya min a delal ka bêje ev çi hal e. Tu van fendan ji ku hîn bûyî?

Tûtiyê got:

- Ezbenî, ew tûtiya li Hindîstan'ê ricifî û mir, dema ku slava min hildabû xwe mirî avêtibû û ji min re peyama xilasbûnê bi destê te şand. Min jî gotina wê kir û ez xilas bûm.

Mewlana Celaleddin Rûmî - Mesnewî -1 / 1547

Ronahî

Fahri AYHAN

Di wê tarîfîya şevê de ji nişka ve ba û bahoz rabû. Di wê kêliyê de bira û xwişkên min bêhtir xwe xistin nav nivînan. Her ku neylona çadira me dihejîya, tirsê singê xwe li ser dilê min dikuta. Piştî demekê min hew diyax kir; bêhtir nêzikî dayika xwe bûm. Di wê tarîfîyê de ji bin çadira me yî bê ronahî de tiştek bala min kişand: Ji dûr ve ronahîya avahîyên bilind ber bi çavê min ketibû. Di wê kurtedemê de hemî wateyên ronahîyê di hişê min de civîyan. Min jî têdernexist ku ji çi sedemê ev fikir di hişê min de kom dibin? Ronahî jîyan bû, ronahî germahî bû, ronahî pêşeroj bû...

Nizanim em ketibûn jîyaneke çawa? Sa'et bûbûn roj, roj bûbûn meh. Her cara ku min fersend bi dest dixist min ji bavê xwe dipirsî: "Yabo emê kengî vegerin welêt?" Bavê min berê xwe bi alîyekî dinê ve dizivirand. Çavên wî dikete koncala xwe û kûr kûr diramîya. Qet bersiv nedida min. Her car bi hincetekê mijar diguherand. Her sal bi gelek kîlometreyên dûr me ji Êlihê dida rê. Wê salê jî qasî pênc malan em hatibûn bajarê Aydın'ê. Hemî malbat ji erdînagîyekê, hemî malbat ji qederekê, hemî malbat li dû hêvîyekê... Çiqas jîyana me yî her sal wiha dubare dibû û bi vî awayî teşe digirt jî; nexwe dîsa jî em fêrî van deran nedibûn. Her wiha navê xerîbîyê her xerîbî bû; navê hesretê jî her dem hesret...

Dayika min î stuxwar wekî çavê xwe li me niherî bû. Di nava xizaniyê de mezinkirina pênc kûr û sê qîzan ne ew qas hêsan bû. Lê belê dîsa jî hewl dida ku me bi serfirazî mezin bike. Di qaseya qemyonê de bi rojan em gîhaştibûn vê derê. Nexwe tu car wekî îsal nebibû. Demsaleke bibereket bû. Erdê ku em tê de dixebitîn seranser bacan û îsot bû. Karkerên welatên dûr bi şev û roj dixebitîn. Ji berbanga sibehê de heta destê êvarî kes ne disekinî. Xebateke bê rawestan. Ji ber ku bi temenê xwe hêj ez zarok bûm ez nedixebitîm. Karê min diyar bû: Di hembêza siruştê de di nav av û şenkahîyê de heta destê êvarî nedisekinîm. Çavên min li palêyên nav erd, li cîya û banîyan bû... Dema ku ro ezmanê xwe bi rengê soreve dixemiland û şûnde patronê me dihate nav erd. Her ku dihat şewqeyê serê xwe bi alîyekî ve dizivirand û heta tu bêje bes xwe dinepîxand û dinepîxand...

Ew rojên me yên dirêj, yên ku bi têkoşînê ve derdas dibûn û dişibîyan hev... Wekî ji hev bizên qet xilas nedibûn. Ji alîyekî ve çavê min li murûzê bavê min bû. Qet nedibîşirî. Demên ku hemî neyîniyên jîyanê li hev kom dibûn; dengê zaroktîya min bi gazîya min de dihat. Min xwe davêt dawa siruştê, di nav herî û avê vedigevizim... Her wiha zaroktî li cîh û mercên jîyanê nedipirsî. Herdem digel hestên xwe yî siruştî tevdiagerîyam.

Êdî em gîhaştibûn demsala payizê. Ti car em fêrî hewayê vî welatî nedibûn. Carinan ro wekî hemî gerdûnê bikelîne germ dibû; carinan seqemeke bê wext derdiket ku cîh tunebû em bikevinê. Di nav ew qas kar-

keran de yê ku bala min dikişand birayê min Silêman bû. Ev pêncî roj derbas bûbû ku dixebitî. Carekê tenê jî berteka xwe nişan nedabû. Bi temenê xwe hêj zarok bû lê belê karekî jî xwe mestir dikir. Nexwe êdî çavê wî jî ji vî karî şikestibû. Sibeha kur li ser taştê: "Yabo îro ez nema dişuxulim" got. Hilberînên demsalê yên nav erd wekî bi ser serê me de bibare pir bûbû. Divê karmend hê bêhtir bixebitîyana. "Çawa naşuxulim kurro! Ma hun neşuxulin ezê çi bikim law!"

"..."

"Sucê min e ne yê we ye. Na na hun dixwazin deriyê min bê girtin." Bavê min pir hêrs bûbû. Rahîşt kêsekekî û da du birayê min Silêman. Ew kêsekê nerm lê neketibû. Lê belê birînen kur li ser dilê me tevan peyda bûbû. Silêman bê çare dest bi karê xwe kir. Bavê min jî berê xwe guhert û ji wir qetîya. Piştî çend sa'etan hate nav erd. Bi destê Silêman girt û hate rûyê wî... Ew dûmen tenê gelek tişt vedigotin. Dayika min li serê mişarê, bi pêsmala xwe çavê xwe zûha kir û bê deng karê xwe berdewam kir.

Dema ku xweh û birayên me şîva xwe dixwarin û şûnde dibûn wekî beştan. Kesî nema dikaribû wan ji cîhê wan rake. Zingîniya kelmêşan, bêhna xwîdanê... Qet şêrîniya xewa wan xirab nedikir. Hemî karmend ji êvar de wiha serî datanîn. Wê rojê destê êvarî hêdî hêdî bayekî hênîk dest pê kiribû. Çi qas bayê bê wext aramîya me yî ser şivê xirab nedikir jî her ku diçû bêhtir bû. Tarî hemî hêza xwe dabû gerdûna me. Me jî rohnîdankên xwe yî seyar ji êvar de tefandibû. Çav çavî nedidît. Yên malbata me ketibûn xeweke kur û şêrîn. Ji xwe ceryanên me yî çadîran tune bû. Jîyan dûrî me bû... Ji dûr ve tenê ew ronahîya avahîyên bilind du-xuya. Piştî ku ba hêza xwe bêhtir kir û şûnde ji nişka ve vecinîqim. Tavilê min bangî dayika xwe kir. "Yadê Yadê!" Xew li wê jî giran bûbû. Ez hêdîka ber bi wê ve hatim. Min dixwest ku ez xwe aram hîs bikim. Qasî maweyeke kurt jî xew nedikete çavê min. Ba û bahoz... Di wê şeva tarî de çav çavî nedidît. Ji bilî xumînî û xişîniya naylonên çadîrên me tiştek di nêz de nedihate bihîstin. Dema ku teperepa neylona çadira me bêhtir bû herkesî ji xewa xwe hilpekand. Di wê kêliyê de tiştên cûda dihate bîra min. Carinan dayika min hêrs dibû bi min re dixeyidî: "Hey malik li te xirab bûyo... ma hinekî bisekine bîaqil be!" Di wê kurte demê de nuqutî dilê min ku malik xirabbûn tiştekî wiha ye. Bavê min bangî me dikir: "Zû zû derkevin. Zû derkevin!" Di wê kêliyê de me hinek alavên xwe yî taybet xiste destê xwe û em jê derketin. Du singê çadira me rabûbû... U çadira me wiha li erdê rûxiya. Bi heman awayî çadîrên cîranên me jî rûxiyabûn...

Şeva tarîbû... Tenê ronahîyên wan avahîyên dûr dihate dîtin. Ekîbên alîkarîyê yên şaredariya mezin bi gazîya me de hatibû. Wê şevê wiha derbas bûbû. Dotîra rojê me hemî alavên xwe xistin qemyonê û me berê xwe da rêya welatê xwe. Di turîkê me de hêvîya pêşerojek e bi rohnî...